



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ
Kovara Dumehane
Hejmar - 19
Adar-Avrêl 2008

Xwedî û Bêpirsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise Şîrin ÇAGER - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENÎZ

Mizanpaj û Berg
Azad ZAL

Wênayê Berga Pêşîn:
Jina Liqatvan (Selmet Guler)

Şewirmendê Hîqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Gûn Matbaacılık
Tîf: 0 212 580 63 81

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
DIYARBAKIR

Tîf:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:

Nava Welat, salek: 25 YTL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

■ *Nivîsên ku ji bo
weşanê ji kovarê re
tên şandin, li
xwediyên wan
nayên vegerandin.*

■ *Her nivîskar ji
nivîsa xwe
bêpirsiyar e.*

N A V E R O K

■ Ji Editor	2
■ Dosye: Di Çand û Wêjeya Kurdî de Newroz / Azad ZAL - Enise Şîrîn	3
■ Cejna Evîndaran û Newroza 2708 / İkrâm BALEKANÎ	4
■ Newrozî martî 1948 / Pîremerd	5
■ Di Mem û Zînê de Newroz / Ehmedê XANÎ	6
■ Newroz e li welatê min / OmerDilsoz	7
■ Bist û Yekê Adarê / Seydayê TÎRÊJ	7
■ Newroz û Piroziya Newrozê / Azad ZAL	8
■ Newroz e / Helbest: Cegerxwin - Muzik: Aramê DÎKRAN	8
■ Di nava Kurdên Ezîdî de Newroz / Tîmûrê XELÎL	9
■ Sinem û Cejna Newrozê / Jan DOST	11
■ Newroz / Cankurd	12
■ Di Hişmendiya Me Kurdan De Yekem Nişaneya Neteweyiyê / Semra OZBEY	12
■ Kurmê Şîrî Heta Pîrî / Aram Gernas	13
■ Newroz im / Eskerê BOYÎK	14
■ Agirê Newrozê / Xamevan	15
■ Newroz / Seyid Feysel Moctevî	16
■ Nêrgîza Welat / Arşek Baravî	16
■ Ji Salên 90'î Li Cizîrê Newroz / Bahaeddîn ROBAR	17
■ Gula Bihna Xwe Avdan / Ayten ÇAÇAN	18
■ Her Bihar / Mizgîn AYDIN	19
■ Newroz / Berken BEREH	20
■ Pêtal / Ronî WAR	21
■ Xwezî ez bikaribim êvara Newrozê li Qamişlo û roja wê jî li Amedê pîroz bikim / Rizoyê Xerzî	23
■ Sembola Raperîn û Serfiraziyê Newroz / Adar JIYAN	24
■ Dilberê Îro Seher Avête Cergê Min Du Dox / Melayê Cizîrî	27
■ Awaza Zozanên Elegezê Egîtê Cîmo / Hevpeyvîn: Serwet DENÎZ	28
■ Rexne / Aram Gernas	35
■ Wêje: II, Bizavên Wêjeyê / Adar Jîyan	38
■ Riya Dûr / Selahedîn ÇAM	42
■ Strana Vegerê / Ehmed OSMAN	44
■ Liqatvan / Selmet GULER	45
■ Firotin / Amed Çeko Jîyan	48
■ 8'ê Adarê / Dilan AYDIN	49
■ Çavreş; li reşçavên xwe min bisitirîne / Omer DILSOZ	51
■ Balîf, Xewn û Xeyal / Cihan Roj	54
■ Jana Şairekî Amedî / Receb Dildar	56
■ Me ji bîr nekir / Murathan Mungan	57
■ Biyan im / Welat Dilken	59
■ Lêvên Tîmayî / Şêrko	60
■ Ma ne bes e! / Azad RONAKBAR	61
■ Çi bû ji me can! / Bakî Boga	62
■ Ala Serhildan / Sîpan Xîzan	63
■ Evîna Xewna Min / Evîndar Stêrk	64
■ Lêgerîna Bê Bersiv / Aydın Orak	65
■ Lêê Yarê! / Mêrxas Ronî	66
■ Tu Çi Dibêji? / Nora Ez	67
■ Hejarê Rewan / Şivan Ar	68
■ Bextreşî / Abdullah Oral	69
■ Li wê kuçeyê / Reyhan Sarhan	70
■ Bendewar im / Nesrîn Navdar	71
■ Çiroka Keçel û Apê / Berhevkar: Hogir Berbir	72
■ Methelokên Gelêrî / Berhevkar: Koçer	74
■ Jina Bî nav û Deng / Berhevkar: Behlûl Zelal	75
■ Dengbêjek û Stranek Şêx Huseyn / Amadekar: Hilmi Akyol	78
■ Pirtûkxane	80

Ji Edîtor...

Bi kêfa biharê
Bi Coşa Cejna Vejînê
Bi germahiya agirê Newrozê em dîsa dibêjin merheba!

Xwendevanên hêja;

Me xwest ku em bi vê hejmarê rengîniya biharê û coşa Newrozê bi nivîsên nivîskarên kurd bigihînin ber destê we û bi wateya roja nû di kovara xwe de jî nûbûneke biharî çêbikin. Pêşiyê hejmara rûpelan zêde bikin û rengê pênûsa nivîskarên nû li ser rûpelan pêşkêşî we xwendevanên hêja bikin.

Di vê hejmarê de gelek nivîs ji xwendevanên me hatin. Kovar dibe hêza teşwîqkirina nivîsînê, ev yek ji bo me kêfxweşiyek e. Ev, hêzê dide me ku em kovara W(e) hîn bi coştir û xurttir pêşkêşî we bikin.

Xwendevanên hêja;

Em bi vê kêfxweşiyê dixwazin cejna jiyana nû Newrozê li we pîroz bikin û bibêjin roja 8'ê Adarê li tevahiya jinên kedkar û têkoşerên azadiyê pîroz be.

Bêguman em 16'ê Adarê jî jibîr nakin... Wê roja reş, roja ku ewrên reş û tarî bi ser jin û mîr, zarok û pîr û kalên Helepçeyê de mirin barandin... Wê rojê dilê gelê kurd tevî êşiya, xwîn rîjiya ji kezeba me tevan... Îro hêviya me ew e ku ew rojên Helepçeyî careke din li me venegerin... û 16'ê Adarê jî roja reş derkeve bibe roja mizgîniya azadî û serxwebûnê...

Xwendevanên delal,

Me hewl da ku em bi vê hejmarê hindik be jî pêdiviya her xwendevanê/î bibersivînin. Me di vê hejmarê de rûpelên kovarê wekî gul û kulîlkên biharê ji berhemên wêje û hunerê dagirt û xemiland. Me di serî de bi dosyeya li ser mijara; “Di Çand û Wêjeya Kurdî de Newroz” ê rûpelên kovarê dagirt. Me bi vê mijarê xwest ku hindiktirîn be jî lîteratora wêjeyî, çandî û hunerî ya Newrozê em çêbikin. Nivîskar û helbestvanên hêja yên wek Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Pîremêrd, Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Eskerê Boyîk, Jan Dost, Seyîd Feysel Moctevî, Ronî War, Rizoyê Xerzî û hyd. bi helbest û pexşanên xwe cih girtin.

Ji bilî dosyeyê hevpeyvîna bi Mîrê Bilûrê Egîtê Cimo re ji aliyê Serwet Denîz ve hate kirin. Aram Gernas bi nivîsa xwe ya li ser çanda rexne û rexnegiriyê balê dikişîne ser rêbaza rexnegiriyê. Adar Jiyan jî bi dumahiya rêzenivîsa li ser wêjeyê Bizavên Wêjeyê rave kiriye. Cîhan Roj bi helbesta xwe ya hêja, Sîpan Xizan bi helbesta şeweyê klasîk “Ala Serhildan” û nivîskarên me yên din; Selaheddîn Çam, Ehmed Osman, Selmet Guler, Amed Çeko Jiyan, Dîlan Aydin, Omer Dilsoz, Recep Dildar, Welat Dilken, Şêrko, Azad Ronakbar, Bakî Boga, Evîndar Stêrk, Aydın Orak, Mêrxas Ronî, Nora Ez, Şivan Ar, Abdullah Oral, Reyhan Sarhan, Nesrîn Navdar, Hogir Berbir, Koçer, Behlûl Zelal û Hilmî Akyol bi helbest, pexşan û berhevkirinên xwe rûpelên kovarê xemilandine.

Di vê hejmarê de hin nivîskarên me bi du berhemên xwe cih girtine. Ji ber ku dosye û nivîsên derveyê dosyeyê ji hev cuda ne me guncaw dît ku em wan biweşînin.

Heta hejmara 20'an her bimînin di xweşiya wêjeya kurdî de...



Dosye: Di Çand û Wêjeya Kurdî de

NEWROZ

Amadekar: *Azad ZAL - Enîse ŞÎRÎN*

Cejna Evîndaran û Newroza 2708 / *Îkram BALEKANÎ*

Newrozî Martî 1948 / *Pîremerd*

Di Mem û Zînê de Newroz / *Ehmedê XANÎ*

Newroz e li Welatê Min / *OmerDilsoz*

Bîst û Yekê Adarê / *Seydayê TÎRÊJ*

Newroz û Pîroziya Newrozê / *Azad ZAL*

Newroz e / *Helbest: Cegerxwîn - Muzîk: Aramê DÎKRAN*

Di nava Kurdên Ezîdî de Newroz / *Tîmûrê XELÎL*

Sînem û Cejna Newrozê / *Jan DOST*

Di Hişmendiya Me Kurdan De Yekem Nişaneyê Neteweyîyê / *Semra OZBEY*

Newroz / *Cankurd*

Kurmê Şîrî Heta Pîrî / *Aram Gernas*

Newroz im / *Eskerê BOYÎK*

Agirê Newrozê / *Xamevan*

Newroz / *Seyid Feysel Moctevî*

Nêrgîza Welat / *Arşek Baravî*

Ji Salên 90'î Li Cizîrê Newroz / *Bahaeddîn ROBAR*

Gula Bihna Xwe Avdan / *Ayten ÇAÇAN*

Her Bihar / *Mizgîn AYDIN*

Newroz / *Berken BEREH*

Pêtal / *Ronî WAR*

Xwezî ez bikaribim êvara Newrozê li Qamişlo û roja wê jî li Amedê pîroz bikim / *Rizoyê Xerzî*

Sembola Raperîn û Serfiraziya Newroz / *Adar JIYAN*

Cejna Evîndaran û Newroza 2708

Roja nû, nûroj ango Newroz. Heta niha gelek gotar li ser Newrozê hatine nivîsîn, lêkolîn hatine çêkirin û gelek stran hatine çêkirin. Dîsa gelek helbest hatine honandin. Newroz li Rojhilata Navîn û bi taybetî di nava gel û neteweyên arî de tê pîrozkirin.

Îkram BALEKANÎ

Roja nû, nûroj ango Newroz. Bêguman heta niha gelek gotar li ser Newrozê hatine nivîsîn, lêkolîn hatine çêkirin û gelek stran hatine çêkirin. Dîsa gelek helbest hatine honandin. Newroz li Rojhilata Navîn û bi taybetî di nava gel û neteweyên arî de tê pîrozkirin. Lê li ba her gel û neteweyekê li gorî şert û mercên civakê xwedî wateyekê ye. Yanî li gorî şert û mercên jiyana civakî û li gorî qonaxa netewebûnê naveroka wê û wateya wê tê guherîn.

Bo nimûne li gorî îraniyan cejna sersalê û destpêka biharê ye. Li gorî hindiyan, ozbekiyan cejna xwezayê ye. Lê li gorî kurdan cejna serhildan û cejna berxwewanê ye. Ev yek di dîrokê de jî wisa bûye. Li gorî efsaneya Newrozê, gava ku Kawayê Hesinkar Dehaq (Zehak) dikuje, Ferîdûn bi ciwanên serhildêr re meşaleyên agir pê dixin û jî çiya vedigerin bajêr. Tê gotin ku wê çaxê rengên kesk, sor û zer li gurz û mêkûtê Kawa dipêçin û wekî sembol û nîşaneya serkeftinê diyar

dikin. Ew reng di heman demê de rengê xwezayê ne.

Êdî piştî serkeftinê Newroz wekî roja şahiyê, wekî destpêka biharê û cejna xwezayê hatiye pîrozkirin. Heta mirov dikare vê yekê di destana Mem û Zînê de jî bibîne. Li gorî hin versiyonên destanê tê gotin ku Mem û Zînê roja Newrozê di şahiyê de hev dîtine û bûne evîndar. Êdî piştî destana Mem û Zînê jî di nava kurdan de wekî roja evîndaran jî hatiye pîrozkirin.

Lê wekî tê zanîn di qonaxên cuda de wateya cejnan jî tê guherîn. Niha gelê kurd jî ber hesasiyeta pêvajoyê qonaxa heyî, careke din Newroz vegerande Newroza berxwewanê. Her çalakî û berxwedanekê jî lehengek heye. Lehengê Newroza serdemê jî Kawayê Hemdem Mezlûm Dogan e. Êdî kurdistanî niha Newrozê wekî serhildanê pîroz dikin.

Li çar beşên Kurdistanê 3 Newrozên cuda

Li Başûrê Kurdistanê Newroz li gorî serdemê û li gorî ku pêwîst e nayê pîrozkirin. Keç û xort û bi giştî gelê Başûrê Kurdistanê roja Newrozê wekî seyran û geştê pîroz dikin. Bi komên biçûk li derveyî bajar û li deşt û zozanan bi awayekî cuda tê pîrozkirin. Yanî mirov dikare bêje wekî roja evîndaran tê pîrozkirin.

Li Bakur û Rojavayê Kurdistanê li gorî wateya xwe ya hemdemî û li gorî şert û mercên jiyana siyasî ya îro tê pîrozkirin. Li dijî zilm, zor û li dijî înkare wekî roja diyarkirina nasmaneya kurdî derdikeve holê.

Li Rojhilatê Kurdistanê jî Newroz tê



Li Mehabadê Newroz (Şêrko Cîhanî)

Li Kurdistanê Newroz (Selmet Güler)



pîrozkirin. Lê ji ber ku dewleta dagirker a Îranê jî bi awayekî fermî Newrozê pîroz dike, loma rengê wê li Rojhilat hinekî hatiye guherîn.


Bi zimanê farisî ji Newrozê re dibêjin 'Nûroz'. Yanî roja nû. Îranî roja çarşema dawîya salê wekî 'çarşema sor' an jî 'çarşemê sûrî' bi nav dikin. Ji roja çarşema dawîya salê heta 13 rojan piştî Newrozê, pîrozbahî didomin. Hêjayî gotinê ye ku sersal jî wekî Newroz tê hesibandin û çarşema dawî jî li gorî wê tê hesabkirin. Yanî çarşema dawî berî roja 21'ê adarê dibe 'çarşema sor' an 'çarşemê sûrî' ya îraniyan.

Hin caran pîrozbahî digihîjin 18 rojan. Bi giştî ji çarşema dawîya salê heta 13 rojan piştî Newrozê wekî betlane tê îlankirin û dibistan tetîl dibin. (Ji bo xwendekaran tetîla salane ye.) Çalakiyên hunerî tîn lidarxistin. Pîrozbahî tîne organîzekirin. Roja 13'emîn jî wekî roja seyranê hatiye diyarkirin û wê rojê her kes jî malê derdikeve û diçin seyranê. Ku jê re dibêjin Sêzde Bider.

Lê piştî tevgera azadîxwaz a Kurdistanê û bi taybetî piştî ku Newroz li Bakur bi awayekî girseyî û li gorî wateya wê ya hemdemî hate pîrozkirin, bandora xwe li Rojhilat jî nişan da.

Her çend ku rejîma teokrat a Îranê rê nade ku kurd li gorî wateya serdemê Newrozê pîroz bikin jî, li Rojhilatê Kurdistanê kêm be jî Newroz di çarçoveya Bakur de tê pîrozkirin. Ligel hemû astengiyan gel li hev kom dibe û bi awayekî girseyî Newrozê bi pêxistina agir pîroz dike.

Hêjayî gotinê ye ku li Rojhilatê Kurdistanê Newroz wekî serê salê jî tê pîrozkirin. Yanî wê îsal li Rojhilat li gorî salnameya kurdî, Newroza 2708'an bê pîrozkirin. Em jî bi helbesteke Pîremêrd newroza 2708'an li hemû kurdistanîyan pîroz dikin û bi hêviya ku Newroza 2708'an bibe Newroza azadiyê û dîsa bibe roja evîndaran.



Pîremêrd (Tewfîq Mahmûd / 1867-1950)

NEWROZÎ MARTÎ 1948

Em rojî salî taze ye Newroz e hatewe
Cêjnêkî konî kurd e be xoşî behatewe

Çend sal gulî hîway ême pê pest bû ta ku par
Her xwênî lawekan bû gulî alî newbehar

Ew reng e sore bû ke le asoy bilindî kurd
Mujdey beyanî bo gelî dûr û nêzik ebird

Newroz bû agirêkî wehay xiste cergewe
Lawan be eşîq eçûn berew pîrî mergewe

Wa roj helat le bendenî berzî wilatewe
Xwênî şehîd rengî şefeş şewq edatewe

Ta êsta rûy nedawe le tarîxî mileta
Qelxanî gule singî kiçan bê le helmata

Pêy nawê bo, şehîdî weten şîwen û girîn
Namirîn ewaney wa le dilî millet da her ejîn

PÎREMÊRD

Di Mem û Zînê de Newroz^(*)

*(Destana beyana Newrûza Sultani
Tesmîye Mewsîmî Surur û Şadûmanî
bi mersûmî qedîmî Kurdistanî ku wan
digote Sersal 'ed dikirin bi 'îdi wisal)*

Xelaqê cihan ji feyzê fitret
Hey'atê felek bi wechê qudret

Bê qalib û bê muhît û miqyas
Bê alet û bê muşîr û miqras

Ev çende mue'zzem û mudewwer
Ev renga musenne' û mukrrer

Înane bi me'reza wucûdê
Kêşane bi menzera şuhûdê

Hikmet ew e ev hemî li kar in
Hindek di peya û hin siwar in

Hindek di betî- û hin serî'in
Hindek di mu'în û hin menî'in

Hin mudbir in û hinek mudebbir
Hin muqbil in û hinek muqeddir

Hin katib in û hinek di ustad
Hin mutrib in û hinek di cellad

Hin rozîperset û hin şebefrûz
Hin xusserevîn û hin xem endûz

Hindek di misalê Zîn zerî ne
Hin şubhê Memê di muşterî ne

Bilcumle museyqel û munîr in
Hin padişeh in hinek wezîr in

Hindek ji teherruka tebî'î
Ew tene bi nuqtaya rebî'î

Tecdîdi dikin ji bo me salê
Gava we ku tene i'tidalê

Danayê mue'mmirê kuhinsal
Evrengehe go ji bo mi ehwal

Go: adetê pêşiyê zemanan
Ev bû li hemî cih û mekanan

Weqtê we ku şehsiwarê xawer
Tehwîli dikir di mahê Azer

Yanî ku di hate burcê sersal
Qet kes nedima di mesken û mal

Bilcumle diçûn der ji malan
Hetta digihişte pîr û kalan

Roja ku dibûye îdê Newrûz
Tezîmê ji bo demal dil-efrûz

Sehra û çimen dikirne mesken
Beyda û dimen dikirne gulşen

Xasma ezeb û keçê di bakir
Elqisse cewahirê di nadir

Têkda di muzeyyen û mulebbes
Vêkra li teferrucê murexxes

Lêkin ne bi tuhmet û bi minnet
Belkî bi terîqê şer' û sunnet

Lewra ku ewan xerez ji geştê
Meqsûdê ji çûyîna bi deştê

Ew bû ku çi talib û çi metlûb
Yanî du teref muhib û mehbûb

Ev her du celeb ku hev bibînin
Kufwê di xwe ew ji bo xwe bînin

* * *

*(Bi Derketina Şehriyane bi deştê
Ji bo sersala seyran û geştê)*


Dewra felekê ji bextê feyrûz
Dîsan ku numa ji nû ve Newrûz

Mebna li wî adetê mubarek
Şehrî û spahiyan bi carek

Bajar û kelat û xanî berdan
Teşbihê bi nijdiyan û cerdan

Sef sef dimeşîne koh û deştan
Ref ref dixuşîne seyr û geştan
Esnafê umem sixar û kubbar
Qet'en qe nema di şehri deyyar

Hindek bi peyayî çûne baxan
Hindek bi siwarî çûne raxan
Hindek bi tebayî û bi kesret
Hindek bi hevalî hin bi wehdet



Ehmedê Xanî (1651-1707)

Rabûne ve xanim û xewatîn
Wan jî tijî gul kitin besatîn

Hûran kire meskenê xwe cennet
Bêperde û bêmelal û minnet

Dûşîze û duxter û rewalan
Pakîze i'zar û zulf û xalan

Etrab û kewi'bê di e'zra
Murdan û murahiqê di zîba

Eşabê qumaşê lutfê ruxsa
Erbabê meta'ê husnê dîdar

Wan l-êk dikirin meta'ê yek e'rz
Texmîn dikirin (bittûlî wel e'rz)

Sewdagerê i'sqê bûn di bazar
Hem bai'ê husn û hem xerîdar

Sersalî û bakir û rewalan
Sedsal û ciwan û pîr û kalan

Sersalî bi resm û rahê me'hûd
Gêranî diçû meqamê mehmûd

Ehmedê XANî

^(*) Ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî (Ya Erebi, rûpel: 33-36/Zeynelabidin Amedî/Pêşgotina Hemze, 3 Gulan 335), Ya Latîni, rûpel 100-109/M. Emin Bozarslan/Istanbul, 1973) Nivîskarê me yê heja Jan DOST ev helbest ji me re şand. Me da ber her du çavkaniyên ku me li jorê navê wan daye.

NEWROZ E LI WELATÊ MIN

Omer DILSOZ

Bihar e! Gul û kulîlk dîbişkivin; bûko û binevş li beyaran silavê didin biharê. Dar û ber pişkên xwe vedikin, av li dilê axê dihêwîre û jiyanê di malzaroka wê de vedijîne. Canemêrg û berfîn bi nêrgîzan re mil didin hev û bi hev re şahîya bişkîfîna biharê pîroz dikin... Erê, îro Newroz e li welatê min...

Newroz e li welatê min: Newroza welatê min naşibe çu Newrozan, Newroza welatê min bi rastî jî nûroj e, ronîroj e, hêvîroj e, xweşîroj e; şahî ye, şer e, berxwedan e, serhildan e, lehengî ye, xweşmêrî ye, mirin e, mirina mirinê ye; kuştin e, kuştina tîrs û zilma bi sedan salan e. Newroza welatê min, Egîd e, Rehşan e, Zekiye Alkan e. Newroza welatê min; Mûş e, Agirî ye, Mêrdîn e, Wan e, Culemêrg e, Efrîn e, Qamişlo ye, Helepçe ye, Hewlêr e, Dihok e, Kerkûk e, Seqîz e, Mehabad e, Kirmanşan e, Amed e; Kurdistan e!...

Newroz e îro li welatê min; agirî vêxin, şemalkan geş bikin, bila genc û lawên me şal û şapikên kurdanî li bejn û bala xwe bipêçin, keçên spehî xemla bûkaniyê bikin; fistan û xeftanên kesk û sor û zer li bejn û bala xwe ya narîn girê bidin, çavên xwe yên xezalî kil bidin û dakevin meydanên welatê min, agirî vêxin, gulan bidin hev, destên hev bigirin û dilanê bigerînin. Newrozê pîroz bikin!

Newroz e li welatê min, dakevin meydanan, herine pêş mil bi mil, herine pêş dest bi dest, herine pêş ref bi ref, herine pêş dil bi dil, herine pêş, govendê bişidînin, stranan bibêjin, erdê bihejînin, bilîlînin; bila dengê we bigihîje heft qatên asîmanan, bila dengê we biçe heft qatên bin erdê; bila dinya bibihîze; ker bibihîzin, kor bibînin, lal biaxivin; bila nûroja we, spîroja we, şahîroja we, azadîroja we, raperîroja we pîroz be li erd û asîmanan!...

Newroz e li welatê min, dilanê xweş bikin, îro çu karî nekin, dev ji jiyanê berdin, herin seyrangehan, dakevin meydanên Newrozê, mil bi mil, dil bi dil bigihîjin hev, alên xwe rakin, govendê bişidînin, gulan bêhn bikin, hev bihebînin, îro Newroz e, bêdengiyê biçîrînin, erd û asîmanan bi kesk û sor û zer bixemilînin.

Newroz e li welatê min, zarok têne der ji nav pêtên agirî, zarok têne der ji nav dilê rojê, zarokên rûbihar, zarokên kenhêvî, zarokên çavgeş, dilpak di destên wan de alên mezin ên kesk û sor û zer têne der ji çiyayên welatê min û dadîkevin meydanan. Agirî vêxin, destan bidin hev, îro Newroz e!...

Newroz e li welatê min îro; destpêka biharê ye, xweza dîbişkive, xwerist vedije, serma û seqema zivîstana giran cihê xwe ji bêhna sosin û beybûnan re dihêle, gul û kulîlk pişkên xwe vedikin; kurdino! Her derê bi kulîlkan bixemilînin, bi destên hev bigirin û govendê bişidînin; stranan bibêjin, stranan Newrozê...

Newroz e li welatê min, bi hêviya ku axa vî welatî di vê Newrozê de bi gul û kulîlkan xweşbîniyê bixemile, li şûna ku mirov bi çek û agir bi hev re têkiliyê çêbikin, berevajî, mirov bi ziman û axaftinê mesele û arîşeyên xwe çareser bikin û tovên jiyanê li ser axa Newrozan aj bidin û geş bikin. Ez, cejna Newrozê li we xwînerên hêja pîroz dikim.



Seydayê Tîrêj (1923-2002)

BÎST Û YEKÊ ADARÊ

Bîst û yekê adarê, hezar carî bi xêr hat
 Di dewrana biharê, Newroz û cejna welat
 Agir li dest û çîyan, pêtî jê diçne banî
 Li çar goşê Kurdistan, dikî şewq û xuyani
 Ew agirê dilê me, pêtî jê diçne ezman
 Perava xwe da welat, dest û çîya û zozan
 Keç û xortên di kurdan, li her war û der û cî
 Bi ser bejna xwe berdan, xeml û xêza kurmancî
 Keç û xort û mêr û jin, dikin pîroziya hev
 Tev rûgeş in, devliken bi ax û xwezya hev
 Bi kêf û şadîmanî girtine reqş û govend
 Yekîfî mehrevanî ne b'êşîrtî ne b'dubend
 Ji bo me pir ziyar in, ev dubendî eşîrî
 Bi van rêçên xwar û mar, doza me naçe serî
 Heta ku em nebin yek, nabe tu kar û xebat
 Goga xwe em nebin şeg, azad nabe ev welat
 Divê bi dilpaqijî, destê xwe em bidin hev
 Çi cotkar û çî karker, bi yek can û dil û dev
 Hinga em xweş dikarin, bikin daw û doza xwe
 Bi serbestî azadî, pêk bînin Newroza xwe
 Hêvî dikim ji yezdan, her sal weke vê rojê
 Bikin pîroziya hev, bê par em nemînin em jê
 Hem ji bê par nemînin, ji raman û doza xwe
 Bi dilxweşî bistînin, em jî îro mafê xwe
 Mafê me jî bighê me, wek mîletê cihanê
 Azad bijîn wek welat, di vê dewr û zemanê
 Wekî îro li hev kin, pîroziya welatê
 Ji dil xwe em bi der kevin, vê keder û şewatê
 Wek îro em silav kin, li şehîdê goristana
 Baqên gulan belav kin, li tîrbên cengevana
 Destan li hev bibestî, li ber gorêd ciwana
 Demek em tev biwestî, ji wan pehlêwana
 Ji bîr nakin tu carî, xebata wan şepala
 Ne b'şev û roj û meha, ne jî bi heyam û sala
 Ew şehîdên dilawer, canê xwe kirne qurban
 Xemilandin bi xwîna xwe, axa kurd û Kurdistan
 Daxwaza min ji dinyê, ji vê pê ve min navê
 Tîrêj li ser we û wan, dike her dem silavê

Seydayê TÎRÊJ

Newroz û Pîroziya Newrozê

Li gorî salnameya Awestayê roja sersalê Newroz e. Di vê salnameyê de meha pêşîn meheke bi navê Ferwardîn e û roja pêşîn jî Newroz e. (Li gorî salnameya mîladî ev roj 21'ê adarê ye.) Di zimanê medî de niha Newroza ku em tînin ziman wekî Nawa Roaca gotine. Ev jî di der barê kana Newrozê de tiştekî berbiçav dide ber destê me



Pîrozî di jiyana mirovahiyê de gelek girîng e. Gava ku di bîrdozî û hişmendiya civakê de tiştek bi pîrozî bê dîtîna êdî zû bi zû ji hişmendiya gel demayê. Û ev jî serî heta binî di jiyana civakê de cih digire.

Ji bo civakê ango ji bo gel gelekî aliyên girîng ên pîroziyê hene. Avakirina tiştekî pîroz, afirandina aferînekên pîroz û parastina van; destpêkirina pêvajoyên nû, bikaranîna bûyer û tevgerên civakî yên nû û hwd... Li ser vê, civak, bûyerên ku di jiyana wê de bandorên mezin bikin pîroz dike û bi rîtuêlên bi pergal her tim bibîr tîne û di jiyana xwe de bi awayekî cejnî cihekî mezin jê re vediqetîne. Ev dibe nîşaneya bingeha jiyana civakê. Hêzeke dîrokî û girseyî civakê ber bi tiştên pîroz ve dikişîne. Pîrozî dibe navenda jiyana gel, her tişt li dora nîşaneya pîroz digere. Cejnên di nava civakê de ji ber vê gelek girîng in û pîroziya wan tim û tim tê nasîn.

Li ser vê tespîtê em li civaka herî kevnare û mêjûdirêj -ku gelê kurd e- binihêrin; em ê bibînin ku tişta herî pîroz ji bo wan Newroz e. Belê, Newroz bi her awayî di jiyana kurdan de navenda hemû tiştên pîroz e. Pîroziya Newrozê ji bo kurdan jî gel û civakên din ciyawaztir e. Bêguman her gel an jî civak li gorî xwe xwedî pîroziyekê ye, ev li gorî orîjîna (kana) wî gelî diyar dibe. Ji ber vê pîroziya Newrozê bêtir watedar e.

Newroz...

Girîngî û watedariya Newrozê ji 3 aliyên ve xwe dide der. Yek jê xwezayî, ya din civakî, ya sêyemîn jî gelêrî ye. Di vir de du aliyên wê yên girîng hene; yek xwezayîya Newrozê ye; ya din jî li ser orîjîna gelê kurd dîrokiya Newrozê ye. Di jiyana kurdan de pîroziya

Newrozê hem xwezayî ye û hem jî dîrokî ye.

Çima Newroz ew qas girîng e?

Li Mezopotamyayê civaka herî kevn û ya ku tovên jiyanê li ser xaka wê cara pêşîn ajotiye gelê kurd e. Ya jî em vê bibêjin; di nava civakên ku di destpêka zayîna mirovahiyê hebûne de civaka ku li ser rehên xwe bi bendewariyekê xurt giyandêriya xwe parastîye gelê kurd e.

Di salê de roj û şev du caran dibin yek. Yek di demsala biharê de, ya din jî di payîzê de. Civak û gelan ev guherîna xwezayê li gorî xwe şîrove kirine û li ser wê rîtuêlên olî bi pêş xistine, mîhrîcanên şahî û xweşiyê li dar xistine. Ji ber ku vê rewşa xwezayî li her derê



dinyayê pêk tê hemû gelan bi awayekî wate dane vê û her gel û civakê li gorî orîjîna xwe ew bi nav kiriye û wate dayê. Di jiyana xwe de cih ji vê re veqetandiye.

Bêguman ev rewş û bûyera xwezayî li ser civaka kurdan jî bandoreke watedar hiştiye. Kurdan jî li ser vê rewşê jî bo xwe cejn diyar kirine. Ev wateya Newrozê ya herî berê ye. Lê tiştê ku Newrozê girîng dike û watedar dike, aliyê wê yê civakî û dîrokî ye. Dapîr û bapîrên kurdan yên ku ji berê de li Mezopotamyayê xwe wekî mirovî afirandine wateyeke li gorî Ne kana xwe li wekheviya roj û şevê ya biharê jî aliyê kirine. Salname û kar û barên xwe li ser ve tê kirinê jî wateyeke bi xwe re dike. Ev bûye çand û dîroka destpêka l

Li gorî salnameya Awestayê roja sersalê Newroz e. Di vê salnameyê de meha pêşîn meheke bi navê Ferwardîn e û roja pêşîn jî Newroz e. (Li gorî salnameya mîladî ev roj 21'ê adarê ye.) Di zimanê medî de niha Newroza ku em tînin ziman wekî Nawa Roaca gotine. Ev jî di der barê kana Newrozê de tişteki berbiçav dide ber destê me.

Lê dema mirov ji roja îroyîn de li Newrozê û li wateya Newrozê binihêre bûyerên bêtir girîng hene û van bûyeran di dîroka kurdan û ya Mezopotamyayê de xwe derdixin pêşiya me.

Belê Newroj ji aliyê xwezayî ve tê wateya destpêka biharê, wekî cejna biharê tê pîrozkirin. Lê dema mirov li dîroka kurdan û Mezopotamyayê dinihêre bûyerên

ku çêbûne naverok û wateya Newrozê bêtir girîng dike. Li hember zîlm û zorê civak dema rabûye ser piya çima serkeftinî û şoreş di roja Newrozê de pêk hatiye? Bûyerên ku ji bo civaka kurdan girîng bûne rastî roja Newrozê hatine. Ev ne tesaduf e. Salnameya Awesta ku ev a kurdan e bi Newrozê dest pê dike; Gelên Mezopotamyayê di pêşevaniya dapîr û bapîrên kurdan de dema dest bi raperîn û serhildanan kirine ya destpêk bi Newrozê bûye ya jî bi Newrozê bi encam bûye; li roj hember serdestiya Asûran û Azdehaqê Zalim wezayî serhildana Med û gelên Mezopotamyayê bi Newrozê bi encam bûye; di dîroka nûjen wateya de jî serhildan û raperînên kurdan û harê, wekî Newrozê bûye; Şêx Seîdê Kurdî harê tê destpêka raperîna kurdan ya 1925'an dema mirov li gorî Newrozê plan kiriye; Mazlûm kurdan û Doganê nemir li hember zîlm û zora ayê dinihêre 12'ê îlonê çalakiya xwe ya pîroz roja wê çêbûne Newrozê li dar xistiye; daxuyanî û wateya peyamên salane yên li ser têkoşîn û bêtir plansaziya şoreşên dîroka Kurdistanê di heman rojê de têne dayîn. Ji ber vê rojeke wek roja Newrozê ji bo kurdan tê wateya her tiştên ku têkiliya wan û dîke têkoşîna wan bi hev re heye.

Kurd hingiya Cejna Newrozê afirandine û bi nav kirine, heta niha wekî cejn û şahî pîroz nekirine. Her tim bi kul û keder bûne; ya bi destpêka têkoşînê ya jî bi avakirina şoreşê pîroz kirine.

Niha jî kurd pîrozbahîya Newrozê bi têkoşerîya xwe dîkin.



Cegerxwîn (1903-1984)

NEWROZ E

Newroz e Newroz e
Newroz e Newroz e
Sibe ye Newroz e
Maçek bide min yar
Cejna te pîroz e

Newroz e bihar e
Bel bûne gul û dar e
Bîna gul û lale
Destê min bi dest yar e

Newroz û mizgîn e
Bihara rengîn e
Kesk û zer û şîn e
Xalîca rengîn e

Helbest: Cegerxwîn
Muzîk: Aramê Dîkran

"Di nav hunermendiya Aramê Tigran da xeysetê ermenya û kurda, du sitilên qedandinê tevî hev bûne û stîleke stiranên kurdî, ya bajariyê ya xisûsî çê bûye."

Nûra Cewerî





Di Nava Kurdên Ezîdî de Newroz

Timûrê XELÎL

...Bi hezara sala berê (û hetanî îro jî) bal kurdên êzdî cejnek hebûye, ku navê wê “Kiloça sersalê” ye. Ew cejn bi vî awayî dihate pîrozkirin: Her sal di pêncşema sisêyan ya meha adarê de hevîr distirên, morîkî (an jî bişkokekê) dixine navê, kade çêdikin, paşê kerî dikin, dikine heft perçeyan, para Memê Şivan (bereketa pêz), Gavanê Zerzan (bereketa dewarên gir), Xeta cot (bereketa axê) û hemû neferên malê didinê. Ew morî, an jî bişkok para kê bikeve, wê salê qismetê wî wê zêde be, bi gotineke din, dewletê salê di serê wî da ne. Lê eger para xwediye malê bikeve, wê salê bela û qeza wê ji wê malê dûr bin û eger para Memê Şivan bikeve, Gavanê Zerzan an jî Xeta cot bikeve, wê salê li gorî wan wê debar, hasilet û rez pir bin. Hetanî berî çend deh salan jî kurdên êzdî nizanibûn, ku ew cejna “Newrozê” ye. Paşê, gava dengê kurd û Kurdistanê kete guhên me jî û me der heqa “Newrozê” de bihîst, me texmîn kir, ku... Kiloça serê salê ew ya sersalê ye, sersal jî sala nû ye, sala nû jî roja nû ye, roja nû jî nûroj e, nûroj jî “Newroz” e...

Sînem û Cejna Newrozê^(*)

Jan DOST

Kêf û şadî ye dunya buhar e
Bi şev li gulan şevnem dibare

Xunçeyên daran yek yek bişkivîn
Di rengê lêvên sor û hingivîn

Çiya ji dûr ve bilind xuya ne
Li serê wana mij û dûman e

Li hawîr kelê gulzar û çîmen
Beybûn û binefş, nêrgiz û semen

Kulîlk û nesrîn, qewan û şîlan
Girtine govend , sema û dîlan

Serî bi bê re xweş dihejînin
Bihar e dunya, serxweş û dîn in

Kaniyên şêrîn pêl pêl û rewan
Ref ref dimeşîn zerî li rex wan

Perwane rengîn hawîr difirin
Li ser gulên sor nermik digerin

Şivan li hawîr dewêr diçêrin
Hinek li jor in hinek li jêr in

Newroz e, keç û xort û mêr û jin
Bi kêf û şadî ji mal derketin

Keçên nûgiha xwe xemilandin
Di gel nêrgizan kezî hûnandin

Bi ser milan de gulî berdane
Bejin zirav in gulên yekta ne

Hin sipî sor in kildayî ne çav
Mijan dirêj in birhên wan zirav

Porê hevirmêş berdane ser mil
Biskên çivandî dav in li pêş dil

Gerden zelal in rixam û mermer
Li dorê mircan morî û gewher

Sîng û berê wan berfa sipî boz
Dêmên wan gulî hildayî ne poz

Gava dikenin ew şepal û şeng
Diran xuya ne durrên sipîreng

Di destên wan de çinçing in bazin
Weke mêkewan hawîr dibazin

Li newqên zirav gerandin kemer
Xweştir e bîna wana ji enber

Lêvtenik û sor gulê di hûr in
Weke xezalan kom kom dibûrin

Li rex van keçên şox û sipîçerm
Zerî dimeşîn nazik û xwîngerm

Guhar ji mil dûr, porê wan xelek
Birû kevan in çavreş û belek

Awirên wan tûj dil dikewînin
Ji ber wana xort serxweş û dîn in

Di gerdenê de ristik ji zêr in
Sîng û berê wan ji sêvan têr in

Bejin dirêj wek darên çinarê
Ev keç in taca serê biharê

Bi cejna Newroz dilê wan xweş e
Devên wan li ken rûyê wan geş e

Ji hezar rengî kiras li wan in
Hin sipî, hin zer hin erxewan in

Di dest hev de ne pismam û dotmam
Ji meya şadî vexwarin sed cam

Xort ji li hawîr diçûn dihatin
Ciwan û çalak şêrên welat in

Hin li ser hespan ji hev re diçûn
Wek ba diborîn westa nedibûn

Hespên wan kimêt boz û qule ne
Xençerên serxwar di ber wan de ne

Hinekan ji wan sivik baz didan
Heyheya wana dighişte ezman

Li ba dikirin desmalên rengîn
Teprep û gurmîn ji erdê danîn

** Beşek ji destana Kela Dimdimê ya ku di sala 1991'an de derketiye.*



NEWROZ

Wek qurmekê dara gulê
Her salekê şiqin didim

Tarî û şev min nas dikan
Tîrêjeka rojê me ez...
Min lêv dikan li her deran
Ez dame ser çav û seran
Van kurd hemî min hez dikan
Hozaneka Xanî me ez...
Her dijmînê tariyê me
Rûpeleka şorişê me
Keçik bi min xwe nav dikan
Hêviyeka kurda me ez...
Ez nakevim bin destê kes
Nabim xulam û malê kes
Zincîra wan ez çir dikim
Wek pêleka derya me ez...

Bona gelan li her deran
Rizgariya hemû kesan
Bo rojeka azadiyê
Tivingeka cengê me ez...
Cejna we me, Newroz im
Ez şoriş û bahoz im
Bo serxwebûnê şer dikim
Pêşmergeyê çiya me ez...
Bona şehîd misk û gulav
Bo bendiyan ez im silav
Hem saz û awazên we me
Hem çakûtê Kawa me ez...

CANKURD

DI HIŞMENDIYA ME KURDAN DE YEKEM NÎŞANEYA NETEWETIYÊ

Semra OZBEY

Ez zarok bûm, hema tê bîra min; dibû şeva 21'ê adarê li çiyayê hember agir pê diketin. Ne çiyayekî bilind, lê girseyek bi qasî çiyayekî kevirên gir di nav hev de bû û Farqîna di nav şînahiyan de windabûyî li qûntara vî çiyayî li deştê raxistî bû. Ji mala me ve xweş dixuya. Di nav şeva tarî de cî cîna tenê agir xuya dikir, mîna stêrkên asîman. Wê çaxê -beriya salên 80'êyî bû- çend xortên merivê me ji gund dihatin û li cem me diçûn lîseyê. Ew jî wek hemû keç û xortên wê demê bi ber bayê şoreşê ketibûn. Xortên di her warî de çalak bûn. Ew û hevalên xwe her tim bi heraret meseleyên welêt nîqaş dikirin, bi dizîka pirtûk dixwendin, muzîkên kurmancî guhdarî dikirin. Ji me, ji zarokên malê pir hez dikirin û em her tim bi wan re, li ser çokên wan, li der û dorên wan bûn. Bi vî awayî bêhemdî em jî dibûn guhdarên nîqaşên wan. Min cara pêşîn kurd û kurdewarî ji wan nîqaşan hîn kiribû.

Dema ku ev agir pê diketin meraq û heyraniyek ecêb diket dilê me û şîrove û nirxandinên wan jî dest pê dikirin. Heta ku ew ne li mal bûna me digot qey çûne ew agir pê xistine. Ê bi xwezayî me dipirsî ka ev çi agir in. Her kesî digot ku ew agirên Newrozê ne. Dema me dipirsî ka Newroz çi ye, ji me re destana Newrozê digotin: Di vê destanê de welatekî xweş û di nav şahiyê de hebû, zilm û zordarî, zalim hebû, berxwedan hebû, serhildan hebû, rizgarî û dîsa dawiyek xweş hebû.

Ez dikarim bibêjim ku çîroka herî kevn a ku tê bîra min ev e. Heta bi raya min hemû zarokên kurdan piştî lorîna diya xwe, yekem car li ser kurdan û bi kurdî li vê destanê guhdarî dikan. Ji ber ku her sal bi berdewamî û bi îsrar ev berxwedan û serhildan tê pîrozkirin. Cara pêşîn bi vê destanê pê dihesin ku kurd hene û welatekî kurdan heye. Motîf û rengên neteweyetiyê yekem car bi destana, efsaneyê Newrozê dikeve guhê zarokên kurdan. Û ev motîfên xurt û rengîn di hişê wan de tînin honandin.

Di hişmendiya me kurdan de yekem nîşaneyê neteweyetiyê Newroz e. Dîsa sembola berxwedanê û hêviya serfiraziyê ye. Mirov difikire; wa ye di dîrokê de jî kurdan zilm û zordarî dîtine û dawî jî bi serfirazî û rizgarî lê hatiye. Hêviyê dide mirov ku wê rojekê xelasî hebe û kurd di welatê xwe de şa û bextewar bijîn.

KURMÊ ŞÎRÎ HETA PÎRÎ

Aram GERNAS

Berê meriv ji cihekî biçûya cihekî din li kolanan, li ber malan, li ser sergoyan, li qeraxê rê û dirban rastî gelek tekerên kevn dihat. Kesî bihayê pênc pereyî bi wan nedida û tu balkêşiyek wan jî tune bû. Lê ew roj û çend roj berî wê, teker bûbûn tûtya. Te digot qey erd qelişibû û hemû tekerên kevn di vê qelişteke da hatibûn daqurtandin. Êdî wisa bûbû ku, meriv bi pera jî bi dest nedixist. Ew xortên ku ji qehwexaneyan dervediket, niha li kolanan bi serî li hev diqelîbûn. Hinek bi awirên revoke derdora xwe raçav dikirin; hinek ji bo ku balê nekişînin ser xwe, tizbiyê destên xwe li vî alî wî alî hildavêtin û li tiliyên xwe dialandin, di milên hev de û di sohbetêke kûr de xwe didan nîşan dan da ku bala xelkê nekişînin ser xwe. Lê gelek ji wan xortên nûgiha bûn û xwe zû didan dest. Tatêl û pîrsgirêka hemûyan teker û tiştên şewatê bûn.

Alan û Baran jî derketibûn nêçîra tekeran, ji ber ku teker baş dişewitîn û alavek gur bi wan diket. Herê don û dûyê wan têrî xwe hewayê qirêj dikirin û bêhneke ne xweş li der û dorê dixuricandin, lê agirê wan demdirêj bû.

Bi her du hevalan çar teker hatibûn bidestxistin. Eger du şûşe gaz jî bihata raykirin kêmaniya wan nedima û wê bi dilekî rihet biçûna çiya.

Alan dest avêt berîka xwe lê berîkê hevaltiya wî nekir û perê nîvşûşe gaz dernexist. Gelekî aciz bû û bi sîtemkarî got:

- Ne bi vê bejn û balê û ne bi vê fors û fiyaqê!. Ez ê niha ji te pîrs bikim ka çiqas pere di berîka te de heye, ez dizanim ku tu yê berîka vala nîşanî min bidî. Ne wisa ye?

Baran bê peyv berîkên xwe vajî kir û dawêşand. Ji şerma rûyê wî sor bû, girmilkê xwe li ba kir û lêvên xwe çemand.

Weyla xwelî li serê me xorta be!.. Kesê ku li bejn û balên me yê sipehî binihêre, wê bêje niha berîka vana çiqas gewz e. Lê nizanin ku fors û fiyaqa me bi berîka vala ye. Nizanin ku niha me biguvêşin wê heqê du şûşe don ji me derneyê... Baro! Tu xwe bêhnekê ragire, ez ê bazdim herim ba Fexoyê donfiroş. Fexo min naşkêne, ya bi deyn yan jî bê pere ez ê du şûşe don bînim û werim.

Fexo nimerdî nekir û du şûşe don da Alan. Bi tevayî

çardeh teker û du şûşe don du roj berî agirvêxistinê li bilindahiyêke çiya hate veşartin.

Bîstê Adarê, hemû hazirî temam bûbûn û êdî dema agirvêxistinê û pîrozkirinê bû. Grûba Alan ji heft kesan pêk dihat. Bêguman gelek grûbên cuda yê din jî hebûn û her grûbek li bilindciyekî bi cih bûbû. Dema zeraqa tavê sor bû û ber bi avabûnê ve çû, agir bi tekeran ket. Di nav çend deqeyan da li bilindahiyên şewqa bi dehan agiran çiya ronî kir û dûxaneke reş bi ser çiya xist. Xort ketin milê hev, li dora agir ketin govendê û bi stranên Newroz û azadiyê çiya ji nû ve vejandîn.

Êdî wextê dagerê hatibû û agir jî hikmê xwe winda kiribû. Alan û hevalên wî bi kêf û henek û laqirdiyan ji çiya şiqitîn xwarê. Bozo Miheme li pêşiya hemûyan bi lez û bez dadiket. Li qûntara çiyê çend malên Boşatiyan hebûn. Kesî nizanibû bê çima mîlet li hev civiyabû. Her kesî wisa hesab dikir ku mîlet ji bo seyra agir derketiye der û li hev civiyane. Lê Alan ketibû şikê û vê civanê ne ji xêrê re şirove kir, lewra baweriya wî bi Boşatiyan tune bû û nediket serê wî ku Boşatî kêfa xwe ji agirê Newrozê re bînin.

Bozo Miheme berî hemûyan giha hinda xelkê lihevciyayî. Heta ku Alan û yê din gihan hinda wan, Hecî Semo yê yekçavî destê xwe kiribû qirika Bozo Miheme û li vî alî wî alî ew dihejand û dida xeberan. Alan têgihîşt ku roj xirab e, ji hogirên xwe ra got :

- Hecî Semo min nas dike. Ez ê wî mijûl bikim, hûn nesekinin û birevin. Hûn vana nas nakin!.. Vana hov in û dikarin li ser çengek av şer bikin. Ev malên qûntara çiya, hemû merivên hev in û eger şerek biqewime sed kes dikarin li merivekî bipiçikin.

Alan xwe gihand Hecî Semo, Bozo Miheme ji nav dest û lepên wî derxist û îşaret dayê ku bireve. Hecî Semo yê kor guh nedida tu tiştêkî û ji merivtirê serê wî hatibû şûştin. Hewldanên Alan pere nedikirin, dora wî hêdî hêdî dihate girtin û diket nav çembera êl û epên Hecî Semo. Ji nîşka ve, ji paş ve mirdiyaqekî spîndar di çemastûyê Alan de deng veda. Bi hezaran stêrk li ber çavên Alan velayistin. Şewiş û bi zorê xwe ragirt ku nekeve nava dest û piyan. Hecî Semo di nava destên wî de mabû. Divê li pêşberî van nimerivan tirs nehata nîşandan, ji ber ku pîraniya mîrên boşatî yek bi yek ji mîrxasiyê dūr

bûn û nedipizivîn. Lê niha deh dozdeh kes li serê Alan piçikîbûn û niyeta wan xirab bû. Alan ew baş nas dikirin û lewma jî li hev şaş nebû û bi derbekê Hecî Semo avêt xwarê û rêya mêraniyê di revê de dît, ji ber ku nîvê mêraniyê rev bû.

Êl û epên Boşatî bi carekê bi dû wî ketin. Dema ku giha serê reza, şivanekî ku li serê reza pez kiribû mexel, dest avêt kevir ku biweşîne Alan. Wê hingê Alanê ku nedixwest çekê bi kar bîne û bikeve sîngê xelkê, demançeya xwe ji ber xwe kişand û kuta nava serê şivan. Şivan kevirê destê xwe di ber xwe de berî erdê da û wek şiva nava avê ricifî. Alan sîleyek daweşand şivan û ew dev û rû da erdê û jê re got: *"Eger tu kurd bî, piştigiriya boşatiyan ne doza te ye!.."* Bi lez û bez ji wê derê reviya û kete kolana ku derdiket alî bajêr. Kolan ji her du aliyan ve malên boşatiyan bû û mixabin ku rêya revê her ev kolan bû. Di kuçeyê de jin û zarokên wan, di destê wan de dar û kevir pêşî li Alan birîn. Dema Alan çav bi jin û zarokan ket demançeya destê xwe kir ber xwe û veşart û li nava komê xist û derbas bû. Gelek derbên keviran xwar lê bi selameti xwe û hevalên xwe xilas kir. Di wê hengameyê de jineke sere bi ser koma jin û zarokan de qîriya û got:

- Bihêlin bila derbas bibe! Ev ne mêrê şikandinê ye. Hûn çekdarên li dû wî nabînin? Dîsa jî siyanetê nîşanî jin û zarokan dide. Bihêlin bila derbas bibe!..

Sed mêrên li dû Alan bi qurbana wê jinê bibin... Jin hene jinkok jî hene!..

Piştî Alan du komên xortan jî, ji çiya daketibûn xwarê û ketibûn tomika mala Hecî Semo. Kor korê Xwedê ne, nîvkor belaya serê dinê ne.. Malbata Hecî Semoyê kor, van xortan bi destelep diqefêlin, wan jî kuştinê xirabtir dikin, dest û piyên wan girêdidin û wan teslîmê polîsan dikin.

Di navê de salek derbas bûbû û di wê navberê de gelek tişt guherîbûn. Tayina efserekî tirk ê bi navê Fehmî Altinbilek hatibû qezayê. Ev efsêr bi xedarî û nijadperestiya xwe li seranserê Tirkîyeyê naskirî bû. Armanca wî damezrandina MHP'ê bû. Pîr neborî gelek kes û eşîr ketin tora wî nijadperestî. Bêguman boşatî dîsa derketibûn şanoyê. Vê rewşê di nav welatparêzan de nerihetîyeke mezin li dara xistibû. Ew li hev civiyan û li ser pêşgirtina vê bûyerê rawestiyan. Alan jî yek ji wan bû ku beşdarî civînê bûbû. Yek bi yek kes, malbat û eşîrên ku bi efsêrê tirk re ketibûn têkiliyê hatin tesbîtkirin. Her wisa yek bi yek, kî bi kê re bide û bistîne û wan jî ve riya xirab vegeşîne jî hatin destnîşankirin. Dîsa kesî xwe neda pêş da ku bi boşatiyan re bikeve têkiliyê. Boşatî cardin man di stûyê Alan de. Eger boşatî bihatina îknakirin û wan dev ji efsêrê tirk û MHP'ê berdana,

yên mayîn nedibûn xetereyeke mezin. Lê divê rêyek an hincetek bihata dîtin ku Alan biçûya gund. Kew li darê ket. Xortekî boşatî ku li bajêr rûdinişt, ji ber zewaca xwe bang li Alan kir ku ew were daweta wî ya li gund. Alan ev fîrset ji dest xwe berneda û berê xwe da Boşatê.

Dawet li hev zivirî, elbane û bilûr heta derengê şevê ji govendgêran re lêketin. Alan ji bajêr hatibû û mêvanekî ezîz dihate hesibandin. Dema dawet betal bû, gundî bi nava mêvanan ketin û birin malên xwe. Bi alîkariya zava, Alan bû mêvanê Rezoyê Koso ango serokê eşîra Mala Koso. Boşatiyan Alan û malbata wî baş nas dikirin. Xwarin û vexwarin, li hev pîrsîn û hin adetên kevneşopî ketin dorê. Di dawiyê de dor hate ser pîrsa esehî û sê roj û sê şev zar û ziman ketin cezbê. Zarê aqil û zanînê, îkna kir serokê eşîrê û bi bext û sê kevirên avêtî dev ji MHP'ê û efsêrê tirk hat berdan. Alan bi firê ketibû û bi serbilindî berê xwe dabû malê. Vê bûyerê deng veda û bû mijar û sohbeta civatan. Êdî li Boşatê pîncî rojnameyên kurdî dihatin belavkirin û di nav xortên gund de welatperwerî geş dibû.

Sal dageriya û cardin zengilên Newrozê lêketin. Xort bi gaz û çiyayan ketin û li dora agirê Newrozê dîlan girtin. Alan û hevalên xwe ji çiya daketin û li ser xaniyê Hecî Semo bûn mêvanê ezîz, bûn mêvanê goşt û birinc û bîranîn teze kirin. Êdî ji bo Newrozê kalek xapandî jî bûbû dostê demî. Lê pîr neborî, derbeya eskerî ya dozdehê îlonê çêbû. Boşatiyan car din rûyên xwe yê derewîn nîşan dan û bûn koriciyên yekem di herêmê de. Wek ku pêşiyar jî gotiye: *"Kurmê şîrî heta pîrî!"*

NEWROZ IM

Eskerê BOYÎK

Newroz im, ez newroz im,
Cejna gelê pîroz im,
Bi sor zer im, bi doz im,
Alaveke aloz im.

Dengê egît Kawa me,
Ruhê bav û kala me,
Li nav çiya da veşartî
Kela hezar sala me.

Newroz im, ez newroz im
Bi soz im û bi doz im,
Agirekî aloz im.
Cejna gel ê pîroz im.

2000 / Almanya



Dema tarî çû dema barana
Jiyan peyda bû li van çiyana
Hêviya dilê min agir ez vêxim
Agirê Newrozê li serê zozana

Bi ser me de hatî bayê biharê
Nêzik bû bîst û yekê adarê
Hêviya dilê min êgir ez vêxim
Agirê Newrozê li serê zozana

Ez î wê hîngê çardeh salî bûm
Dilê min hebû li keça cîrana
Ew nû gihabû jîr û zana bû
Keça kurda bû bi hest û ramana

Gotî hevalo dijmin zordar e
Haya te'j te bî di van mehana
Gotî delalo dilê mi'b te re
Êgir tu vêxe li serê zozana

Roja Newrozê li geşt û seyrana
Xilatê bibe du ramûsana

Ez ketim riya çiya û baniya
Mîna rêwiya mîna şivana
Hêviya dilê min êgir ez vêxim
Agirê Newrozê li serê zozana

Pir digeriyam li wan baniyan
Cihkî bibînim êgir vêxinim
Anta dilê we ez bi cih bînim
Hêviya dilê xwe ez bi cih bînim

Cendirme hatin dora min girtin
Lê ez î sivik bûm kurê şivana
Berî destên min têxin zincîrê
Min agir berda bû koma belana

Agirê Newrozê pir bilind rabû
Ronahî dabû erd û esmana
Keça cîrana dît û pê şabû
Mizgîna dilan giha xwedana

Cendirman ez dibirim ji heş û sewda kirim
Xistim tariyê binê zîndana
Dayîka min gotî berxê'm metirse
Min xistî zikê te şîrê berana

Ez xistim wê kelahê ez anîm dadegahê
Li nav çavên min xistin li bin lingên min xistin
Dûyê kesk î pir î tal di pozê min re derxistin
Bi zimankî din deng kirin tu pirs ji min nekirin

Bi emrê dadegahê şeş meh li min dixistin
Pistî şeş meh payîz tê şeş mehên din bihar tê
Dîsan diçim zozana dîsan diçim zozana

Newroz



Seyid Feysel MOCTEVÎ

Helbest : çar pirtik⁽¹⁾

Wezn : Mefûl Mafailon Mefûl Mafailon

Behr : Hezec Musemen Exreb

Roj taze xewê rabû avê dike bin befrê
Wek Îsê kurê Meryem jînê dide vê axê

Hemle dibe deşt û der alale û beybûnê
Wextê zeveza gul tê bilbil dide mizgînê

Newroz e gelo Newroz dîsan ji ve bit pîroz
Sî qerne ku cemşîdî bo me kiriye Newroz

Gava ku bi tîrojan tancê vî dibû gulroz
Bû cejneki nû ev roj dûr bû ji sir û bahoz

Her sal me pîroz kir pê keyf û henek, şahî
Gurkên me piragir bûn deştan û bilindahî

Roja me gelik geş bî îşê me gelik xweş bî⁽²⁾
Destê me berîka me jîna me bi azadî

Roja me kirin zindan em tarîtiyê giryan
Agir ji me istandin em man û sira zistan

Em bûne kovî wehşî diz bûne xudan îman
Pif kirne çiraya me malê me kirin talan

Gel girtin û gel kuştin gel bê ser û rê hêştin
Pê vê hemî zexza van pê kasika xûn miştin

Em derbider in kurd in zarûk û kiç û genc in
Agrê xwe digirsînin⁽³⁾ ayîna xwe naberdin

Ger yek ji me 40 milyon tenha û tenê mabe
Dê agirê xwe hilke dê Newrozê pîroz ke

Sersala me Newroz e dîroka me Newroz e
Ev vê di dilê gel de dayim ji me pîroz e

(Sine 2008-02-07)

Têbînî: ¹ Helbesteke ku her du beytên vê ser qafiyeyekê ne û belê wezn û mijara tavavî helbestê wekî yek e. ² Bî : Bû, rarava eşîra Herkiyan

³ Digirsînin: Diteyîsînin, rewşen dîkin, dîberdenê

Nêrgiza Welat

Arşek Baravî

Avdarê tu hat tu rewşa meha
Gula zerîn por didan ber şeha
Wa çû ew sibat çenga guneha
Berfa bi şewat digirt ser reha
Ax û herya sor kesk bû ji giha
Çerxa demê dor dewran ya seha
Derdê belengaz nehê ser deha


Gul û kulîlka bihna xwe berdan
Nêrgiza çeleng windabû ji wan
Tanî bi dîkan jê re ban didan
Du nalîn kir deng ez bûka cîhan
Hilm û periya dev ji min berdan
Çiqas min kir deng li vir bê xwedan
Zuha bûm bê av xwînmîja nêdan

Ev gulîstan tev sorgul û hîro
Îndeko rihan xuşûl û şîro
Roj li wan bû şev kok dixwe zîro
Xweş bû hilma wan li germa nîro
Bûne giş wek hev bê kes in îro
Kesk û sor didan rengê zer jî ro
Xweşî çû bi rev sed xwezî bi do



Wêne: Selmet GULER

Ji Salên 90'î Li Cizîrê Newroz



Bahaeddîn ROBAR

Sala 1992'yan bû. Meha adarê bi kêfxweşî û dilsozî dihat pêşwazîkirin. Pîrozbahiyên Newrozê ji pazdehê mehê û pê de dest pê kiribûn. Tax û kuçe û qadên Cizîrê ji hêla keç û xortan ve bi agirê Newrozê şev dikir mîna rojê. Govend û dîlana ciwanan bi stran û bêlîtan gelê bajêr rakiribû ser piyan.

Wêne: Selmet GULER

Sala 1992'yan bû. Meha adarê bi kêfxweşî û dilsozî dihat pêşwazîkirin. Pîrozbahiyên Newrozê ji pazdehê mehê û pê de dest pê kiribûn. Tax û kuçe û qadên Cizîrê ji hêla keç û xortan ve bi agirê Newrozê şev dikir mîna rojê. Govend û dîlana ciwanan bi stran û bêlîtan gelê bajêr rakiribû ser piyan. Dengê dehol û zirnê ji hemû aliyan ve dihat. Te digot qey tu deverên bê govend û dîlan û bê dehol û zirne nîn e. Xuşînî û mişînî diket dangan. Keçan cilên xwe yên reng û reng ên herêma Botanê kiras, xeftan û fistan wergirtibûn. Lawan jî şal û şapik û bedilên leşkerî li xwe kiribûn û cemedanî û şotikên Behdînanî li ser şidandibûn. Mirov tim dixwest li bejn û bala wan binêre.

21'ê adarê hêdî hêdî nêzik dibû. Heyecan û kelecane her diçû hê zêde dibû. Kesên cilên taybet didan dirûtin, yên emanetî dianîn û yên ji boxçik û quncikên hilandî de derdixistin. Timaya pîr û kalan jî dibir tevlîbûna pîrozbahiya cejna Newrozê. Êdî pîr û kalan jî amadekariyên pîrozbahiya Newrozê dikirin.

Li mizgeftan, qehwexaneyan, saziyan û hemû beş û sinifan tenê mijarek hebû ew jî pîrozkirina Newrozê bû.

Hê 20'ê adarê piştî nimêja êvarî pê de ji dûmana agirê Newrozê ew asîmanê çik sayî seranserî bajarê Cizîrê ewrekî reş û tarî girtibû. Li bi sedan ciyan dû û dîxana agirê Newrozê hemû cureyên şewatê li jor şahidiyeke bêtirs û hîle dikir.

Pêta êgir nêzikahî li asîmanan kiribû. Ji çiyayê Cûdî û Gabarê agirê Newroza warê Mem û Zînê, diyarê Melayê Cizîrî wek rojê xuya dikir. Heçko ew agir bibêje ji inyeta dagirker û zilumkarên dîrokê va ye ez û germahiya gelê Mezopotamyayê li vir in. Nêzikî dema nimêja eşayê êdî cihê êgir xwe ji dengê guleyan re berda bû. Bêdengiya şevê bi dengê mawzer û keleşkofan xira bû. Li raserî bajêr asîmana guleyan stêrk di bin siya xwe de hiştibû. Êdî ne bi pêta êgir, ji guleyên agirin Cizîra Botan ronî dibû. Te digot qey şerê cîhanê yê yekemîn e. Te digot qey şerê Kendavê ye. Li asîmana gule li hev diketin. Êdî dengê sîlehan tenê ji pirdengiyê xuşînyek bêterîf dihat. Wek tofan rabûbe. Lê vê carê ne tofana av û lehiyê bû û keştiya Hz. Nûh vê carê bûbû Cizîr û hemû mîrxas û lehengên Mezopotamyayê li Cizîrê kom bûbûn. Tofana top û guleyan bû, lê belê Cûdiyê miradan dîsa şahidiya vê tofana duyemîn dikir. 21'ê adarê êdî ev roj bû. Li navsera Cûdî tîrêja tavê silav û pîrozbahiya cejnê li gelê Cizîrê dikir. Germahiya tavê tevlî germahiya agirê Newrozê dibû û Cizîr û cizîrî dikizirandin. Ji serê sibehê pê ve pîrozbahiyê dest pê kir. Keç û xortan ji mêj ve govend û dîlan girtibûn. Ji hemû taxan û ji hemû aliyan ve gel dikişiya navenda bajêr û daxwaza serdana goristanê dikirin. Hêzên ewlehiyê destûr nedidan ku gel biçe serdana goristanê. Lê belê gel ji bo çûyînê bi israr bû. Li ser vê yekê di navbera meşvan û hêzên ewlehiyê de gengeşî û pevçûn çêbû. Hema hema hemû bajariyan deriyên xwe girtibûn û derketibûn kuçe, kolan û qadan. Kesên pîr û kal ên ku çûbûn mizgeftê nimêj bikin, esnaf,

dikandar, xebatkar û gundî bi hev re tevî pîrozbahiyê bûbûn û daketin qada. Êdî gule mîna baranê ji hemû aliyên ve dibarîn. Tu kesa nedizani hêjmara kuştî, birîndar û girtiyan çend in. Kalekî 90 salî bi navê “Cango Pola” di nav keç û xortan de dicoşiya. Ji cil û bergên Botanê şal û şapîkekî kixmeriyê çar mekik lê bû. Wî jî mîna hemû kalan cejna Newrozê pîroz dikir. Hingê dît ji aliyê çaryana bajêr ve gule li wan hat barandin û Cango Pola jî di nav de 4, 5 kes ji cihê xwe yê cur be cur hatin birîndarkirin. Ji wan birîndaran yek bi navê Loqman zû de miribû. Kaloyê 90 salî jî ji piyê xwe birîndar bûbû. Neviyeke kalo ya keç û xortek ji meşvanan xwe xistin bin milê wî û ew ber bi malê ve birin. Bi dehan birîndar û mirî li wan erdan bûn. Berê komeke qelebalix ket erdeke bi herî û çirav û gule li wan hatin reşandin. Ji tirs û xofê girseyê xwe avêtin nav wê çirav û heriyê û pê li hev dikirin. Nêzikî 20, 30 kesa di nava wê çiravê de çikilî û birîndar bûbûn. Tu kesî/ê nediwêrî birîndarên xwe bibin nexweşxaneyê. Kuştî û birîndar li malan ji aliyê pîr û xwendevanên tibê ve dihatin dermankirin. Kalê 90 salî jî li malê dihat

dermankirin. Lê belê kalo li ber guleya ku li piyê wî ketî nediket. Li ber wê diket ku guleyê şalê wî yê kixmeriyê çarmekîk qul bûye. Her digot xwezî guleyeke din jî li piyê min biketa, lê şalê min qul nebûya. Êş, azar, tirs, xwîn, rondik û feryat tevî coş, şahî, govend û pîrozbahiya Newrozê bûbûn. Gelek birîndar ji ber herikîna xwîna birînan a zêde jiyan xwe ji dest dan. Birçibûn û tîbûn ne li bîra kesê/î bûn. Xwestinek hebû ew jî zûdermankirina birîndaran bû. Lê roj ji mêj ve ji vê hovîtiyê xeyîdibû, stûxwar û bêxatir ji cizîriyan xwe diveşart û perdeya xwe ya reş digirt ser wê eyba sedsala 20’an û ne dilxwazî dinixamt û diçû.

Cango Pola tim ji zar û neviyên xwe ev pirs dipirsîn: Gelo ma çima li vî welatî pîrozkirina cejnê qedexeyê? Ma em jî ne xwediyê vî welatî ne? Ma çima ji cejnê ditirsîn? Ma nedigotin em bira ne, ev e biratî? Ma bi qedexeyan pîrsgirêk safî dibin? Lê pîrsên Kalo bêbersiv diman, wek birînen wî yê bêderman mayî...

GUL A BIHNA XWE AVDAN

Ayten ÇACAN

Her berbang xwe dixemilîne ji bo rojê di tunebûna asoyên ahengî de... Xêliyên xwe bi guliyê rojhilat ve girêdidin, di xatirxwestina çileyê xeternak de... Bi tilîliyên hatina mizgîniya biharê re belbizik serê xwe radikin û silavan li kulîlkê çeman dibarînin, di şilopeyên devê biharan de... Meşên bablekanî li senfoniya bayê wer dibe, bi mêvanî li deriyê guhê me dixin... Rengesor xwe berdidin ser bedenên nazenîn, bi xweşikiya xwe çavan ronî

dikin, reqşê li ser banan dibin stara dîtina keç û xortan, ken li lêvên ku hatibûn tamdan ji nû ve şax vedidin... Xort di çavên xwe de cîhanek, keçik jî di dilê xwe de asîmanek ava dike... Cîhan û asîman dibin stargeh ji bo lehengên nebî...

Bi herikandina çemên biharê re melodya jiyanê dimirmire li temenê me, em dibin herikbar ber bi Helepçeyê ve diherikin, xewnên me bi kenên zarokên pênc salî nîvcomayî dimînin û leyîstikên kuştî em şiyar dikin, ji xaniyê sînga me, ji delavên lêvên me mû xelas nabin...

Di her meşa me de guleyek, di her rûniştina me de bombeyek, di her fikirandinên me de zagonekê diçin... Em bi iskîniya adarê hatine meyandin, bi arê Zerdeşt hatine kewandin... Em zarokên Newrozê ne li ser qadan hatine daçikandin, kê/kî dikare bizrê me bihelîne?... Em çarikê helbesta sersalan in li pirtûkan hatine nivîsandin... Em kulîlkên çiyayan in li zinaran hatine xemilandin... Em neviyên Zerdeşt, gul bi bêhna xwe av didin...

Lehiyên biharê xelas dikin gemarê... Roja nû roja ku Keyakser li hember xwînvexwaran şûrê yezdanan bi kar anî, roja ku hemû çarmedorên Nînova bi bedenên kulîlkên biharê hate xemilandin zilma kedxwaran hate çewisandin.

Roja şiyarbûna zarokên rojê ji xewa bindestiyê... Roja çargaviya hespên derwêş lihembarabûna xeniqandina heskirinê... Kêlika bavekî dilşewat xwedîderketina li xortên çeleng... Axîna dayikeke ku bi guliyên keçikên hejdeh salî hûnandî... Roja Hurmuzê bi xemilandina şewq û bereketê, birêkirina Zerdeşt, ê kemilandina dilê te jî heskirin... Roj roja dilşakirina Dicle û Fîratê ku ji qirkirina xortan dil çewisibûn... Roja gulçînîna xwezayê ye ku wek kirasê keskesor li Mezrabotan bikin, bi pîvana tîna rojê çandîniya azadiyê ye li wechê zarokan bidirûn... Roja mizgîniyê ye kiras û xeftanan li bejna gel bikin... Şitlên agir dagirin tûrikên derwêş bi xelata azadiyê bişnin ji lehengên welatên min re... Nû roj tu pîrozî wek doz...



HER BIHAR

Mizgîn AYDIN

Li Mehabadê Newroz (Şêrko Cîhanî)

Dilê me wiha dibe agirê çiya her bihar ji dema Kawa û
vir ve
temenê me difirin çiya bêhesab, nemerdî dimire,
hildiweşe bi qêrîna me
Em wiha dişewitin dema ku kulîlk jiyanê hemêz dikin
Lê em, nabin xwelî ha!
Em dibin MAZLÛM DOGAN!
Û dikenin her dem bi awirên xwe yên çiyayî,
dibin rastiya xeyalên zarokên feqîr
Sal û rê diborin, lê em naborin, dibin giyana mirov
Û ba bi me radike rûpelên rêyên dîrokê yên bi toz...
Lê, firtone dibin silavên me, xwîna me dibe roj
Em hêvî bi hêvî, deman bi xwe re dikişînin
Cotkar bi barana ku ji dilê me dibare diçin ser benderan
bi dilşahî
timî kesk dimîne navê me
Em tîrêjên li çavên baz in...
Em her bihar wiha dibin bûk!
Dema ku roj, axê hemêz dike
Hinek dibên qey em tenê pêtek in li ser bircan,
lê em dibin Zekiye!
Porê me li bejna Dîcleyê li ba dibe
em dibin oqyanûs û çolan hêşin dikin
mirin ji çavên me re dibe kil,
ji destê me re dibe hene
ji serê me re dibe kofiya Amazonek Aryenî...
Zivistan di hembêzên me de dibin bihar
kenên me dibin mizgîniya sibeyên sorevîn bi stêrkên
şemetok re
em dibin mêvanên gelan her havîn
Sibehan em bi rojê re li tevayê deriyan didin
em di hilavêtina dil de bêriyên xwe parve dikin
Dema ku sorgul bêriyên xwe

ji çivîkên li hewa re dibêjin
em dibin Rehşan li koçberiyên bi ciwanikîtiya xwe
ji agirê canê me stêrk çêdibin,
veqetîn û keser diqedin
gulên nû vedibin li birînên me yên bêziman
ji çavên me hînî axaftinê dibin zarok
bi me tirs dibezin goristanê, al dibezin asîman!
Dema ku çiya zemheriyên dixînin, em dibin Ronahî,
Bêrîvan
ger ku li daristana ciyê me pelên daran şewitîbin jî, em
naşewitin
demên delal, delaliya xwe ji me digirin
Ciwan ciwaniya xwe,
dayîk lorînên xwe ji me digirin!
Gundên şewitandî bi me, radibin govenda agir
Zeviyên xwelîgirtî bi me digihîjin simbilên xwe
Em Ronahî, Bêrîvan tî, Ronahî, Bêrîvan diçin di
evînên bêdawî de...
Dema ku koçer, dehfek li zivistanê didin û wiha
karwanên xwe digihîjin zozanan,
bi zarokên xwe yên baskçivîk û keçên xwe yên çilkezî
ve
Em dibin Newroz!
Li ciyê dengê zencîran dengê bomban tê em bi ketina
xwe ya sorgul a li ser axê, şîn û girînan tune dikin
Û çîroka xwe ya ne “hebû tune bû” a “qet tune bû; qet
tune bû”
ji nû ve dinivîsînin,
wiha hez dikin,
wiha DIŞEWITIN,
wiha dibin zafer,
wiha dibin Mazlûm Dogan her bihar...

(1997)



Wêne: Selmet GULER

“Silavek jidil e Newroz
di şeva mişt xemgînî ye
beste-robarek e diherike
ber bi dilên qerisî ye”

dera jê tēm mişt agir û kevir
bi mirinan bilind bûye çîroka wê
li rûyê wê şopa gur û kedxuran
deqek tenî a mirovahiye

aha ji te re rêkurtka çivîkan
terazinên xezalan, hêza tîrêja fecarê
bi cih bike di kewara dil de
ku har û dîn e wek robarekê

min ji xwe re got
van şîretan, ew birîna xwînokî
li ser ezmanê min ev hezar sal e


bisekine, neçe! bi hezaran gule
diwîzwîzin li ser dilê min

min dît ew daristana digirî
karwanê di gelî de tengijî
ew çûka mirar a di destê êvarê

qeşa heliya
heriya wê ye li delingên tavê
marê şayîkî cemidî a dîthise
li ser gewdeya zîrekiya me
ji mêj ve ye em bêdeng in
wek şivanê agirê wî sar

niha birînek xwînokî ye dîrok, an jî
di tahma bajarekî kaviîl de
kevokên mirî dinizilin li ser rûyê
gerdûnê
bisekine, neçe!

şev û av
ax û adar direqisin
cihê xwe xweş dike Newroz
ew bagera ji lepên çiyê filitî



Wêne: Selmet GULER

Piştî ku tav di nav biskên êvarê de wenda dibe û diçe ava, dolmîşa ku xortek tê de ye dikeve nav bajêr. Bi çavên vî xortê ku ev cara ewil e tê vî bajarê qedîm tu li derdorê dinihêrî. Tu ji çavên wî di cama dolmîşê re li êvara sikakên vî bajarî û çûn û hatina mirovan dinihêrî. Lê ev nêrîn zêde najo. Tavilê çavên vî xortî ji dîmenên bajêr diqetin û nema derve dibîne, tu jî bi wî re bihara rengîn li derveyî vê dinyaya ku hûn hatinê dihêlî.

Piştî bêhnekê, yê xort te ji nav dîwaran derdixîne û bi xwe re vedigerîne çend roj berê. Mirov li sûka bajarekî diherin û tên. Ji çend hêlan dûyê êgir ji nav bajêr hiltê jor. Derabeyên dikanên bajarê wî tevdek girtî ne. Hûn pê li dewsa agirekî vemirandî dikin û hûn derbasî sikakeke din dibin. Wek avek gewimî, mirov li herkekê digerîn. Xuya ye ji tiştêkî nerazî ne û dixwazin vê nerazîbûna xwe rêbidin. Çend xort bi ber çavên te dikevin, dimeşin û diqêrin. Xortê ku tu li wî rast hatiya jî di nav wan de ye. Qaşo tu bi wî re bûyî. Lê ew çûye gihîştîye hinekan. Tavilê dora wan tê pêçan û tên girtin. Piştî ku nesîbê xwe ji elektrîkê, ji dardekirinê, feleqeyê, ava cemidî û gunfirkandinê digirin, derdikevin mehkemê û ji wira jî berê xorto didin vê derê.

Nola ku te ew li derekê dîtibe, bi te xerîb nayê. Xwîna te dikele ser. Ku tu nêzîkî wî dibî, qey

dibîne tu li ber wî dikevî. Ji vî hawê te aciz dibe û dixeyide. Ecêb e, tu heq didiyê û tu nema li ber wî dikevî.

Hûn ji nav wê qerepereyê, ji nav wê hucreyê û ji wê rêwîtiyê dertên û hûn dîsa di nav dîwarên ker û lal de ne. Çend kes tên wî dibin teslîmî qawîşekê dikin. Yên ku ew girtine nav xwe bi wî re eleqeder dibin. Li hal û wextê wî dipirsîn. Ji hêlekê ve jî mast û dimsê tînin datînin ser masê. Piştî ku radibe dihere serçavên xwe dişo û tê, dest bi xwarina mast û dimsê ku jê re danîne ser masê dike.

Gava ku dinêrin wî têr xwar dibêjin, “Heval rabe xwe bişo û kincên xwe biguherîne.” Ev xortê ku ketiye vê zindanê li tiştê ku diqewime şaş dibe. Dide kêleka kesê ku jê re dibêjin, “hevalê komunê” û dihere xwe dişo, kincên paqij li xwe dike û tê. Ew di binê bandora tevger û têkiliyên wan de dimîne. Jiyana hundir meraq dike. Yê li dora wî ne jî derve meraq dikin. Hevdu di meraqê de nahêlin.

Xortê ku tu ji wê êvarê de bi wî re yî li qawîşa pazdehan dimîne. Li her derê li şopa tiştên ku li ser vira hatiye nivîsandin digere. Bi gavavêtina wî ya hefsê re ruhê berxwedana girtiyan ew rapêçaye. Gava ku tê hinda pêlikan û dixwaze di

ber wan re derkeve here hewadarkirinê, qêrîna çar kesên ku di nav êgir de govend gerandibûn dibihîze. Tu bala xwe didiyê tu dibînî ku xort di binê bandora govenda agir de dimîne. Li wir disekine. Tu jî nizanî bê ka nêta wî çî ye û çîma li dewsa şewata wan dinihêre. Dû re derdikeve derve. Wek ev deh sal be di vira de ye wê hesret û gotina girtiyan ya ku ji hezkiriyên xwe re dibêjin, “bi hêviya ku em bi hev re pê li axê bikin û li ser bimeşin!” tê bîra wî, serê xwe dihejîne û dimeşe.

Ewrê li ezmên nahewin, carê dadidin, tava biharê di paxila xwe vedişêrin û derdixînin. Ew li ezmanê ronî û lîstika ewran dinihêre. Tê bang li wî dikin, qawîşa wan dibe mêvanê qawîşek din. Tu jî li wira li şanoyê temaşe dikî. Ji ber ku hefteya Newrozê ye, mijara şanoyê jî Newroz e. Bi skeçên wan tu û vî xortî hûn çêtir bi serpêhatiya girtiyan zindanê dihesin. Tu jî bi wî re li tiştên ku hatiye serê girtiyan dinêrî. Ew jê re dibêjin ‘wahşet.’ Hûn jî bi awayekî dibin şahidê wê ‘wahşetê.’ Nema destê te ji vî xorta dibe û tu jî meraq dikî bê ka ew ê hê çî bibe û çî biqewime.

Bala te û vî xortî bi hev re diçe ser kalokekî ku riha wî wek berfa ser keleha Mêrdînê spî dike. Salên ku ji emrê kalo xwarine kiriye ku bedena wî nola findekê bihele. Xortê ku te bi çavên wî li bihara bajarê qedîm nêrîbû ji yê kêleka xwe dipirse. Ji wî re dibêjin, “Kalo; meleyê

mizgeftê ye. Roja Newrozê piştî ku xutbe diqede dide pêşiya cemaetê û dimeşin. Tê girtin. Ew li xwe mikur nayê û înkâr dike. Kengî ku wî derdixin tînin dîmenên wî yê meşê di vîdeoyê de rê wî didin ew dîsa xwe wenda dike, dibêje qey di meşê de ye û hema li wira dest pê dike sloganan diavêje. Bi vî hawî li xwe tespît dike û tê hefsê.” Gava ku ji xort re qala mele dikin, tu jî bi xêra wî bi vî serpêhatiya mele dihesî.

Tu dinihêrî ku bi rojan ev xort di wira de dimîne û hê ew ê bimîne jî. Tevlî ku tu tiştê ku ew ê biqewime meraq dikî jî êdî divê tu wî bi tenê bihêlî. Hê tu li ser vegera xwe difikirî tu dinihêrî ku ew ji qawîşa xwe dide rê û tê. Di serê wî de hewar hewara însanan e. Di pêlikên qawîşa sî û pêncan de derdikeve jor. Tu nema dizanî bê ev xorta çîma di wan pêlikan de derdikeve û tê di hucreyekê de rûdinê. Tê, rûdinê û difikire. Nola bixwaze tiştêkî fêm bike serê xwe li ser diêşîne. Dû re li dîwarê ku dewsa quleke sewaxkirî lê maye dinihêre, li qerewat û gomlegê şîn yê bi bizmarekî dîwêr ve dardekirî ye dinihêre. Û bi deng difikire dibêje, “Ev ruh û hêz ji ku hat te?” Tu fêm dikî ku ew ji vî zindanê bê berdan jî ew ê ev hucre tim bi wî re be.

Piştî nozdeh salan, gava ku îro jî tu bêhemdî xwe, li wî xortê ku êdî qermîçokan li rûyê wî paldaye dinihêrî, tu dibînî ku hê jî wê hucreyê dijî.



Wêne: Selmet GULER

Xwezî ez bikaribim êvara Newrozê li Qamişlo û roja wê jî li Amedê pîroz bikim



Rizoyê Xerzî

Wêne: Selmet GULER

Min gelek Newroz dîtî li Amedê cuda ye

Hinek dibêjin ku Cejna Newrozê di çanda gelê kurd de her ku diçe ber bi awayekî din ve tê kişandin û dûrî naveroka xwe dikeve. Di vê der barê de hinek din jî dibêjin ku di salên dawî de Newroz dîsa bûye sembola berxwedanê. Rast e Newroz cejna biharê ye, cejna hevdîtina yarê ye, cejna kêf û şahiyê ye, lê tiştê ji van tevan birûmetir û bêtir watedar heye ku ew cejna serhildana li dijî zilm û zorê ye, divê ev yek neyê jibîrkirin. Ji xwe heke ew zilm û zora wê demê li ser kurdan bi destê Kawayê Hesinkar nehata qedandin, dê şahiya azadî û xelasiya ji destê zilma Dehaq jî nehata jiyandin. Lewra ez dibêjim ku pîrozkirina herî watedar a serhildana li dijî zilm û zorê ye û bidestxistina azadiyê ye.

Salên min bi ser çilî ketine û min gelek pîrozbahiyên Newrozê dîtî, piraniya wan pîrozbahiyên min li Rojavayê Kurdistanê li Qamişloyê dîtî lê di van 6 salên dawî de min tev li Amedê pîroz kirin. Ez ê hewl bidim ku li gor azmûna xwe, çavdêrî û serpêhatiyên xwe cudahiya di navbera pîrozkirina Newrozê de li deverên cuda bikim.

Li Qamişloyê piraniya cejnên Newrozê wekî geşt û seyrane dihat pîrozkirin. Me konê xwe tevî hemû alavên ku ji bo xwarin û vexwarinê pêwîst in amade dikir û me berê xwe dida qada ku Newroz lê dihat pîrozkirin. Kêman caran me serek li textên şanoyan yê partiyên cuda dida lê piraniya dema me bi xwarin û vexwarinê, li ber konê me derbas dibû. Yanî bi kurtahî em serxweş vedigeriyan malê û me rojekê kêfê ji xwe re davête nava saleke kul û derdan. Lê ez bîranîneke xweştir ji bîr nekim, li Qamişloyê êvarên Newrozê em bi girseyî diçûn serdana

gora seydayê nemir Cegerxwîn û hunermendê nemir Mihemed Şêxo û piştî re jî agirê Newrozê li çarnikarê bajêr belav dibû. Piştî ku ez hatim Amedê tiştê ku ez herî bêriya wê dikim êvarên Newrozê Qamişloyê ne, ne rojên Newrozê. Bi gotineke din ez dibêjim xwezî ez bikaribim êvara Newrozê li Qamişlo û roja wê jî li Amedê pîroz bikim. Xwedê mala sinoran xira bike, heke ne ji wan bûya min dikaribû her Newroz, li her du bajaran pîroz bikim.

Amedê wekî mînak

Li gor texmîna min rewşa pîrozkirina Newrozê li Başûr jî ne gelekî cuda ye ji ya rojava li gor em di kanalên televizyonan de dibînin lê germiya Amedê û pêlên gel ku di nava keskesorê de dixemile pir cuda ye. Li Amedê bi sedhezaran gelê kurd dibe yek deng, yek dil û yek daxwaz. Çiqas ku gel di roja Newrozê de dûrî sûrên Amedê dikeve jî dîsa bi dengê gel bircan himbêz dike û bang li şaristaniyên derbasbûyî dike dibêje ez heme û ez ê dest ji doza xwe ya rewa bernedim ta ku ez gerdana te bi azadiyê nexemilînim. Bircên Amedê jî salên dûvedirêj bi wan hestan li ber xwe dide û bi wê germahiyê xwe jî seqemên zivistanan diparêze. Gelo ew germahî ji ku peyda bûye, gelo ew ne ji germahiya rewanê Kawayê Hemdem peyda bûye, ku canê xwe kir êzing ji bo agirê Newrozê di zindana Amedê de vêkeve. Bi rastî gotinek pêşiyên kurdan heye ku dibêje: gotin û dîtî nabe wek hev, ez dikarim bi gotineke wiha hestên xwe bînim ziman, kesê ku bixwaze wateya Newrozê û germahiya agirê dilê gel bibîne bila were newroza Amedê bibîne. Û dawiyê ez dibêjim Newroza we pîroz be, hûn gelek Newrozên din bibînin ne bi hesreta azadiyê lê di nava azadî û xweşiyê de.

Sembola Raperîn û Serfiraziyê NEWROZ

Adar JIYAN

Di dîroka hemû gelan de, gelek rojên pîrozwer ku bi kêf û coş têne pîrozkirin hene. Di van rojên girîng û manîdar de mirov cil û bergên minasib li xwe dikin, dadikevin qad û kolanan. Li hev dicivin, cejna hevdu pîroz dikin. Govend û hengameyê li dar dixin. Xwarinên xweş çêdikin. Mal bi mal digerin. Kesên xeyidandî li hevdu tînin. Hêvî û daxwazên dêwereke aramtir didin. Heta ku ji destê wan tê xwe ji hestên kîn û kerbdariyê pak dikin û dilgiraniyên navbera mirovan ji holê radikin û hwd.

Newroz jî yek ji van rojên pîrozwer e ku wekî cejna gelên Rojhilata Navîn tê dîtin û pîrozkirin. Ligel ku li ser misogeriya mêjûya Newrozê gelek angaşt hatine/têne kirin jî, rastiya hevpar a ku hemû angaştan digihîne hevdu efsaneyê/mitolojiya wê ye. Ango Newroz çendî ku mêjûya pêkhatina wê, ji gelek jêder û çavkaniyên cur bi cur hatibe wergirtin jî, tu kes zêde şik û gumanê nayne ser misogeriya qewama Newrozê ya ku li erdnîgariya Rojhilata Navîn pêk hatiye. Ji lewre ew, wekî raperîna gelên Rojhilata Navîn a ku di kesantiya Kawayê Hesinkar de pêk hatiye tê pejirandin. Bi rastî tişteki pêkan e. Çimkî îro roj jî heman êrîş û pevçûnên ku li ser vê erdnîgariyê diqewimin, bûyerên dîroka borî jî diselmînin.

Erdnîgariya Rojhilata Navîn, ji bilî adanî û dewlemendiya xwe ya sererd û binerd, her wisa ji hêla stratejîk ve jî xwediyê xisûsiyeteke xweser û arizî ye. Ji bo vê xisûsiyeta xwe, her dem bûye hedefa êrîş, şer û pevçûnên herêmi û dagiriyên navneteweyî.

Rojhilata Navîn, do wekî dergûşa şaristaniyên kevnar bû, îro jî wekî bendera şaristaniyên hemdem û nûjen e. Her çendî ku di hemû dem û dewranên dîrokî de ji bo hêzên dagirker wekî qada şer û pevçûnên tund û dijwar hatibe bikaranîn jî, gel û civakên xwecih ên vê erdnîgariyê, li hemberî serwer û dagirkerên dinê bi serbilindî serî hildane; li ber xwe dane û ev erdnîgarî parastine. Serîhildana dîrokî ya ku di şexsê Kawayê Hesinkar de rû daye jî yek ji van serîhildanan e. Ev roj wekî roja raperîn û azadîbûna gelên Rojhilata Navîn tê dîtin. Ji bo wê wekî roja nû “nûroj/newroj” anga Newroz hatiye binavkirin.

Der barê vê roja pîroz de gelek gotegot û vegotinên cure bi cure hatine kirin. Ji ber wê ye, ku mêjûya mêjû û qewama Newrozê teqez ne diyar e. Belê rastiya hevpar û misoger ew e ku Newroz roja azadî û rizgariya gelên Rojhilata Navîn û cejna wan a herî pîroz e.

Bêguman, der barê Newrozê de heta îro bêhejmar nivîs hatine nivîsandin, gotegot û nîrxandin hatine kirin. Em ê jî di vê kurtenivîsa xwe de girêdayî wate û armanca Newrozê, çend boçûn û hizrên xwe yên derbarê qewama Newrozê de der bibirin.

Newroz, ji du bêjeyan pêk tê û ev her du bêje jî (“new/nû” û “roz/roj”) ji peyvên zimanê Hind-Ewropî yên hevpar hatiye dariştin. Peyva hevedudanî ya ku ji “new/nû” û “roz/roj” ku tê wateya “nûroj” anga “roja nû” pêk hatiye. Roja nû, li roja 21’ê adarê ku li Rojhilata Navîn şev û roj dibin yek (wekî hev dirêj dibin) derdikeve. Serîhildana vê rojê ne rasthatineke ketberê

ye. Di vê rojê de bihara rengîn rih û giyanê dide hemû rihber û candarên xwezayê û jiyanekê nû dest pê dike.

Newroz, vejîna hemû giyanewerên ser rûyê dinê ye. Newroz, vejîn û veciniqîna xwîna ku bi mehan di laşê mirovan de tevîzî maye ye. Newroz, xwe dawêşandina civatên bindest ên Rojhilata Navîn e. Newroz, xwe peyjiilandin, hilpekîna gel û civatên niştecih ên Rojhilata Navîn e. Newroz, hişyarbûn û raperîna neteweyên mêtîngeh ên Rojhilata Navîn e. Serdema ku efsaneya Newrozê xwe dispêre serdema civata koledar e. Ew serdema civata koledar ku ola Zerdestê Kal hikum û bandora xwe li ser civata Rojhilata Navîn dike ye.

Berî ku mirov behsa Newrozê bike, dive pêşî mirov behsa Zerdest û ola wî ya pîroz bike. Der barê vê yekê de ramanwerê navdar ê Awusturyayî, Friedrich Wilhelm Nietzsche gelek agahiyên balkêş radigihîne me. Tê gotin ku di bingeha vê bîr û baweriyê de hilberîn û kedhelaliyeke mezin heye. Li gorî vê baweriyê xweza û hemû heyînan ku di goşa xwezayê de bicih dibin pîroz tene dîtin. Serjêkirin û qurbankirina sewalan hatiye qedexekirin û wekî heram tê qebûlkirin. Xerckirin û serfkirin li gorî pêdivî û divêtiyên mirov tene şewandin. Di ola Zerdest de ji bilî xweparastina rewşa, hemû cureyên şidetî hatine manîkirin. Her çendî ku jin di domana jiyana civaka koledar de wekî sewalan di hate dîtin jî, Zerdestê Kal ew pîr rêzdar û rûmetdar daye nasandin. Di ola Zerdest de tîkiliya Xwedatî û evdîtiyê nîn e. Heta Zerdest bi xwedawenda qencyê Ahûra Mazda re dixeyide û pê re hesab dibîne. Wî, tu carî radestîya mirov a ji bo Xweda an jî Xwedawendekê pêkan nedîtiye.. Di ola wî de vîna mirov a azad pitir derdikeve pêş... Ji bo wê, mirov bi hêsanî dikare bibêje, ku ola Zerdest şoreşa hizrî ya herî mezin a wê demê (serdema koledar) ye.

Li ser wê erdnîgariya ku bîr û bawerîya ola Zerdestî hikmê xwe didomîne de, qeyzerê demê Cemşîd, ligel, ku tu gazinc û lomeyên gel jê nîn in jî, ji ser kar tê avêtin û li dewsa wî qeyzerê/qeranê zordar û stembar Dehaq tê ser kar. Navê Dehaq, bi zilm û tehdeya xwe li çarnîkarê dinê belav dibe. Li gorî efsaneyê, tê gotin ku şeytan bi xwe di nav kar û suxrevaniya Dehaq de cih digire. Ji bo wê Dehaq ji ber vê rewşa şeytên pîr razî û xweşhal e. Soz dide Şeytên ku çi daxwaza wî hebe dê pêk bîne. Daxwaza Şeytan a sereke ew e ku ser her du milên Dehaqî maçî bike. Dehaq bi dil û can vê daxwaza wî pêk tîne û destûrê didê. Belê piştî ku Şeytan her du milên wî maçî dike, ji nişka ve ji ber çavan wîna dibe û diteriqe. Li dewsa maçîkirina wî, du ziyayên/ejderhayên (marên) mezin peyde dibin. Dehaq serê ziyayan dide jêkirin, belê li dewsa wan her du ziyayan duduyên mezintir der dibin. Ew her du ziya êşeke dijwar û bêdebat didin laşê wî. Çi hekîm û bijîşkên welêt hene dikevin nav lêgerîn û çareserîya wî derdê wî yî giran. Belê tu çareyê jê re nabînin. Soxî,

Şeytan xwe dixê qilixê hekîmekî û diçe qesra Dehêq û li derdê wî dipirse. Gava ku Dehaq derdê xwe jê re dibêje Şeytan li ser navê hekîmtiyê dermanê êşa canê wî diyar dike û dibêjiyê: “Ger tu dixwazî jî vê êşa dijwar reha bibî divê ku tu her roj rojê carekê, her marekî mêtîyê mirovekî ciwan bidîyê; nexwe tu car ev êşa canê te dê netebite. Ango divê ku tu her roj vê yekê pêk bînî.” Dehaq fermanê dide fermanberê xwe ku her roj du xortên ciwan bînin qesra wî, wan şerjê bikin û mêtîyên wan bidin van her du maran. Bi salan ev rewşa kambax didome. Ne êşa canê Dehaqî ditebite û ne jî serjêkirina xortên ciwan bidawî dibe.

Her ku diçe hejmara ciwanên welêt kêmtir dibe û gel dikeve nav tirs û saweke giran. Û ev yek jî dibe sedema nerazîbûna civakê. Gel bertek nîşan dide û ji bo astengkirina vî tiştî li çareseriyekê digere. Rojekê ji rojan, bi navê Armaîl û Karmaîl du mirovên dilpak wekî nanpêjê Dehaq tene tayînkirin. Armaîl û Karmaîl, her roja ku di xortên ciwan ji bo serjêkirinê tînin serayê, ew wan vedişêrin û li dewsa wan, du mihên ciwan serjêdikin û mêtîyê wan didin Dehaq ku ew jî bide her du marên ser milên xwe.

Xortên ku ji mirinê difilitin xwe li çiya û baniyan digirin. Tê gotin ku ev rewş sî salî didome. Rojekê ji rojan, mirovekî ku ji dozdeh lawên xwe yazdeh jê dane Dehaq û mêtîyê wan bi maran daye xwarin, gava ku doza lawê wî yê dawîn (yê herî biçûk) tê kirin, êdî îşyan dike û dibêje: “êdî bes e!” Radibe pêşî xortên ku derketine çiyê birêxistin dike û pey re jî gelê welêt jî hişyar û agahdar dike. Ev mirovê berxwedêr Kawa bi xwe ye. Ango Kawayê Hesinkar e. Kawayê Hesinkar,



roja ku lawê wî yê herî biçûk hildidin û dibin ber destê Dehêq, ew jî haya gel pê dixê û horsê xwe hildide û ber bi qesrê ve dimeşe. Ji gel re dibêje: “Gava min ew kuşt, ez ê doxa horsê xwe wekî pêtalekê vêxim û di şibakeya qesrê re li ba bikim. Na, heke ku ez nikaribim tiştêkî wisa pêk bînim, jixwe dê Dehaq min û lawê min bi ser hev de bikuje û dê serweriya xwe bidomîne. Berî ku celad serê lawê wî jê bikin û mêjiyê wî bidin destê Dehaqî, Kawayê Hedad êrîşî odeya wî dike û bi horsê xwe mêjiyê Dehaq belav dike. Doxa horsê xwe wekî pêtalekê pê dixê û di pencereya odeyê re li ba dike. Gava ku Kawayê Hesinkar meşaleya xwe ya ku wekî nîşana serfiraziyê li ba dike. Gelê bajêr û xortên ku derketine çiyê, xwe li agirê pêtaleta wî digirin, dora qesrê radipêçin. Raperîna ku bi pêşengiya Kawayê Hesinkar dest pê dike bi serkeftineke mezin bi dawî dibe. Text û seraya Dehaq hildiweşe û li dewsa Dehaq, qeyzerekî bi navê Ferîdûn ku bi edaleta xwe gelekî nav û deng vedaye tê ser kar.

Îcar di ola Zerdeşt de agir tiştêkî pir pîroz e. Ji bo wê, hemû serkeftin bi agirekî gur tê pîrozkirin. Roja ku

Kawayê Hesinkar êrîşî qesra Dehaqî dike, 21'ê adarê, sala 612'an a Berî Zayînê ye. Êdî dem û domaneke nû dest pê dike. Îro li ser rûyê dinê salnameya hevpar a tekane ev e ku bihar di 21'ê adarê de dest pê dike. Ev salname di nava gel de wekî salnnameya “Horoskop” ku wekî “salnameya falan” tê zanîn e. Li gorî gotegotên dîrokî, tê gotin ku pêşmala Kawayê Hesinkar a ku ji rengê kesk û sor û zer pêk hatibû, roja 21'ê adarê li bircên seraya Dehaq pêl dide. Li gorî hin agahiyan jî ev pêşmal ji hêla Ferîdûn ve bi tasên rengîn tê xemilandin û li bircên serayê tene daleqandin. Û ev pêşmal wekî ala azadiyê, ji Mezopotamyayê heta Asyaya Navîn, wekî sembola serhildan û serxwebûna gelên Rojhilata Navîn hatiye qebûlkirin.

Îro jî dîroka mirovahî û dinê dubare dibe û gelên Rohilata Navîn li ser vê mîrateya pîroz, li hemberî dagirker û serwerên dinê, li hemberî Dehaqên hemdem têdikoşin û doza azadiyê dikudînin.



Wêne: Selmet GÜLER



Dilberê îro seher avête cergê min du dox

Melayê Cizîrî

Dilberê îro seher avête cergê min du dox
Yek li sîne yek li dil da lew ji min tên ax û ox

Ah û oxên min ji dil tên lê ji ber tîra qizil tên
Yan ji kovanên di kul tên jê dizêt her xwîn û zox

Xwîn ji dil co co rewan tê wek 'eqîq û erxewan tê
Lê ji dest selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox

Ew şepala şox û şeng e kafira rom û fireng e
Dame ber cotek xedeng e zalimê kuştim bi dox

Zalimê kuştim şepalê nazikê qencê delalê
Bûn hicaba zulf û xalê îdek û 'ala û tox

Netrik û tayên bi rîşî ê di zêr in pê ve wîşî
Min du fêris dîn di pêşî mirwet û insafî yox

Lew herifim ez ji meylê şubhetê sehlê we seylê
Muhbet û 'îşqa di Leylê ez kirim yekser pilox

Dest nehêlim ez ji dînê şubhê Ferhad û Şîrînê
Wer ji ber 'îşq û evînê min di rê çit ev kilox

Suhbeta çerx û sema tê wek Melê sed muhtela tê
Zemzem û ava heyatê muşterî sed şeyx û şox

Awaza Zozanên Elegezê
Egîte Cimo

Hevpeyvîn: Serwet DENÎZ



Egîlê Cîmo (www.pen-kurd.org)

W: Mamê Egît ji kerema xwe re tu dikarî xwe bi xwendevanên me bidî nasandin? Egîtê Cîmo kî ye û çawan dest bi hunerê kiriye?

Egîtê Cîmo: Ez di sala 1932'yan de ji dayik bûme. Kal û bavên min ji aliyê Wanê hatine. Di sala 1918'an de derbasî aliyê Ermenistanê bûne. Li wê derê jî li nehyeya Oktabiryanê gundê Erdeşerê ji dayik bûme. Di zaroktiya xwe de min gelek dengbêj, dawet, meqam û kilam guhdar kirine û jê hez kiriye. Û rojekê min ji qamişên devê Çemê Reş ji xwe re fiqek çêkir. Min êpêce lê xist. Îcar ez hatim ser banê me, banê mala me li nava gund bilind bû. Gava ez derdiketim ser ban min li fiqê dixist, gundiyan digot rabin Kejo derketiye ser ban – wê gavê ez çûr bûm- yanê min konsert dida. Qeydeyê yekemîn ku min lê xist, dibêjin; “Kura Çayê Topê Qersê” bû. Di dehsaliya xwe de min lê xist.

W: Taybetiya vî qeydeyî çî ye, çima di zaroktiya te de bala te kişandiye?

E. C: Bala min kişandiye, çunkî li gundê me ev kilam dihate gotin, dengbêjan digot. Dengbêjê gundê me hebû navê wî Ûso bû. Taydaşê min bû hema wisa di zaroktiya xwe de dest bi dengbêjiyê kiribû. Di dinyayê de hîna di ser Ûso re min dengbêj nedîne. Wisa dengêkî wî yê qudretî hebû. Ew jî wisa cahil cahil çû rehma Xwedê qet nezewicî jî. Wexta Ûso wisa kilam digot em bi hev re diçûn îşxolê. Gramafon hîna nû derketibû, li îşxolê dianîn nişanî zarokan didan, me digot na, gramafon ne lazim e bila Ûso bistirê

W: Ûso ji wê baştir distiriya ne?

E. C: Erê çawa!

W: We ev huner çawa bi pêş xist, hûn çawa bi pêş ketin?

E. C: Pêşketina min wiha bû; di gundê me de gelek dawet çêdibûn, gelek sazband dihatin û diçûn, me jî dibihîst. Ez jî heweskar bûm, min li sazbandan, dengbêjan dipirsî. Yek hebû navê wî Şamilê Beko bû, di wê hîne de emrê wî heştê, nod sal bû. Wî tevî du kur û du qîzên xwe komek çêkiribû. Bi koma xwe ve sazbandî dikir. Li meyê, bilûrê û fiqê dixist. Nav û dengê wî hebû, diçû gundan konser didan. Hat gundê me konserê. Ez jî çûm cem wî. Ez çardeh pazdeh salî hebûm. Gundiyan gotine xortekî me yê delal heye, ew jî sazbandiyê dike. Ew çend sal bûn ez jî diçûm dawetan. Bawer bikî ez jî êdî sazband bûm. Şamilê Beko ji wan re dibêje bila bê ez bibînim. Xulasa min qeydeyek dudu lê xistin. Got ji îro şûn de tu tevî koma min î. Îcar ez jî çûm tevî koma wî bûm. Çend salan tevî koma wî geriyam. Heta ku Radyoya Erîvanê vebû, di sala 1955'an de vebû. Wê hîne berpirsiyarê radyoyê Casimê Celîl bû, wî ez teklîfî ber radyoyê kirim –heta wê gavê êdî ez hatibûm naskirin- got; gere tu bîyî em bi hev re kar bikin, şuxla sazbandî û dengbêjiyê teşkil bikî. Gere tu wan bînî em di radyoyê de binivîsin ji bo ku winda nebin. Ez diçûm li gundan, çiyayan heta zozanan digeriyam. Min li her derê li dengbêjan, bilûrvanan û sazbandan dipirsiya da ku bînim dengê wan qeyd bikim.

Wisa jî min didîtînan dianîn radyoyê û hazir dikir. Casimê Celîl li studyoyê dengê wan hildida.

W: Pîvanên we çi bûn li gora çi we ew dengbêj hildibijartin?

E. C: Kîjan kilam ji bo me rind bûn me ew hildibijart. Ji bona me tevan radyo tiştêkî mezin bû. Eger dengê min bikeve radyoyê, radyo dengê min bide, ev ji bona dengbêjan serbilindî bû. Em dibêjin hunermendiya dengbêjan, bi zemanan, bi qîrnan heta roja me hatiye, divê wînda nebe. Divê em têxin fonda zêrîn, ji bo ku bimînin ew neyêne jibîrkirin. Dengbêjên wek Şeroyê Biro, Kerapêtê Xeco ku bimirina wê ew tişt tev bi xwe re bibirina. Em wisa bikin ku wan berhemên xwe ji mirinê xelas bikin. Di koma radyoyê de ji vî karî re dibêjin 'fonda zêrîn'. Asil gaye ew bû ku wînda nebe.

W: Gelek kes hene, ji xwe re dibêjin dengbêj. Her kesê/a ku disitirîya yan jî sazbandî dikir, we dengê her kesî digirt, an we digot viya baştir e, viya xerabtir e?

E.C.: Na na, ew kes min hildibijart. Ez diçûme gundan, çiya û zozanan. Min ji nav wan hildibijart; tenê kîjan dengbêj e, kîjan bi marîfet disitirê. Îca ez jî hinekî li ser wî dixebitîm, min hazir dikir, dida radyoyê.



Egîdê Cîmo (Wêne: İrfan UÇAR)

W: Ew xebata we ya radyoyê xebateke berbiçav e û kedeke mezin e. Wê xebata we ya radyoyê çiqasî domand û we çiqas berhem berhev kirin?

E.C.: Weke 30 salî zêdetir e min li radyoyê kar kir. Ê min karê min ew bû ku ez herim mehê çend kilam li ser min danîbin: em bêjin mehê sî kilam, bîst kilam, miqam, gere min binivîsiya. Îcar komîsyona me hebû. Ji şeş, heft kesan pêk dihat. Wê komîsyonê kilam û miqam guhdar dikirin, ji wan kîjan begen bikirina me ji bona fondê. Me ew davêtin ser fonda zêrîn.

Heke niha tu dipirsî ew fonda zêrîn çiqas heye, ew ji sê hezaran zêdetir e. Ez bibêjim belkî sê hezar û pêncsed kilam, miqam, kompozîsyon, kompozîsyonê tiyatroyê, cureya kompozîsyona gel hatine nivîsandin, gelek tiştên baş hatine kirin. Mem û Zîn hatiye nivîsandin, Ker û Kulik hatiye nivîsandin. Me ew kompozîsyon tev qedandine, wek tiyatroyê nivîsandine. Weke sê hezar, sê hezar û pêncsed berhem hatine nivîsandin.

W: Kê ew kompozîsyon çêdikirin?

E.C.: Ew kompozîsyon rêjîsorekî ermenî hebû, jê re digotin Solad Nikolxosyan, wî amade dikir. Hostayê tiyatroyê bû. Wextê tiyatroya Elegezê hebû, tiyatroya dewletê bû lê giş bi kurdî bû. Wî Solad Nikolxosyan ew tiyatroya hazir kiribû. Li cem me ew cureyê kompozîsyona tiyatroyê wî hazir dikir. Artîstî me dikir, xebat jî me dikir, li derve çi marîfeta kê ya tiyatroyê hebûya li radyoyê dihatin komkirin. Me dicêriband yê ku dikaribûn me bi wan ew kompozîsyon dikir tiyatroyê. Lê ew Solad Nikolxosyan rêjîsorekî gelek bi marîfet bû. Ew di dereceya ruhê kurmanciyê de, ruhê kurdîtiyê de gelek nas bû, ew kompozîsyon wî hazir dikirin.

W: Piştî ku we dest bi karê radyoyê kir, hûn paşê çûn kolejê ne wisa?

E. C: Koma radyoyê ya deng hebû. 30, 40 kesî di wê komê de cî digirt. Ji berpirsiyarên wê yek jê Aram Mîrangulyan bû. Wî ji min re got ez ê çend kesan bidime te, tu yê herî koleja sazbandiyê ya bi navê Romanos Melîkyan. Ya bi roj jî hebû ya şevê jî hebû. Ya rojê 4 sal a şevê 5 sal bû, Nikolay Boxosyan ji min re got li wê derê dostê min jî hene, yê Aram Mîrangulyan jî, wê ji te re bibin alîkar. Tu ji xwe re hînî sazbandiyê bibe, ji te re lazim e. Bi komekdariya wan her du camêran ez çûm Koleja Romanos Melîkyanê. Di serî de min

li fiqê, meyê, zirneyê û bilûrê xist, roja pêşîn min 5 stend. Wan jî got ev mirov ji me re lazim e. Di beşa fiq, zirne û meyê de mamoste jî tune bûn û gotin vana ji bo xwendina 5 salan têr nakin, divê tu enstrûmaneke din hilbijêrî. Yê ku mirov pif dikê yê wek seksafon, tulumbe, klarnêt û haboy hebûn. Ji min re gotin tu ji vana kîjanî dixwazî hilbijêre, divê tu li ser vana yekê kolejê biqedînî. Haboy û klarnêt hebûn. Diviya ku min ji van her duyan yek hilbijarta. Min haboy hilbijart. Di senfoniye de du haboy hene. Dengê wê nêzî dengê zirneyê ye. Dengê zirav ê pir xweş e. Lêdana wê pir çetîn e. Lê klarnêt pir hêsa ye. Min ew qebûl kir, ez li ser wê hîn bûm. Pênc sal min li ser wê xilas kir, piştî min xilas kir min danî malê, heta niha jî wisa didome. Mecalî min tune bû, ku hebûya min dikaribû herim di senfonîk orkestraya ermeniyî de, yan di ya rûsan de, yan jî di ya eskeriyê de lêxim. Min haboy xilas kiribû, dikaribûm rûnê min bi notayê bixebitîm.

W: Çima tu neçûyî?

E.C.: Wê çaxê ez di kirê de dimam, zarokên min hûr bûn, meaşê min jî hindik bû. Ez fikirîm min got ez mecbûr im ku ez herim dawetan jî. Yan na min nikaribû ez zarokên xwe xwedî bikim. Yan na mirov hebûn digotin were em komekdariyê bidine te, here di konservatûarê de bixwîne. Hînûnên te hene, tu dikarî bigihîjî dereceya kompozîtoriyê. Ez çûm heta ber derê konservatûarê, lê careke din ez fikirîm min got ez ê niha çawa pênc salan zarokên xwe xwey bikim. Ez di halekî çetîn de bûm, zarokên min hûr bûn. Di kirê de dimînîm, meaşê min hindik, zarokên min hûr in, heke ez neçim dawetan ez nikarim wan xwedî bikim. A wisa ez paş de vegeriya hatim. Neçûm dereceya konservatûarê. Ez çûm dawet mawetan. Kaset û filan û karê radyoyê heta niha wisa hat.

W: Wek kom heta niha tu û kê bi hev re xebitîne?

E.C.: Şamilê Beko jixwe min gotibû, Kerapê Xaco, Sûsika Simo, Berga Qado, me grûb çêdikir, em tev de diçûn konsêrtan, bajarê Tilbîsê. Min komek hazir kiribû. Koma Mala Kulturê ya Heştan. Dîrektorê Mala Kulturê yekî azerî yê bi navê Aşdarov bû. Me komeke kurdî çêkir; koma kilam û reqasê bû. Wê koma min gelek nav û deng da. Me her yekî spasname stendin, ya min jî başqe dan min. Carcaran jî festîvalên ermeniyî li dar diketin, em beşdarî wan dibûn. Em hem di

nava kurdan de, hem jî di nava ermeniyî de komeke pêşdehatî bûn. Gelek nivîsên xweş li ser me dihatin nivîsandin.

W: Kî hebûn di wê koma we de, niha tê bîra te?

E.C.: Erê tê bîra min; yê reqasê hebûn, Memo, Ando hebû, Xelîlê Evdile hingê sazband bû, teze dest pê kiribû. Xelîlê Evdile, min ew dianî dikir boçikê, ji ber ku bejna wî kin bû, rind direqisî. Çend keçikên me hebûn; Çîço, Zeytûn û yê din, nav nayên bîra min. Îca defçiyê me jî hebû; Mosko. Defeke rind lê dixist. Otobêseke me ya ku em pê li gundan digeriyan hebû. Hem li defê dixist, hem jî şofêrê koma me bû. Wê komê qasî du salan domand. Komeke xweafirandinê bû, ne

ÇIROKA QEYDÊ NÊRÎ

Di gundekî de axa hebû û xortekî delal ê gelek feqîr hebû. Navê wî Heso bû, navê qîza axê jî Zelxê bû. Heso dil dikeve Zelxê. Zelxê jî dikeve Heso. Cimaet jê re dibêje here cem axê, belkî Zelxê bide te. Heso diçe cem axê, dibêje axa ez dil ketime qîza te, tu gere qîza xwe bidî min. Axa dibêje Heso ev dereceyê mayîn e, ez dewletî me, tu kesîb î, ez qîza xwe nadime kesîban. Were ez pirsekê bidime pêşiya te; tu were heft salan bibe şivanê pezê min, here ber pezê min, ez ê Zelxê bidime te. Ew jî dibêje serçavan. Ji bo xatirê Zelxê heft salan na, pêncî salan jî ez dikarim bikim. Ew diçe ber pezê axê. Lê ji xwe re li bilûrê dixê, bilûreke zor lê dixê. Ji xwe re li ser kevirekî rûdinê, qeydê avdanê lê dixê. Pez diçe ser avê. Di nav pez de nêriyê kever heye, ew hînî meqamê wî bûye. Nêrî dide pêşiyê diçe ser avê, pez avê dixwe. Pezê xwe hînî qeydê mexelê, mozelanê dike. Ew meqaman pez dizane. Bi wî awayî heft salan şivaniya axê dike.

Heft sal bi şûn de tê cem axê. Dibêje axa min ew jî qedand, niha tu gereke êdî Zelxê bidî min. Dibêje Heso rast e. Min bihîstiyê te dereceya xwe derbas kiriye, lê min bihîstiyê tu bilûreke rind lê dixî. Te bi vê bilûrê pezê min çêrandiyê. Dibêje ez ê tişteki din jî bidim pêşiya te. Ez ê sêsed û şêst û şeş pêlikan çêkim. Min bihîstiyê ku tu bi miqamê bilûra xwe çî bixwazî dikarî bikî. Tu yê li jorê rûnêyî, bilûra xwe lêxî, heke te pez helkişand jor û ew paşê di wan pêlikan de şûn ev peya kir, bi qîrarê Xwedê be ez ê Zelxê bidime te. Heso dibêje serçavan. Heso jî xwe bawer e û bi bilûra xwe jî bawer e, bi nêriyê kever jî bawer e. Sêsed û şêst û şeş pêlikan çêdike, Heso diçe li jorê ban rûdinê. Axa û qîza xwe jî li ser birca kelê, li kêleka hev rûdinên, cimaet jî tev hazir e. Heso li bilûra xwe dixê, qeydê nêrî lê dixê. Nêrî dide pêşiya pêz, tê heta nivî. Çima tu nabêjî axê qelpî kiriye pêlika navîn, baş bizmar nekiriye, sist lê xistiye. Ji bo ku çawan lingê xwe bavêjin û bikevin. Bikevin, da ku qîza xwe nede Heso. Nêrî gava ku tê nivê pêlikan çawan piyê xwe davê ser pêlika sist, jor de dikeve. Ku nêrî dikeve pezê din jî hema kîjan tê û li dû nêrî xwe davêje. Zelxê jî jor ve gazî dike, dibêje Heso ya em ji erdê re ne, yan jî em ji hev re ne. Dixwaze bibêje ku ev kar neçe serî ez û te em ê xwe jor de bavêjin. Wiha sed, dused pez jor de dikevin û Heso û Zelxê xwe jor de davêjin. Di nava hewayê de winda dibin, nagihêne erdê. Çawa dibêjin; ew heskirina wan qudretî bûye. Axa jî dibîne ku şuxlekî xerab kiriye poşman dibe, êdî dereng e. Çiroka Qeydê Nêrî bi vî awayî ye. (Ji miqamê hinekî lê dixê)

Kerapêtê Xaço



resmî bû. Cahil ji eşqê hev re tîn, paşê jî zû belav dibe.

W: Tu bi Şeroyê Biro û Kerapêtê Xaço re çiqas xebitî?

E.C.: Em û Şeroyê Biro li Tilbîsê, li Ermenistanê, li zozanê çiyayê Axmîxanê, em diçûne dawetan. Kerapêtê Xaço jî di koma me ya kurdî ya Ermenistanê de bû. Di wê komê de nîvê kar li ser min bû. Nîvê dinê li ser Sûsika Simo bû. Solîsta komê ew bû. Karê sazbandî û kilamhazirkirinê min pêk dianî.

W: Tu dikarî ji me re bibêjî daweteke kurdan li zozanan çawan li dar diket?

E.C.: Dawetên zozanan zehf xweş çêdibûn. Wisa bû ku sazbandan li ber xwe nedidan. Mirovên zozanan pir bi eşq bûn. Mecîdê Faris (rehma Xwedê lê be) di gelek dawetên wê hingê de serdawetî bû. Henekên zaf çetîn dikirin, kesek jê nedixeyîdî.

W: Kîjan cureyên govendê hebûn?

E.C.: Govendên me yên kurmançî; destpêk ji qaydê giranî bigir, Zîlo, Sekme, Şûro, govenda heta giran. Reqasa sivik, çawan dibêjin; Pilingê Ecemî, Zîlfanî, yên cure bi cure hebûn. Li zozanan gava ku eşqa wan dihat heta sibê dilîstin.

W: Di nav cimaeta kurdan de rewşa dengbêjên jin çawan bû? We qala Sûsika Simo kir, beriya wê jî em dizanin di nav kurdan de dengbêjên jin hene. Rewşa wan çawan bû, dikaribûn bi serbestî dengbêjiya xwe bikin?

E.C.: Berê ew di dawetan de distiriyân, nedîçûn ser dikan. Rêya dikê Sûsika Simo vekir. Sûsika Simo dest pê kir, Berga Qado jî hat kêleka wê û me kom çêkir. Wê gavê Şamilê Beko hingê sax bû, me tevî hev kom ava kir. Me komeke wisa ava kir ku dixwestin bikin koma dewletê. Lê nebû. Kêmasiyên me yên musikayê hebûn. Me tenê def, mey, fîq lê dixist. Ji bo ku bibûya koma dewletê dibûya ku me ûd, kanûn û enstrûmentê cimaetê têkîra navê. Hingê koma me yê pêş de biçûya. Paşê em negihîştin vê dereceyê. Koma me wek koma xweafirandinê hesab kirin. Em hinekî bi hev re geriyan. Sûsika Simo û Şamilê Beko li hev nedikirin.

W: Çima gelo?

E.C.: Şamilê Beko şêx bû, Sûsika Simo murîd bû. Yanê digot ez şêx im, tu murîd î, çawan tu hatî me hîn biki? Sûsikê digot em wiha bikin, wiha bikin. Digot na, tu kî yî, wiha li ser min xeber didî! Demeke ne dirêj wê komê dewam kir. Paşê Şamilê Beko, komeke wî ya din hebû, ew çû. Lê ez û Sûsika Simo bi hev re man, Kerapêtê Xaço jî êdî dengê wî li nav cimaetê belav bûbû. Ew jî, Berga Qado jî me hilda. Me hinekî koma xwe bedew kir. Em çûne bajarê

W: Bîranîneke te ya ku her tim tê bîra te heye gelo?

E.C.: Di zaroktiya min de meseleyên biçûk çêbûne. Çawa gur ketine nav berxên min. Ez deh dozdeh salî bûm, li ber berxên xwe bûm. Payîz bû, hewa xweş bû. Min xwe dirêj kir. Di xew re çûm. Wextekî min dît wa ye qirte qirt ket nav berxên min. Ez şiyar bûm, min dît wa ye çend kûçik ketine nava berxên min. Ser serê min re gav didin wiha diçin. Min ji xwe re got ev kûçik ji ku de ketine nava berxên min, çima wisa dikin? Dîtina ku min dît hoo xwîn rijiyaye, çend berx ketine, yek hildane nav xwe, wisa direvin diçin. Ji min tirê ku kûçik in. Paşê min fam kir peyy evana gur in. Ez derketim hemberî gund, min kire qareqar, min got gur ketine nav berxên min, tamam kuştin, tamam birin. Îca ez hatime malê, bavê min got berx bi qurbana te bin, çawa tu nebirine. Ez viya ji bîr nakim.

Tilbisê me konsêrt da. Çend caran jî li nav Ermenistanê me konsêrt da, ew jî zaf dirêj nebû.

W: Tu û Casimê Celîl çend salan bi hev re xebitîn?

E.C.: Heft, heşt salan em bi hev re xebitîn. Paşê Xelîl Mûradov hat şûna wî. Ji ber ku sazbandî nexwendibû û destûrnameya wî tune bû jê re gotin tu êdî nikarî vî karî bikî. Paşê Nûra Cewahirê hat, piştî wê jî Tîtal Dewrêşyan hat. Paşê jî qîza Casim, Cemîlayê konservatûar xelas kir, ew bû redaktora radyoyê. Nûra Cewahirê her tim jî min re digot vira ne ciyê Casim e, ne jî ciyê min û Cemîlayê ye. Gere tu li vir bî, ez herim akademiye dersê bidim. Piştî ku Cemîla Celîl hat, ez jî ji wê hêrs bûm û derketim.

W: Pêşketinên kurdên Ermenistanê di salên piştî 1920'î dest pê dikin. Mesela dibistanên vekirin, alfabe çêdibe, pirtûkên weşandin, rojname (Riya Teze) dertê. Wê demê jî ez bawer dikim weşana radyoyê heye. Wê demê jî ev kilam û dengbêjî qeyd kirine yan na? Beriya 1955'an tiştekî wisa hatiye kirin an na?

E.C.: Beriya 1955'an di sala 1931'an jî 1932'yan de rojê 5 deqîqe weşana radyoyê hebûye. Jina Heciyê Cindî, diktir bûye, wê xwendiyê. Heciyê Cindî û jina xwe 5 deqîqe tenê nûçe dane. 4, 5 salan dewam kiriye, paşê dîsa temiriye. Di 1955'an de radyoyê dîsa dest bi weşanê kiriye; rojê 15 deqîqe.

W: Karên çandî nekirine ne wisa?

E.C.: Na, na karên çandî tune bûne, tenê nûçe bûne. Paşê gava di 1955'an de dest pê kir rojê pazdeh deqîqe, ne her roj. Heftê 2 roj 3 roj. Paşê hêdî hêdî bû niv saet. Paşê jî bû saetek.

W: Ji aliyê çand û hunerê ve têkiliya me û cîranên me çawan e? Me bandoreke çawan li ser hev kiriye, me çi jî hev stendiyê û daye hev?

E.C.: Ermeniyên nivê zaf kilamên me kirine yê xwe. Mesela Koçerî, wana ne dizanin bilîzin, ne jî dizanin rast lêxin. Niha dibêjin Koçerî ya me ye (*her du meqam jî bi bilûrê da guhdarîkirin*). Ji Keleşo bigire heta Ximximê, lo nizamî kîjanî tev kirine yê xwe. Heke du millet di nav hev de bijîn esê jî hev digirin. Ez viya nabêjim. Ev tiştekî normal e. Lê bila bibêje eviya ya kurdî ye, eviya jî ya ermenî ye. Mesela xeberê ermeniyên Sasonê hene. Ew a ku em jê re dibêjin Çepik, ew dibêjin Yarguşî. Kilama me ye, kirine ya xwe (*Dîsa bi bilûrê nîşan dide*). Bi qasî mehekê berê me li cihekî konsert da. Wan jî ev kilam hazir kiribû, me jî hazir kiribû. Lê çaxê ku me lêxist, a me jî ya wan baştir bû. Me da kifşê ku vêya ya me ye, ne ya wan e.

W: Li Tirkîyeyê jî wisan e, li derên din jî wisan e.



Súsika Simo di sala 1977'an de mir, 52 salî bû.

Çand û hunera me tê talankirin. Em ê pêşiya vê yekê çawan bigirin?

E.C.: Carekê kompozîtorekî ermenî got (mêrik mirovekî helalî zelal bû) gava ku hûn kilamên kurdan hildidin, hûn dibêjin ku ew jî me bilindtir in. Herin ên xwe çêbikin, hûn çima yê milletên din digirin?

W: Ji bo te qeydeyê dengbêjiya kurdî yê herî xweş kîjan e?

E.C.: Bêrîvanê ye, Hekîmo ye. Gelek kilamên din jî hene. Lê ya sereke Bêrîvanê ye. Efoyê Esed bê muzîk jî gotiye, bi muzîkê jî gotiye -min lê xistiye. Lê ji ya bê muzîk zêdetir hez dikim.

W: Gotineke te heye. Tu dibêji hinek mirov bi lingên xwe, hinek mirov jî bi ruhê xwe dikevin nav hunerê. Tu dikarî vê gotina xwe hinekî vekî?

E.C.: Ez dîsa dibêjim; hinek mirov bi ruhê xwe ve dikevin nav hunerê, wek Rizoyê Feyzo, va ye li ba me ye. Ez dibînim ku ew bi ruhê xwe ve dikeve nava hunerê. Lê mirov jî hene ku di dereceyê wisa de ne ku ne bi rabûn rûniştin, ne jî bi şîn û şahiyên gelê xwe dizanin. Hema jî xwe re wisa distirên. Ew ên wisan bi

lingê xwe ve dikevin nava hunerê. Li gor ruhê miletê xwe nabêjin.

W: Gotina te ji bo wan çi ye? Divê çi bikin?

E.C.: Gere wana pêş de hunermendiyê nekin. Hunermend, gere ji rîtmê fam bike (*W-bi tiliyên xwe li maseyê dide û nîşan dide*).

W: Egîtê Cimo niha bîst salî bûya, wê bixwesta çi bikira?

E.C.: Qet nedixwest tiştekî bike, ji xeynî hunermendiyê, sazbandiyê. Ew di ruhê min de heye, gere heta dawîya emrê min wisa be.

W: Tiştê ku tu yê bibêjî viya kêma, xweziya min viya jî li karê xwe zêde bikira heye gelo?

E.C.: Xweziya min ew e ku pêş de tiyatroya me hebûya, wek tiyatroya dewletê, wek tiyatroya profesyonel. Tiyatro ji bo min dereceya herî jor e. Rabûn û rûniştina miletê te tiyatroya xwedî dike. Paşê xwestina min weke senfonîk orkestraya me hebe. Operaya me hebe, lê ew jî gere dewlet hebe ku ew jî hebin.

W: Wek gotina dawî tu dixwazî çi bibêjî?

E.C.: Ez terefteharê aştiyê me. Eger aşti çêbibe li her çar perçê Kurdistanê, cîrantiya tirkên û kurdan, heta li nav Tirkîyeyê sî milyon kurd hene. Gere bi birati bijîn. Malêk du mal nîn in ku bi dereke din ve herin. Bira dikare ji bira cihê bibe, xwişk dikare ji xwişkê cihê bibe. Lê ev tiştekî wisa nîn e. Em nikarin mala xwe li pişt kin, herin li cihêkî din deynin. Di kilamên me de dibêje, milet hemû bira ne, ez jî terefteharê aştiyê me. Divê em di nav aştiyê de bi hev re bijîn. Bila hêstir ji çavên dayikan neyên.

W: Ji bo hunermend, sazband û kesên ku li ser çandê kar dikin gotina te çi ye, dixwazî çi bikin?

E.C.: Çanda me gelek dewlemend e, bi salan, bi zemanan hatiye, heta gihîştîye cem me. Gere bê çêkirin, bi profesyonelî xebat li ser bê kirin. Gelek pêşketin hene. Lê dîsa jî gere bîn başkirin, bîn hilûkirin. Gere mecal jî hebin, ev ne şuxlên roja ne. Şuxlên salan in. Di nav ceribandîna de mirov diafirîne.

W: Sax bî, mala te ava.

E.C.: Mala we jî ava.

EVDALE ZEYNIKÊ Û ŞÊX SILÊ

W: Tu dikarî ji kerema xwe re qala Evdalê Zeynikê bikî? Di dengbêjiya kurdî de xwediyê cihêkî cihê ye.

E.C.: Evdalê Zeynê dengbêjê Surmeli Memed Paşa bûye. Surmeli Memed Paşa ew di ser xwe re girtiye. Dengbêjekî din hebûye, jê re gotine Şêx Silê. Ji aliyê Îranê ye. Payîz bûye, Şêx Silê li ser benderê genimê xwe dikute, ji xwe re hêdika distirê. Wê hingê bazirgan hebûne. Bazirganek di wê re derbas dibe, ji nîşka ve ew kilam dikeve guhê bazirganbaşî. Tê nêzî wî jê re dibêje camêr qey tu nebûyî Evdalê Zeynê tu wisa distirêyî. Şêx Silê vediciniqe, dibêje Evdalê Zeynikê kî ye? Dibêje Evdalê Zeynê dengbêjê Surmeli Memed Paşa ye. Te hay jê tune ye, dengbêjekî zef mezin e. Tu jî kilaman dibêjî, tu jî dengbêjekî baş î. Ji ser kamê (bender) peya dibe tê mala xwe. Bazirganbaşî diçe. Ji pîreka xwe re dibêje zû kinc mincên min hazir bike ez ê herim. Dibêje tu yê ku de herî? Dibêje ez ê herim, dengbêjek heye, dengbêjê Surmeli Memed Paşa ye, jê re dibêjin Evdalê Zeynikê, li filan derê ye. Ez ê herim wî bibînim. Kinc mincê wî dadigire, hûr mûrî wî dike tevî hev û dide piştî xwe û diçe. Tê cihê ku Surmeli Memed Paşa lê ye. Tê li nava cimaetê rûdinê, piştî nanxwarinê Surmeli Memed Paşa jê dipirse dibêje xortê delal, tu kî yî, ji ku de têyî, tu yê ku de herî? Ez hatime dengê Evdalê Zeynikê bibihîzim, dibêjin dengbêjekî gelekî bi marîfet e, gelo wê kîngê bistrê? Dibêjin vê êvarê wê cimaet kom bibe û ew ê bistrê, tu yê dengê wî bibihîzî.

Dibe êvar, cimaet kom dibe, dibêje ez jî dengbêj im, ez jî dixwazim bi Evdalê Zeynikê re kilaman bibêjim. Ew û Evdalê Zeynikê dikevine lecê. Leca wan sê şev û sê rojan didome. Dengê Şêx Silê bilind bûye, dengê Evdalê Zeynikê hinekî nizim bûye. Wexta ku Evdalê Zeynikê dixwaze dengê xwe bilind bike zorê dide xwe. Ji ber zorbûna kilamê çavên wî kor dibin. Bi vî awayî Evdalê Zeynikê ji kerba kor dibe. Şêx Silê jî lê dixê diçe. Evdalê Zeynê paşê ji xwe re qulingekî li çolê dibîne tîne tê. Temo jî zarokekî êtîm bûye, aniye ji xwe re xweyî kiriye. Xulamê wî bûye, ne kurê wî yê helal e. Paşê kilaman davêje ser quling û Temo. Quling jî baskê wî şkestiye ji refê xwe maye. Diçe ser dixtorê Hebeş e, nizanim çiyê. Paşê çavên wî jî silamet dibin.

W: Bi rastî jî bi Gulê re dizewice?

E.C.: Na, Gulê ne xanima wî bûye. Gulê ne kurd e, ermenî ye. Gulê jî dengbêj bûye, dengê wê gelek xweş bûye. Kilam avêtine ber hev.

W: Dengbêjên ku dane dû şopa Evdalê Zeynikê jî hebûne.

E.C.: Rast e, şagirdên wî jî hebûne, heta wan salên dawiyê jî hebûn. Çûne rehma Xwedê. Reso, Ferzê (Ferzê di dawetê de tê kuştin) hebû. Her du jî ji aliyê Serhedê bûne. Ew kilamên Evdalê Zeynikê wana paşê dewam kirine.

W: Evdalê Zeynê çima di nav civatê de ew qas cî girtiye?

E.C.: Dengê wî, afirandinên wî, derecên wî temam zor bûne loma jî cî girtiye.

Rexne

Aram GERNAS

Rexne yan krîtîk, analîz û şîrovekirina nivîsên edebî ye. Gevilê xwendineke baldar, têgihîştin û nîrxandinê ye. Nivîsara ku berhemeke ramanbar rave dike, avahiya wê şîrove dike, aliyên wê yên hêja û nehêja nîşan dide, werçerxîna ramanî ya civata ku berhem lê hatiye afirandin destnîşan dike û vî karî bi mînak cih bi cih dike.

Nivîskarek bi hunera vegotin û nivîsînê ramanên xwe, hizrên xwe û fantazyên xwe pêşkêşî xwendevanan dike. Kare li ser bûyereke qewimandî; bûyereke neqewimandî; çîrokek ji ber xwe va çêkirî; propagandaya îdeolojiyê û hwd. be. Her wisa nivîskar kare çîroka xwe li ser derewan, li ser bûyerên xeyalî jî ava bike û bi hostatiya pêşkêşiyê, hunera lihevanî û çîroksaziyê li ba xwendevanan baweriyê çêbike. Wek ku bi rastî bûyereke weha qewimî be. Bizanibin ku nivîskar hay ji rexnegiran heye û hemû hostatî û hunera edebî bi kar tîne da ku roman an çîroka xwe bide xwendin, hezkirin û pêbawerkerin. Baş e, wê binyata vê çîrokê, rastî û nerastiya wê, hunera wê ya edebî çawa bête deşîfrekirin? Em nivîskar nas nakin û nikarin wî/wê bibînin û bidin ber pirsan. Kilîta deşîfrekirinê çi ye? Bêguman ziman e. Nivîskar kare bi peyvan bilîze, wana bi hostatî li hev bîne, kiras û maneyan li wan bar bike, ji bo îknakirin û xweşkirinê hunereke mezin nîşan bide û xwendevanan hîpnotîze bike lê hemû karên han bi zimanekî tîn pêşkêşkin. Eger zimanê nivîskar, şêweya bikaranîn û lihevanîna wî baş bête têgihîştin, wê çîroka nivîskar rastir bête deşîfrekirin. Deşîfrekirin û analîz jî, karê rexnegiran e.

Erkên Rexneyê

Di dîroka wêjeyê da rola ku rexneyê daye ser

milên xwe, cih û girîngiya wê baş nîşan dide. Bi saya rexneyê kevn û nû, baş û xirab, pîvan û bêpîvanî, huner û rijîfî, wêjeyî û newêjeyî, hostatî û nehostatî û hwd. zelal dibe. Meydana bezê ya pênivîsa rexnegiran, jiyana wêjeyî ya kevn, nû û rojane ye; êkolên kevn û nû ye; nivîskarên kevn û nû û werçerxîna wêjeyê ye. Rexnegir him li ser berhemên kevn him jî li ser yên nû rexne û şîroveyên xwe dîkin. Di her rexne û analîzê de asoyên nû, ramanên nû, şîrove û teknîkên nû derdixin meydanê. Di deşîfrekirina ziman û mesajên berhemê de huner û taktîkên nû diafirînin. Bi vî awayî, xwendevan di der heqa berhemê de dibin xwedî agahiyeke pîralî.

Yek ji wan erkên rexnegiriyê, sazkirina pîrekê ye di navbera nivîskar û xwendevan de, vekirina rêyek e bo rêzdariya nivîskar an berhemdar. Ev jî, bi rexne û şîroveyeke dagirtî û wêjeyî çêdibe û kare hin nîrxên bilind, pîvanên bi sewiyê biafirîne.

Rexne ne lêgerîna xetayan e. Ew, lêgerîna hunera wêjeyî, estetîk û teknîka wê, ziman û şîfreyan, wêjeyî û newêjeyiya wê, destnîşankirina rê û metodên berhemdar, mesaj û bangên wê ye. Ango ji bo rexnegir jî, çarçoveyeke analîzê heye û armanc ne lêgerîna xetayan e. Armanc xeta û rastiyên vegotina berhemê ye û ev jî di nivîsarê de gav bi gav hatiye pêşkêşkirin.

Di rexneyê de helwest

Nasandinek bi çend gotinên gilover, analîzek kurtebir û ser re ne xwedî maneyekê ye û tişteki nade xwendevan. Her wisa nasandin û analîzeke alîgir û pesindar jî ne metodeke bi kêr û wênekêş e, xizmetê ji edebiyatê re nake lê belkî dilê nivîskar xweş dike, xizmeta dostaniyeke kesayetî dike. Analîzek weha jî, nakeve axa rexnegiriyê edebî.

Berevajî wê rexnegiriyeke alîgir û pesindar, rexnegiriya bi dijminahî ye. Ango rexnegir nikare li gor karakter, şexsiyet, başî û xirabî, îdeoloji û heziyên nivîskar rexnegiriyê bike û bi hinceta krîtîka berhemê yekser berhemdar bike hedefa tîrên neyartiya xwe. Bi renekî din, ji ber ku rexnegir ji nivîskarekî/ê hez dike û eynî îdeolojiyê parve dike nikare bêje ev berhem baş e. Berevajiyê wê, ji ber ku jê hez nake û îdeolojiya wî/wê parve nake nikare berhemê xirab jî nîşan bide. Di ilmê rexnegiriyê de kêfîyeteke weha tune ye. Hedefa rexnegir ne nivîskar an berhemdar bi xwe ye. Hedef berhem e.

Nivîskarek li gor kêfa xwe, li gor hez û daxwaza xwe çî bixwaze kare binivîse. Piştî ku çîrokê temam bû û wek pirtûk hate weşandin û gihîşt destê xwendevanan an jî rexnegiran, êdî bervêderê rexnegir berhem bi xwe ye. Krîtîkên rexnegir an xwendevanan li ser berhemê, zimanê wê û hunera wê ye.

Di şîrovekirin û krîtîkan de rexnegir ne xwedî mafê rexneyên serbest û kêfî ye. Lewra krîtîkên kêfî ji pîvanên rexnegiriyê dertên û berê rexnegir didin şîrovekirineke şaş. Rexnegiriyek bi pîvan, ji têngiştina çîrokê, analîza ziman û gotinên berhemê û béguman analîza hunera edebî pêk tê. Ev çarçoveya rexnegir e. Eger rexnegir ji çarçoveya krîtîkên edebî derê, wê hingê serbestiyeke bêpîvan û kêfî dertê holê.

Ziman û çîroka rexnegir

Di rexnegiriyê de pirsgerêkek din jî, helwesta rexnegir û zimanê wî/wê ye. Ango rexnegir dixwaze ku nivîskar wek wî/wê bifikire, wek wî/wê binivîse, peyvên ku rexnegir hildibijêre bi kar bîne, zimanê xwe li gor rexnegir li hev bîne yan jî devoka rexnegir bi kar bîne. Di dinyayê de rexnegiriyeke weha ecêb û bêpîvan tune û tu kes nikare bi navê rexnegiriyê zimanê xwe li ser nivîskar ferz bike.

Rexnegiriyeke ecêb jî, ferzkirina çîroka rexnegir e li ser nivîskar. Ango bi navê krîtîka edebî, rexnegir mudaxeleya çîrokê dike, li gor kêfa xwe çîrokê diguherîne yan li hev tîne, aqil dide nivîskar û ji ber van helwestên xwe êrîşî nivîskar dike. Divê bête zanîn ku nivîskar ji bo çîroka xwe û zimanê wê destûrê ji kesî naxwaze. Kêfa wî çawa

bixwaze wê wisa jî binivîse. Karê rexnegir nîrxandinên edebî ne ku ew jî di nivîsarê de hatiye pêşkêşkirin. Dêlva ku rexnegir ziman an devoka xwe li ser berhemdar ferz bike, kare li ser teknîk, rastnivîsîn û herikbariya ziman rexneyên xwe bike. Dêlva ku çîroka xwe li ser nivîskar ferz bike, kare li ser çîrok, lihevanîn, estetîk, honandin, mijar û teknîka çîrokê krîtîkên xwe bêje.

Rexnegiriya alîgir an dijminane

Di rexneyê de cih ji bo pesinên alîgir û çêrên dijminane tune ye. Ji ber ku *“Rengdêr, sirf bi taybetmendiya xwe ya teswîrê dilreşkir e”*. -R. Barthes- Béguman di pîvaneke edebî de rexnegir karin hizir û daraziyên xwe bibêjin. Lê eger rexnegirek navê nivîskar ji daraziyên xwe re bike bingeh û bibêje; *“Eger filan an bêvan nivîskar nivîsî be, berhem bêqisûr e.”* û *“Filan an bêvan nivîskar ji me ye, ji ber vê yekê jî layiqî pesinandinê ye.”* û her weha bikeve pîrozwerkirina berheman, wê ji serî de berê rexnegir bikeve aliyekî şaş. Ji ber ku nivîskar bêqisûr nîn in, ew jî karin şaşıyan bikin. Di vegotinên wan de kêmanî yan zêdehî hebin. Dîsa di rengdêr û şayesandinên wan de şaşıyên berbiçav jî hebin. Nivîskar her tim bi honandin, bi hunera gotin û nivîsînê, bi zimanê xwe yê îknager, bi teknîk û şêweya berhemdariyê dixwaze li ser xwendevanan bandorekê çêbike û hin dîtinên xwe yên şaş jî bi xwendevanan bide pejirandin. Ango nivîskarek dikare *“esmanê sahil”* wek barîna berf û baranê rave bike; nivîskarek din jî, bi derba pêşî mênîyê kesekî/ê ji hev belav bike û pişt re heft derbeyan li dû hev li eynî nuqtayê bixe!...

Pesinandineke weha çavgiştî çiqas şaş be, tevgerên dijminane û tajangkirinê jî ew qas şaş in û nakevin meydana rexne û rexnegiriyê. Ango, eger nivîskar ne dost û hezkiriyê rexnegir be, ji ber hin sedemên taybet kêfa rexnegir jê re neyê yan jî li hember nivîskar daraziyek an pêşbîniyek negatîf hebe, wê *“rexnegir”* ji destpêkê de bikeve krîtîk û tajangên neheq. Bervêderê (muxatab) rexnegir ne nivîskar e, berhem e. Divê rexnegir berî her tiştî nivîsarê baş bixwîne, fam bike û bi têngiştineke edebî di krîtîkên xwe de realist be, rastgo be û rê nede hestên ezîtî û dilê fêsiad û êrîşkar. Ji ber ku her du şêweyên qalkirî jî, nikarin cil û xemlên rexnegiriyê li xwe kin û di wêjeyê de cih bigirin.

Têgihîştina vegotina nivîskar

Ji bo ku mirov karibe li romanek, çîrokek, senaryoyek an helbestekê rexneyên edebî bike, divê berî her tiştî rexnegir vegotina nivîskar, naveroka çîroka wî/wê têbigihîje, maneya ku nivîskar daye çîroka xwe fam bike da ku karibe analîzên hingaftî bike. Ev jî ne karekî hêsan e, lewra di têgihîştina vegotina nivîskar de zelaliyek û pêhisandinek tune ye. Bervajiyê zelaliyê, mirov kare rastî gerînekekê bibe, dakeve meydana kehanetê, rastî mijar û mesajên çîlûrû bibe. Lê dibe ku mirov rastî tu tiştekî jî neyê. Vegotin rijî be, hêsan be, bê naverok be, bi navê wêjeyê seriyekî pîvazê be jî, çi dibe bila bibe, hedefa rexnegir têgihîştina vegotinê ye. Gelek caran rexnegir li gor şîrovekirin û daraziyên xwe, ji analîzên xwe re bingehekê çêdikin û digihîjin hin encaman. Rêyeke weha jî serî de berê xwendevan an rexnegiran dide şîrovekirinê şaş. Rexnegir karin daraziyên xwe yê taybet bibêjin lê divê ew, xwe ji darazî û dîtînen xwe yê kesane dûr bikin û bala xwe bidin ser vegotinê berhemdar. Hilbet berhemdar devê xwe nakin guhê rexnegir û mebesta çîroka xwe aşkera nakin, lê rexnegirekî/ê pîspor, jîr û wêjenas, ji sedî sed nebe jî, kare raman û mebesta nivîskar deşîfre bike û krîtîkên heja pêşkêş bike. Eger mebesta nivîsar an berhemê neyê deşîfrekirin, kod û sembolên bikarhatî rast neyên bîşkafîtin, raman û mesajên heyî neyên têgihîştin, wê analîzên rexnegir li cihê xwe rûnenên.

Rêbazên rexneyê

Metoda danasîn û analîzê, ji alî rexnegir an şîrovekar bi xwe ve tê hilbijartin û

ev çîlûrû ne. Tiştê ku ji rexnegir û şîrovekar tê xwestin ew e ku, rave û analîzên wan wênekêşîyeke baş bike û hemû ezayên laşê berhemê raxe pêş çavên xwendevanan.

Di analîz, nasandin, hêjakirin û rexneyê de baldayineke hûrbînî û fireh divê; rave û şîrovekirinê lêkolîner divê; tesbîta bûyeran û analîzên wan ên mantiqî divê; di analîzên rexnegir de destnîşankirina argumentên di cih de divê.

Rexnegir di şîrove û analîzên xwe de gelek rê û navgînan diafirînin. Ji şeweyên nivîsînê bigire heta bi karakteran, naverok, ramanên berhemê,

deşîfrekirina sembol û peyvên mecazî, atmosfera berhemê, taybetmendiya balkêş, dîroka çîrokê û serdema destnîşankirî û gelekên din dixin bin merceka rexneyên xwe.

Di rexnekirina berhemekê de etîk pêwîst e. Divê mirov gotina xwe di çarçoveya armancê de bibêje yan jî binivîse û derneyê dervayî wê çarçoveyê.

Rexnegir kare hizrên xwe yê darêzandinê bibêje lê vê yekê li ser bingeha nivîsar û zimanê berhemê bi cih tîne.

Rexnegir nikare di nivîsarê de li hin hincetan bigere da ku ji bo pêşdaraziyên xwe pêk bîne û êrîşî nivîskar bike. Divê ew bala xwe bide ser zimanê nivîsarê, gotin û maneya wê û deşîfrekirina berhemê. Ango hedef berhem e, ne nivîskar e.

Divê rexnegir, nekevin tatêla nivîskar û wî/wê nekin muxatab û rastgo bin. Lê di bin navê rastgoyiyê de analîz û rexneyên xwe nekin kirasekî dijminahî û berhevdanê, ji pîvaneke bi sewiyê dernên. Her wisa divê rexnegir li gor pîvan û şeweyên edebî karên xwe bikin û nekevin rexnegirîyeke îdeolojîk û dijminane.

Hin nivîskar hene ku xwe ji psîkolojiya ezîtiyê xilas nekirine û ne ligel analîzên bi kêr in. Çavê wan her li pesinan e. Hilbet berhemên ku layiqê pesinandinê ne, bila bêne pesinandin û malavayîya nivîskar jî bête gotin. Lê divê nivîskar bizanibe ku ew berhema xwe dinivîse da ku bigihîne xwendevanan. Lewma jî dêlva ku bi xwendevanan re bikeve gengeşiyê divê guh bide dîtînen, analîz û rexneyên wan. Ev nayê wê maneyê ku nivîskar xwe neparêze. Ango rexnegir nikare li gor berjewendiyên nivîskaran tevbigere, ji bo xatirê wan bibe navgîneke reklam û pesindanê.

Her wisa Rexnegir nikare bibe navgîneke reklam û berjewendiyên weşanxaneyan jî. Ji ber ku “rexnegirîyek” weha, xizmetek bo edebiyatê nake.

aramgernas@hotmail.com

Wêje: II

Bizavên Wêjeyê

Adar JIYAN


Wêje, wekî berhemên xurt ên ku bi mebesta derbirîna hest û hizrên ku mirov têr dîkin û çêj û têrbûneke şahîk û têrwate didine mirov tê navandin. Ango, wêje çeq û muhesela ber û berhemên ku gihîştine radeyeke berz û bilind û payedar e.

Rast e; wêje, wekî derbirîna hest û hizrên mirov tê zanîn û ravekirin. Belê divê tenê ne wekî derbirîna hest û hizrên mirov bête zanîn; her wisa wekî hunera derbirîna hest û hizr û vegotina bi bandor û manîdar jî were dîtin û qebûlkirin. Digel vê yekê, her gotin û vegotinên devkî an jî tekst û derbirînên nivîskî her gav nikarin di bergeha ber û berhemên wêjeyî de cihê xwe bibînin an jî bêne nixrandin.

Nîqaş û guftûgoyên ku der barî wêjeyê de hatine kirin û destpêkirin, xwe dispêrin Yewnana Kevnar. Ev nîqaş û dubendiyên ku wêjeyê rave û şîrove dîkin, bi du awayên bingehîn derdikevin pêşberî. Yek jê, şîroveya ku wêjeyê di sînorekî deng û asê de diesirîne û wê wekî formeke qalibgirtî û neguherbar nîşan dide ye. Ya din jî, ya ku bêngarkirin û sêwirandin, wêjeyê dide nasîn û wê wekî berhemên resen ên ku bi azmûn û ceribandînan salan re pêk tîne, nîşan dide ye. Bi kurtayî mirov dikare bibêje ku du nêzîktêdayînan bingehîn ên ku berên tekstên wêjeyê didin ber lêpîrsînê hene: Yek statûkaparêzî û ya din jî guherbarî û afirînendetî ye.

Li gorî van nêzîktêdayînan bingehîn çend çêşên wêjeyê yên ku ji hêla her du aliyan ve jî wekî çêşên hevpar tîne/hatine pejirandin hene: Bo nimûne; helbest, pexşan, dilşewatî (dram) û bir û cureyên vegotinê yên din.

Tevgerên ku bi şêwazên cihêreng dexma xwe li dîroka wêjeyê dane/didin wekî “bizavên wêjeyê” tîne binavkirin. Di dîroka wêjeyê de gelek bizav û livbaziyan wêjeyê yên mezin pêk hatine. Gava ku mirov dêhna xwe dide dîroka bizavên pêşketinê, pêşî hemû bi bizavên



René Descartes (1596 – 1650)

wêjeyê dest pê kirine. Û hemû jî xwe dispêrên ber û berhemên ku bastûra jiyana civakî pêk anîne. Hizr û felsefeya ku bîrdozên civakî pêk anîne, gelek caran xwe li ser huner û wêjeyê jî dane ferzandin. Û ev ferzandin hem bûye bingeha bizav û livbaziyan hunerî û hem jî bûye rîkn û ripinê ber û berhemên wêjeyî.


Wêje û wêjevanî, bi nêrîn û nêzîkahîtdanên nûjen re gelek guherîn û veguherînên nû pêk anîne û pergala civakên dîrokî serobin kirine. Wekî tê zanîn, berî nivîsê jî wêje hebû. Belê bi dahênandina nivîsê re hem vegotina nivîskî û hem jî ya devkî bêtir û zûtir pêş ve çû. Dîroka mirovahiyê ya nêzik bûye govanê (şahidê) gelek rêbaz û bizavên wêjeyê. Bizavên wêjeyê yên ku em dixwazin bi kurtayî rave û şîrove bikin hin jê ev in:

1- Kevnareyî/kevneşopî (klasîzm)

Klasîzm, wekî tevgerê wêjeyî, hunerî, felsefê û muzîkê di navbera salên 1790 û 1850'yî de li Ewropayê derketiye holê. (Di dawîya sedsala 17'an de li Fransayê derketiye holê) Mijar û babeta xwe jî mîtolojiya yewnana kevnar wergirtiye. Zimanê zîkmakî, wekî bingeha gotin û vegotinê dibîne. Bi feraseta “huner ji bo hunerê” tevdigere. Wêjevanên vê tevgerê, kesantiya xwe veşartine. Di berhemên wan de tîpolojiya şexsiyetên kevneşop derdikeve pêş. Ji bo wê, cih û wargeh zêde ne girîng e; çimkî cih û war guherbar in. Zimanê ku tê bikaranîn, bijarte (zimanê kesên bijarte) ye. Vegotin sade û xwerû ye.

Mirov dikare berhemên Descartes û Molire wekî mînak nîşan bide.

Victor Hugo (1802-1885)



2- Romantîzm (çoşdarî)

Di dawîya qirna 18'an û destpêka qirna 19'an de li erdzmîna Ewrûpayê derketiye holê. Bêtir li Îngilîstan û Almanyayê şax vedaye. Welatê Fransa û Ewrûpaya Başûr hinekî bi derengî nasdarî vê tevgerê bûne. Ev tevgera wêjeyê, li hemberî wêjeya klasîk wekî bertekekê (reaksiyonekê) derketiye holê. Romantîzm, li hemberî hemû astengiyên ku azadiya mirov manî dikin, radiweste. Felsefeya xwe jî ji “rêzik û rêzana herî baş bêrêzikî ye” wergirtiye. Bi daxwaz û egera derbirin û pêkanîna hest û hizrên mirov ên ku dikarin derbasî jiyanê bibin, tevdigere.

Sedsala 19'an wekî sedsala romantîzmê hatiye/tê binavkirin. Romantîzm, di nav çeşnên wêjeyê nemaze di warê helebestê de pir bi ser ketiye û xwe daye çespendin. Li gel vê yekê, di dawîya sedsala 19'an de li Almanyayê şanoya romantîk derketiye holê. Mînakên wê, Friedrich Schiller e. Helbestkarê navdar Goethe jî di nav vî nîfşî de cihê xwe digire.

Di destpêka sedsala 19'an de şano wekî şêwazeke sivik derketiye holê. Di dawîya qirna 18'an de li Îngilîstan û Almanyayê û peyre jî li Fransa, Îtalya û Îspanyayê li dewsa hestan hişmendî û li dewsa nîgaşê jî rexnegirî cihê xwe digire. Serkêşê vê tevgerê Victor Hugo û Berlioz in.

3- Şayesîparêzî (parnasîzm)

Parnasîzm, wekî tevgereke ku di 1860'î de li Fransayê bi hunermendên ku wê demê li dora kovareke helbestê ya hemdem a bi navê “Parnas” li hev dicivin derketiye holê.

Ev bizav, wekî rasteqînîparêziya ku derbasî helbestê bibe, dihate pejirandin. Kesên ku di nav vê tevgerê de cih digirtin, bi hizra “hunera jî bo hunerê” tevdigeriyan. Alîgirên vê tevgerê karê helbestê karekî pir terwende û nijdî (xesas) didîtin û ew kar dişibandin karê gewherfiroşî û zêringeriyê. Ji bo wan awa û şêwaz tiştekî pir muhîm bû. Ev bizav, wekî bertekeke mezin a ku li hemberî romantîzmê derketiye holê, hatiye dîtin. Avakarên tevgerê, dinyaya xwe ya derveyî bi nêrîneke tiştêyî (objektîf) vegotine. Li gorî wan, di helbestê de pîvan û wezn û ahengdarî tiştekî pir muhîm e. Şayesîparêzî, bi vê taybetmendiya xwe jî bi hemû awayî jî sembolîzmê vediqete.

Di vê tevgera wêjeyî de, gelek gotegotên (efsaneyên) welatên xerîb jî hatine bikaranîn û ji wan gelek sûd hatiye wergirtin. Helbestkarên vê tevgerê gelek caran kesantiya xwe nuxamtî hiştine. Kesên ku di wê demê de nûnertiya vê tevgerê kirine hin jê ev in: Theophile Gautier, Theodore Banville, Leconte de Liste, Jese Maria de Heredia ve Francois Coppee.

Li Tirkiyeyê jî kesên mîna Tevfîk Fikret û Yahya Kemal ên ku di nav tevgera Servet-i Funun de cih girtine dane ser vê şopê.

4- Siruştîparêzî (naturalîzm)

Siruştîparêzî, di dawîya qirna 19'emîn de li Fransayê derketiye holê. Nivîskarên siruştîparêz, li hemberî tiştên camidî/heyberî derdikevin. Di berhemên xwe de dijiwariya jiyanê derdixin pêş. Û hemû reşbînî û nakokiyên civakî derdixin pêş. Nemaze jiyana kesên xizan û belengaz û her wiha her gav belengaziya mirovan derpêş dikin. Bandora civakê ya li ser takekes wekî hêzeke diyarker dibînin. Romana Emîle Zola ya bi navê Le Roman Expérimental (Romana Ceribîner) a ku di 1880'yî de nivîsiye, şêwaz û feraseta vê bizavê baş rave dike.

5- Sembolîzm

Wekî vegotina sivik û xwerû ya ku bi zanîna gerdûnî têkildar e tê ravekirin. Her wiha wekî vegotin û ravekirina zagon, rêzan û rêgezên dinê yên gerdûnî jî tê zanîn. Sembol, ji peyva ‘symbolleîn’ a ku ji zimanê grekî ku tê wateya vegotina sivik an jî vegotina pev re ya tevayî hatiye dariştin. Sembol (dawer an jî remz) wateya gelek tiştan di xwe de dihêwirîne. Peyv wekî “symbolum” derbasî zimanê latînî bûye.

6- Mengîwerî (îdealîzm)

Mengîwerî, wekî têgîneke berfireh a ku fikr û felsefeya ku mirov û xwezayê û her wiha hemû zagon û rêzanên xwezayê dispêre hêzên giyanî (manewî) yên derî siruştî

(metafizîk), tê zanîn. Hemû heyîn û heyberên xwezayê bi ramanê ve girê dide. Hebûna her tiştî dispêre tiştên mengîwer û ruhanî. Hebûna bêtî ramanê ya hêzên tiştîyî qet napejirîne.

Li hemberî siruştîparêzî (naturalîzm) û pêzewarî/daringperestiyê (ango meteryalîzm û rastîbîniyê) tim îdealîzmê diparêze. Û her gav di qutb û sehlo benda dijber de, li aliyê feraseta giyanî ango di eniya mengîwer (îdealîst) de cih digire. Îdealîzm an jî wêjeya îdealîst, li gorî felsefeya ku hemû tiştî, li ser rîknê bîr û baweriyê û dozîneya ramanî dide rûnandin, derketiye holê. Rîknê vê ferasetê ji hêla filozofê yewnanî Platon ve ku bi mexseda “dozîneya dinyaya hizrî” tevgeriyaye hatiye danîn.

7- Rastîbînî (realîzm)

Realîzm (rastîbînî) an jî rasteqînî, wekî têgîneke wêjeyî, ji peyva realîte (rastî/rastînî) ya fransî hatiye dariştin û li tevî dinê belav bûye. Realîzm -bi wateya xwe ya giştî- wekî feraseta ku jiyan û pêwendiyên mirov ên xwezayî hildide dest û rasterast vedibêje û derpêşî civakê dike, tê zanîn.

Realîst (rastparêz), wekî kesên bi ku bi vê ferasetê tevdigerin û bûyer û rûdanên jiyanê rasterast vedibêjin tî qebûlîkirin.

Realîstî (rastîparêzî) jî wekî têgeha ku bi ber û berhemên ku bi vê fersetê re der bûye û li tevî dinê belav bûye, tê zanîn.

Îcar bê awarte ‘rastî’ û ‘rasteqînî’ wekî arîşeya herî mezin a hemû bizavên wêjeyî û rêbazên hunerî tê dîtin. Belê pîrsgirêka mezintirîn nîqaşa watedayîn û têgihîştina realîzmê (rastîbîniyê) ye.

8- Dahatûparêzî (futurîzm)

Pêşeng û serkêşê vê tevgerê helbestvan û roman-nivîsê navdar ê Îtalî Filîppo Tommaso Marînettî ye. Marînettî, di sala 1909’an de di rojnameya “Le Figaro” de bi navê “Manifesto Futurîsîta” (Manifestoya Dahatûparêziyê) daxuyaniyekê dide. Di daxuyaniyê de di hate gotin ku “Me, hemû kevnargeh (muze) û pirtûkxane rûxandin û em ê li hember kesên sincperest, femînîst û yê tirsonek têkoşîneke mezin bikudînin.”

Ev yek di hat wateya redkirina raboriyê jî. Di heman daxuyaniyê de di hate gotin ku “Bi rastî em li vê dinê tiştêkî tekane yê herî bijûn û nejdar, ango fikra ku mirov ber bi şer û mirinê ve dike, berz û bilind dîkin.” Ev gotinên wisa, di qada siyasî de rasterê alîkarî û piştigiriya faşîzmê dipeyidand. Damezrînerê dahatûparêziyê Marînettî, bi vê fersaetê re gelek nivîskar û roman-nûsên Ewrûpayê jî di bin bandora xwe de hiştin. Li Rûsyayê jî



Vladimir Mayakovsky (1893-1930)

nûserên mîna Velemîr Hlebînikov û Mayakovskî jî arasteyî vê tevgerê (dahatûparêziyê) kir. Digel vê yekê, kesên mîna Pûşkin û Dostoyevskî hatin redkirin. Dihate xwestin ku di helbestê de nemaze zimanê sikakê were bikaranîn û pêşxistin. Vê bizavê piştî şoreşa kewçêrê (sala 1917’an) ango heta mirina Mayakovskî jî hebûna xwe ya wêjeyî domand.

9- Raselîtandin (Dadaîzm)

Raselîtandin, ango dadaîzm wekî tevgerê çandî û hunerî (wêjeyî) ya di destpêka şerê cihanê yê yekemîn de derdikeve holê. Ev bizav, navê xwe ji peyva “dada” ya fransî ku tê wateya “pêlîstoka hespa textîkî” werdigire. Tevger, ji komeke ciwan pêk tî. Kesên ku di nav vê komê de cih digirin jî Jean Arp, Rîchard Hulsenbeck, Trîstan Tzara, Marcel Janco ve Emmy Hennîngs e. Endamên vê komê di sala 1916’an de li bajarê Zurîhê li Cafeya Hugo Ball li hev dicivin. Û der barê tevgera nû de daxuyaniyekê didin.

Bizav, ji kesên ku ji ber şerê ku dinya serobin kiribû, bêhêvî û bêmecal mabûn û bi egera ku êdî li vê dinê tu tişt li ser xwe namîne û her tişt demdemî û mirinde ye, tevdigeriya pêk hatibû. Ango wekî tevgera bêhtengî, bêdengetiyê di hate dîtin. Nivîskarên dadaîzmê dixwestin raya giştî bixin nav reşbînî û bêhêvîtiyê. Di berhemên xwe de li hemberî xweşikî, şahîkî û gewzîneriyê derdikevin û ew wekî nîrxên burjuvaziyê yê kerixîner nîşan didan. Bizav bû destpêka derçûna gelek kovarên wêjeyî jî. Kovara herî bi nav û deng a bi navê “Lîttérature” bû ku ji tekst û nivîsên nûserên demê yê mîna Andre Breton, Louîs Aragon, Philîppe Soupauld, Paul Eluard û Georges Rîbemont-Dessaîgnes pêk dihat.

Bizava raselîtandinê, piştî sala 1922’yan bandora xwe wînda dike û hemû dadaîstên wê demê arasteyî surrealîzmê dike.

10- Dererastîparêzî (surrealîzm)

Piştî her du şerên cihanê (şerê yekemîn û duyemîn), li erdnîgariya Ewrûpayê derketiye holê. Wekî tevgerê nû, li hemberî rasteqîniyê tiştên derîaqil û rasteqîniyê vedibêje û diparêze. Nivîskarên ku dane ser şopa vê bizavê hemû, liv û bizavên hişmend û derhişmendiye didin ber hev û li gorî xwe piroleziyeke (mubelexeyeke) dûrîaqil diafirînin. Nivîskarên vê tevgerê yên mîna Andre Breton, Louis Aragon, Benjamin Peret û hwd. gelek berhemên xurt afirandine. Îro di nav nivîskarên dinê ên nivîşê nû de gelek nivîskarên vê tevgerê gihane û digihên. Pirên wan jî bi mîzahê (pêkeniyê) têkildar in.

11- Tîparêzî (letrîzm)

Tîparêzî, wekî tevgerê wêjeyê, piştî şerî cihanê yê duyemîn ji hêla helbestvanê romanî Isidore Isou ve derketiye holê. Tevgerê helbestê ye. Taybetmendiya vê tevgerê ew e ku di helbestê de li şûna peyvên, tîp (herf) werin bikaranîn. Armanc ew bû ku, bingehtirîna tîpan a wekî şewazeke nû xwe bide çespendin. Tevger, lihemberderketina dijber a şewaza klasîk bû.

Pêşengê vê tevgerê Isidore Isou, tevgera tîparêziyê bi vî awayî rave dike û wiha dibêje: “Tu tiştê bêyî tîpan pêk nayê; heke tiştêkî ku bêyî tîpan pêk were hebe jî, ew ji hêla giyanî ve tu car nikare hebûna xwe biparêze. Ji bilî wê, kesên mîna Maurice Lemaître û François Dufrêne jî wekî helbestkarên vê tevgerê tên zanîn. Ligel ku wekî tevgerê wêjeyî derketiye holê jî, ew li ser tevgera reqs û muzîkê jî di bin bandora xwe de hiştiye.

12- Heyîparêzî (egzîstansiyalîzm)

Heyîparêzî, pêşî wekî tevgerê felsefî, di dawiya sedsala 20'an de li Fransayê derketiye holê. Damezrînerên vê tevgerê Neitzsche, Kierkegaard û Husserl in. Her wekî din jî nûnerên vê tevgerê jî Maurice Merleau-Ponty, Martin Heidegger, Karl Jaspers, Jean-Paul Sartre, Gabriel Marcel in.

Ji hêla felsefî de 4 şaxên bingehtirîna heyîparêziyê hene:

1. Heyîparêzî her gav yek-kesantî ye. Ev nêrîn, li hemberî giyan, hiş, ramanê û jîrayiya ku hemû xwe dispêrin mengîweriyê.
2. Heyîparêzî, berî her tiştî pîrsa heyîne di xwe de dihevine û girêdayî vê yekê, lêkolîna wateyan jî di hundirîna.
3. Heyîparêzî, wekî tevahiya derfetên ku mirov hildibijêre tê dîtin. Ev nêrîn, li hemberî hemû cureyên determinîstiyê ye jî.



Jean-Paul Charles Aymard Sartre (1905-1980)

4. Hemû derfetên ku ji bo hin mirovan hene, divê ji bo hemû mirovên din jî hebin.

Bandora heyîparêziyê, di warê çanda hemdem de jî xwe da der. Kesên mîna Franz Kafka, Das Schools, Şato, Der Prozess, dan ser şopa Kierkegaard û ji bo dahatûyeke hedar û ewledar têkoşiyane. Babetên resen ên heyîparêziya hemdem xwe di roman û tekstên listikên Sartre de, xwe di berhemên Simone û Beauvoir de dide der. Ev feraset nemaze di ceribandina Albert Camus a bi navê l'Homme Revolte (Mirovê Serhildêr) de bêtir hatiye bikaranîn û kirpandin.

13- Xweperestî (personalîzm)

Xweperestî, wekî lihevhişkeriya, marksîzm û heyîparêziyê tê zanîn. Piştî qeyrana aborî ya sala 1929'an li Fransayê, bi egera çareserkerîna pîrgirêkên mirov ên aborî, derketiye holê. Pêşengê vê tevgerê Emmanuel Mounier e. Mounier, di sala 1932'yan de digel hin dostên xwe kovareke bi navê “Esprit” diweşîne. Û hêmanên xweperestiyê di vê kovarê de belav dike. Li gorî Mounier, “Kesên pêzewar (materyalist) aliyê giyanî yê jiyana tiştêyî nabînin û mandele dikin. Her wiha, kesên mengîwer (îdealîst) jî aliyê tiştêyî yê jiyana giyanî di ser guhê xwe re diavêjin. Heçku, divê tu mirov ji bo mirovên din wekî alav neyên dîtin û xebitandin. Her wiha divê mirov hebûna jiyana giyanî bipejirîne ku tehmê ji jiyana bigire.” Ji bo wê, personalîzm ne tenê materyalîzm û ne jî tenê îdealîzm e. Ew, çeq û lihevhişkeriya her duyan e.

Bi kurtayî, Mounier jî bo ku lihevhişkeriya navbera realîzm û îdealîzmê pêk bîne û mirovahiyê bigihîne radeya mirovheziyê (humanîzmayê), ev tevger daye destpêkirin. ●

adarjiyan@mynet.com

Çavkanî :

Antolojiya Şaheserên Wêjeyî, Vasfî Mahir Kocatur, 1967, Ankara
Ana Britanica, cîlde 7'an, rûpel: 627
Ferhenga Wêjenasên din, Seyîd Kemal Karaaliogluç 1979, Stenbol

Riya Dûr

Selahedîn ÇAM

Dilgerm ji xwe re ji bo rêwîtiyê paldanka pêncan veqetandibû. Armanca wî ku di pencereyê re li derve temaşe bike. Saet di şanzdeh û nîvan de hat cihê xwe girt. Otobêzê dê di hivdehan de hereket bikira. Dilgerm di pencereyê re cara dawî xatir ji bajarê xwe dixwest. Rêwî di hundir de heval û hogir ji derve ji hev re dest li ba dikirin. Dilgerm cara pêşîn bû ku terka bajarê xwe dikir. Her çiqas çend car berê jî çûbû Elezîzê û Entabê jî, zû vegeriyabû. Wek îcar çûyîn û hatina bi dirêjahî nebû. Alîkarê şofêr biletên rêwîyan kontrol kir. E! Her tiştê temam bû. Got dewam! Otobêz bi rê ket.

Dilgerm bi dilekî xemgîn, bi kul û keser piştî xwe da felekê, berê xwe da oxirê. Êdî roj çûbû ava, tarî ketibû ser bajêr. Stêr û gerstêrk derketibûn ser ezmanê bajêr. Şewqa xwe didan bajar. Otobêzê berê xwe dabû rojava. Dilgerm di paceyê re mêze kir. Û hêdika di ber xwe de got, ‘şehrê min î nazenîn bi xatirê te!’ Ji çavên wî yên sorbûyî du dilop hêsi hatin xwarê û ketin ser kirewata wî şil kirin. Rêwiyê kêleka wî ew rewş dît. Dilê wî pê sotî.

Roja veqetandina ji welat ketibû bira wî. Ew jî wek Dilgerm rojeke payîza dereng ji mal û malbata xwe qetiyabû, berê xwe dabû welatê Dilgerm. Ew jî, ew roj ewa bi kul û keser bû. Wî ji derûniya Dilgerm baş fam kiribû. Çavên wî bi çavên Dilgerm ê sor ketin. Rondikên ku ser kirawata Dilgerm şil kiribûn, dît. Bi dengêkî nizm û terbiyekirî pirsî:

“Tu hê nuh ji bajarê xwe derdikevî?”

Dilgerm:

“Belê ezbenî. Cara yekem e ku ez ê ji bajarê xwe derkevim.”

Rêwiyê heval got:

“Ez vê êş û janê zanim. Deh sal berê ez jî wek te ya îro ji bajarê xwe veqetiyabûm û min berê xwe dabû vî welatê te ku tu îro jê vediqetî. Lê ez wer hînî vî gelî bûm. Min ji wan hez kir. Têkiliyên min ê baş bi wan re çêbûn. Ez bi dilê xwe li vir mam. Bavê min qeyrana dil derbas kiriye. Li nexweşxaneyê bajarê me ye. Ez bo wî diçim. Tu jî wek min tê hînî jiyana wê derê bibî. Dema mirov nuh diçe devereke, dar û ber kulîlk û çiçekên wî cihî ji mirov re biyanî ne. Mirovê wî, tore û edetên wan naşibin ê mirovên ku berê te ew nas kiribûn.”

Rêwî destê xwe dirêjî destê Dilgerm kir û dewam kir:

“Navê min Yuksel e.”

Dilgerm jî got:

“Navê min jî Dilgerm e.”

Bi vî awayî Dilgerm û hevalê xwe yê ku bîst saetan bi hev re rêhevaltiyê bikin xwe bi hev dan naskirin.

Dilgerm ketibû derûniyeke kûr. Diya wî, bavê wî, xwişka wî ya biçûk ku tim digot kekê ji min re çikolatayî û bebika porzer û çavşîn bîne, di ber çavên wî re dihatin û diçûn. Lê heta niha pereyên wî nîn bûn ku ji wan re tiştêk bistîne. Fikirî û hêdika ji xwe re got, ‘Ez mehmiza xwe ya ewil bigirim, ez ê ji xwişka xwe re çikolata, bebika çavzer, pirtûk û pêñûsên reng bi reng bikirim û bi postayê bişînim.’ Di nav wan fikr û xeyalên Dilgerm de otobêza wan bi çiyayê Qerejdaxê re hildikişiya. Carinan otobêz derdiket ser çiya. Carinan dadiket newalan, di ser piran re derbas dibû.

Roniya şewlên wê didan kevirên reş û mezin. Ronahiya ku diket ser keviran, şewq dida hundirê otobêzê û ronî dikir. Dilgerm hîn nuh di xew re çûbû. Dengê Muewênê bêaheng bilind bû:

“Birêz rêwiyên me yên delal, em ê nîv saete li tesîsên Zeûgma bin. Çayê îkrama me ye. Noşî can be!”

Dilgerm ji paceya otobêzê li jêr mêze kir. Pireke direj û di bin pirê de aveke pir û boş diherikî. Hevalê wî Yuksel agahî dan wî:

“Ev pir, pira herî dirêj û fire ya welat e.”

Dilgerm pira welatê xwe ya deh çavî dîtibû. Lê ev pire mezin bû, ava wê pir û bi coş bû. Ava çem wek marê reş xwe fetal fetal dikir û diherikî û bi deştê de diçû. Dilgerm di nav ava çem de stêrk dît. Stêrkan ji ezman silûeta xwe dabûn çem. Ezmanê şîn tevî stêrkên xwe yên ronak di ava çem de bûn. Komika Sêwîyan. Stêrka Zuhre. Stêrka Merîxê. Stêrka Zuhel, tev di nav ava boş de dihatin dît. Dilgerm di sa ket nav xeyalên kûr. Berî du mehan romana Gilgamêş xwendibû. Hat ber çavên wî, hat hişê wî ku Gilgamêş li ser vî çemî jiyaye û hema dît Gilgamêş li binê dara mazî ji binê kevir marê reş derxist û li deştê xwe bada û ber bi Ûrikê ve bazda. Tevahiya gelê Îrûkê ketibûn ser xaniyan û li Gilgamêş û mar temaşe dikirin. Di heman demê de Mamostê wî yê seretayî hat bira wî. Mamoste ji wan re Mezopotamya, şaristaniya Mezopotamya û Gilgamêş û mîrxasiya wî vegotibû. Demildest ew hemû xeyal kir û di ber çavên wî re mîna şerîda filîm derbas dibûn. Di nav van derya xeyalan de otobêz rawestiya û Dilgerm bi tevî rêwîyan ji otobêzê peya bûn.

Li derve sermayeke şeva sermawezê dest pê kiribû. Li vê hêla welat bi destpêkirina şevê re serma dijwar dibû. Berî çûyîna xwaringehê tevahiya rêwîyan ber bi

avdestxaneyan ve dimeşîyan. Dilgerm jî wek rêwiyên din çû avdestxaneyê. Demildest çû qedemgehê. Ji pêgehê derket, hat lavaboyê dest û serçavê xwe şûst. Şeyê xwe yê belek ji berîka xwe derxist ku porê xwe şeh bike. Di neynika ku li ser destşokê daleqandî bû de li xwe mîzê kir. Xwe nas nekir. Rûçikê wî zer bûbû, xwîn jê kişiyabû. Li çavên xwe mîzê kir, di kûr de xuya dikirin, wek çira ku donê wê biqede tefiyabûn. Ji xwe tirsîya û zû derket. Bi xemgînî çû xwaringehê. Rêwiyê hevalê wî li şanêşîna aşxaneyê rûniştibû. Wî jî kursiyek hilda û li rex wî rûnişt. Nan û xwarin xwarin. Bi ser de ji çaya qaçax ku firmayê îkram kiribû, vexwarin.

Rabûn ku heqê xwarina xwe bidin. Dilgerm dixwest ku ew bide. Li gor wî Yuksel xerib bû. Lê Yuksel jî dixwest ku ew bide, lewre deh sal bûbû ku li welatê wî jiyabû. Di nav wan de gengeşî û nîqaş derket. Nîqaş wergeriya pevçûnê. Kirin nekirin hev qanîh nekirin. Şofêr û xwediyê xwaringehê ketin nav wan, pîrsgirêk çareser kirin. Biryar hat dayîn ku Yuksel pereyên xwarinê bide.

Otobêz kete riya xwe û dîsa meşîya. Mawên rêwî qontrol kiribûn, her tiştê temam bû. Rêwiyê hevalê wî got, “Ez westiyame, ez ê razêm.” Û çavên xwe girt. Dilgerm li pêş di qoltixê sisîyan de keçîkek dît. Lê keçîk çî keçîk bû. Ruyê wê wek roja ku nuh ji pêşîya kevir derketibû. Ronî û zelal bû. Birûyên wê wek hîva yekşevî û devdasok bûn. Lêva wê wek şekirê Amedê bû. Tunçîkê wê wek leşkerê nobedar diket ser dêmên wê û dinuxaftin. Nedihiştin ku Dilgerm ruyê wê yê ku dişibandin roja çardehê Avrêlê têr û tîjî temaşe bike. Dilgerm ji wê rindî û bedewiya wê şaş û matmayî bûbû. Serxweş û sermest bûbû. Dilgerm ket fikr û ramanên kûr. Got, ‘Gelo çawan afirênê ew keçîk awa rind û bê kêmasî afirandiye? Rindeke wek wê li darê dinê heye?’ Û Dilgerm fikirandina xwe berdewam kir, ‘Heke Hozanên binav û deng mîna, Fuzûlî, Nedîm, Melayê Cizîrî, Fîrdewsî, Şîrazî û Lawîkê Reşîk ev keçîk bidîtana dê bo wê pir helbestên xweş û hêja binivîsandana.’

Otobêz ketibû rîyeke rast û boş dimeşîya bi lezûbez tariya şevê diqelaşt, diçû û hey diçû. Rêwî tev ketibûn xew. Tenê şofêr, mawên û hostes şiyar mabûn. Hostesê ji şofêr re qehwe anî. Hostesê dît ku Dilgerm şiyar e. Nêzî wî bû û bi dengêkî nizm ê hevrişimî got, “Begefendî tu dixwazî ez ji te re ji bînim.” Dilgerm jî wek wê bi dengêkî nizm û kubarî got, “Ji te re zehmet nebe.” Qehwa wî ya tal hat. Firek li qehweyê xist. Cixare ket bîra wî. Lê kişandina cixareyê qedexe bû. Li qehwa reştarî mîze kir. Qehwa reş û tarî wek bisk û çavên wê dîlbera ku di qoltixa pêşî de rûniştibû. Xwest ku li ruyê wê yê ku mîna hîva şeva çardan e temaşe bike. Lê porê wê ruyê wê nuxamtibû. Helbesta Melayê Cizîrî hat bîra wî. Ku Mela gotibû, “Bisk û tûncikên dîlbera min mîna marê reş, ruyê wê yê wek hîva çardan dîl

girtibûn. Nedihiştin ku ez têr temaşa ruyê wê bikim.” Dilgerm li hundirê otobêzê nêrî tevahiya rêwîyan ketibûn xeweke giran. Tenê şofêr û hostes şiyar mabûn. Di vê demê de fikirî û got, ‘Gelo şofêr jî di xew re biçe dê çawa bibûya?’ Hat xeyala wî ku otobêz gêrî newalê dibû. Dengê qîrîn û nalînan di guhên wî de olan da. Di ber çavên wî re rewşa rêwîyan mîna filmên sînemaya Dîlanê derbas dibûn. Rêwiyên ku serî, dest û lingên wan birîndar bûbûn. Ên ku di nav xwînê de digevizîn di ber çavên vî re diçûn û dihatin.

Di nav wan hest û ramanên nexweş de çavên wî hatin girtin. Serê wî li vî alî û li wî alî li paldankê diket. Dengê teyba otobêzê ji kûr de dihat. Dilgerm çavên xwe girtin û guhên xwe da stranê.

“De xalo, çemê çepelê çemek sar e
Destê xalê min kirin kelemçê.
Berê wî dan rêka dûr.
Berê wî dan rêka dûr!
Rêka dûr! Rêka dûr!”

Dengê rêka dûr di guhên wî de olan dida. Bêdengiya şevê ji hêla dengê stranê ve dihat qelaştin. Bi dengê vê stranê re dengbêjê gundê wî ket bîra wî. Dengê strana ku ji teybê bilind dibû û dengê dengbêjê gundê wan di guhên wî de olan dida.

“Min pişta xwe da felekê, berê xwe da oxirê.”

Çavên Dilgerm çûn ser hev û di xew re çû. Lê di nav xew û şiyariyê de bû. Dengê strana dengbêj û strana teybê di guhên wî de belav dibûn.

“Berê wî dan rêka dûr! Rêka dûr rêka dûr!
Min pişta xwe da felekê, berê xwe da oxirê!
Berê xwe da oxirê! Berê xwe da oxirê!”

Di ber çavên wî re dîmenên gundê wî bi lez û bez derbas dibûn.

Dilgerm di nav xewn û xeyalan de dengê dîkan bihişt. Dengê dîkan berbang diyar dikirin. Piştî dengê dîkan mele azana sibe dixwend. Dilgerm ket nav fikr û ramaneke kûr. ‘Dik xeberê didin ku dema nimêja sibê hatiye. Gelo berî ola îslamê jî dîkan her berbanga sibê dixwendin an na?’ Di nav wê hest û ramana kûr de dengê azanê di guhên wî de olan dida. Otobêz di nav gundekî re derbas dibû. Deng ji minareya gund bilind dibû.

Dilgerm êdî pir westiyabû. Di xew re çû. Di xewna xwe de dît marê reş bi ser wî de dihat. Mar devê xwe vekiribû, zimanê xwe derxistibû û xwe li stuyê wî kiribû xekek. Bi tirs û bi xof şiyar bû. Dît ku tankerek bi ser otobêza wan ve tê. Tanker li pêşîya otobêzê ket. Dîlbera ku sê qoltix li pêş wî bû birîndar bûbû. Di nav xwînê de lewitibû. Dilgerm dît ku otobêz ji qontara çiyê gêrî newala asê dibe... (Mersîn, Tebax 2006)


Strana Vegerê



Ehmed OSMAN

Êdî vegere delala min. Edî ji wê koça xurbetê vegere. Ev der warê te ye, li warê xwe vegere. Ev war bendewarê te ye, vegere. Piştî çûyina te min sipîndarek li vir çand. Her roj bi hêviya ku tu vegerî ez li ber rûniştim. Bi rondikên hesretê min av da. Mezin bû, bejin da. Min navê te lê kir... Min xwest ez wê jî wekî te bibînim. An go xiyal bikim ku ev ne darek e, tu bi xwe yî; pelgen wê lêwên te ne bi min re dikenin; bejna wê qama te ye, di gel bayê rojava reqsa hêviyên min dike; siha wê hînkahiya sira bayê evîna te ye, dema ez lêrizandim di nava porê min de olan dide. Sipîndar mezin bû, bejin da û sih vegirt Lê hema pel weşand, ziwa bû. Bêyî tu hebî sih venegirte ser min. Ji min re berba nebû, nehejiya. Bi çûyina te re, hemû rojên hildihatî binewr bûn. Şerm kirin ku di pey te re rûyê xwe nîşanî min bidin. Şerm kirin ku di pey tihna evîna te re pertewên bavêjin ser eniya min, bibriqîn. Hemû heyvê di vî warî de di yekşeviya xwe de hîlal man... Nexwestin ku di pey çûyina te re mezin bibin. Komika sêwîyan jî di piştî ku tu wenda kirin de yek li pey yekê rijîya. Piştî çûyina te, teyrên ku di payîzan de jî vî warî bardikirîn û di buharan de dîsa vedigeriyayîn, îcar çûn û car di nehatin. Yên ku bi şaşî hatin jî piştî ku rûyê te li vir nedîtîn, xwe xistin ber defikên nêçîrvanan û xwe bi ser mirinê de berdan. Dilê wan negirt di pey te re li vî warî bijîn. Di pey te re bilbil li sorgulan çêriyan, evîna xwe xwarin. Niha jî bê sorgul dikalin. Ji hêrsa geh jî dilê xwe dixwin û geh jî ji rondikên xwe vedixwin. Di pey te re lavlavên ku bi eşqa jînê, xwe li bejna şaxa dipêçan çelmisîn, ziwa bûn. Bayê bakur bi sira xwe re ew jî vir birin dûr. Nêrgiz stuxwar bûn. Nesrîn çilmisî, “kevnenêrî lê çêriyan.” Di pey te re ez jî tekeseerê dinê bûm. Min sihek nedît ez lê rûnim. Qiblegahek nedîn ez berê xwe bidimê nimêj bikim. Ez bûm tihniyê dîtina te çola xiyalan de. Leylanan ez ber bi xwe birim. Ax ku careke din tu bêyî... Wê çaxê ez dê bo te bêjim ku qet bêyî jiyan li vî warî nabe... 29 Reşemî 2004 ●

Liqatvan



Selmet GULER

“Vê kurteçîrokê û vî fotoxrafî, diyarî dayika xwe û dapîra liqatvan ku navê wê nizanîm dikim.”

Ku ez li vî fotoxrafî dinîhêrim ez li zaroktiya xwe vedigerim. Û dayika min dîsa dibe dîmenek û tê hem-berî çavên min.

Ka em binehêrin bê ev fotoxraf li kîjan nîgargehê û ji kîjan çarçoveyan hatiye pê.

Dem û demsalên ku roj dibûne mîna salan û hêdî hêdî siya nizaran ber bi qûntarên çîyan ve dikişîya... Yan wextê ku yezdanê rojê dest diavete tûrê tîrêjên roja argûn û bi kevanê xwe yê hevrişimîn tîrên agirîn bi ser zevî û çolbeyaran de dibarandin. Ji bilî giya û dar û deviyên ber bi av, giyayê çîya û çolbeyaran roj bi roj diçilmisî û hin bi hin hêşîniya wan tîk diçû. Lê beriya ku dexla zevî û beyaran têkevê himbêza bayê nû û hilweşe, palên dasê, radihiştin das û misasên xwe û diçûn ber erdên genimê rengzerî ku rengê xwe ji sîdana roja heftrengî dizîbûn û wekî têkevin dîlanê mil didan hev. Gava serpale di tewa û dengê dîloka “Hey pale” jê hildibû bi hev re devdasên mîna heyva sêrojî diçûne noqa genim. Beriya ku deng raweste paleyên ku bi melodî û bi ahenga dîloka “Hey pale” çep û rast das diavêtin noqa genim, dîlok ji devê serpale digirtin û tiştên ku serpale digot lê vedigerandin. Ha hinganê di van wext û demên zaroktiya min de dayika min û jinên gund ên din, li pey paleyên dasê liqat an jî liqata li pey liqatvanan dikirin.

Rojekê pismamekî bavê min ji bajêr hate gundê me û ji bonî ku birinc biçîne Erdê Xelef Begê deman kir. Du kesên ji gund jî bûne cenan û bi hev re birinc çandin.

Dem û dewran, wext û zaman ketin dû hev, giya-birincê me simbil girt, lib sitewiyan û hate dirûnê. Wekî her sala Xweda dîsa paleyên dasê ketin rê û rêçikên nîgargeha xewn û xeyalên zaroktiya min Newala Bûnisra. Jinên gund ên hejar jî tev* çûne liqatê, liqata Birincê Rûto. Me zarokan jî dermalên xwe dibirin nava firêzê û me alikariya dayikên xwe dikir. Lê bi rastî ji alikariyê bêhtir em diketin ser piştê hev û me pûş diavête nav ser û çavên hev. Ji wê rojê û vir ve ku ez firêzan dibînim ew roj yanê dayikên min û jinên gundên din, di nava firêza Birincê Rûto de dibine dîmeneke dîrokî û tîne pêşberî çavên min.

Rojekê, li ser teyfiqeke qeweqî wêneyê jinên liqatvan** kete ber çavên min. Nizanîm çima lê wêneyê jinên liqatvan pir bala min kişandibû ser xwe. Çendî cî ne ciyê nîgaşan bûya jî lê figurên wan berê min dabû xeyalên borî.

Piştî dem û dewranan dîsa berê min ketibû Newala Bûnisra rêçîka Erdê Xelef Begê, nava firêza Birincê Rûto... Her du dîmenên dîrokî ketin teniştê hev û teşeyên figurên lewna dîmenan tîkilhev bûn û min hew dikaribû wan ji hev û din derînim. Tenê, kiras û şarên liqatvanên li ser teyfika qeweqî ne wekî yên medreba Erdê Xelef Begê bûn. Lê ne dûrî wan jî bûn. Çendî min xwestibû zend û bendê xwe hilkim û wêneyê liqatvanên Birincê Rûto li dar bixim. Lê mixabin ez ne wê-negerbûm û min nedikaribû dest biavêjim reng û nîgarên wêneyan. Lê ev wêne jî kete kêleka wêneyê din û di

quncikeke dilê min de xwe ji ber min veşart.

Rojekê ji rojên meha Tîrmehê, ez li hespikê xwe yê hesinî siwar bûm û çûme nava firêzên derdorî bajêr. Gava min teşeya vê jina liqatvan di nava firêzê de dît mîna mirovekî ku bi salan li benda kesekê be û ji nişka ve ew kes derkeve pêşber, ez ketim girtîgeha helecane û min hew dizanibû bê ez çi bikim. Ji wextê ku min rahiştibû mekîna fotoxrafan û di dilxwe de min fotoxraf dikişandin, wekî xortekî çavlider ez çarçav dibûm. Lê bi rastî min tu carî bawer nedikir ku nîgarên quncika dil ên veşartî rojekê derkebin miqabilî min. Lê niha li ber çavên min bûn. Ez bawer im helecana min ji bona vêya bû.

Êvar bû lê jina liqatvan hîn di nava firêza ku dirêj û dirêj bi Rêya Hevrîşimîn re ketibû pêşbirkê liqatê berde-wam dikir. Ji xeyrî dengê terempêlên ku li ser rê diçûn û dihatin wisewîsa çivîk, zarok (yên ku diketin ser piştê hev û pûş diavêtin serçavên hev) û xuşîn û nalenala çemê ku pêşbirkê firêzê tîk dibir valahiya guhan dadigirt. Roja ku ber bi çiyayên aso diçû hêdî hêdî dibû mîna sêleke sor. Loma zerahiya firêzê, benav û darbiyên li keviya ava ku bajar û kesên bajêr dikir du şiq zertir dixuyan.

Di vê esra teng de, li hemberî şewqa zêrîn diviyabû ku min reşahiya lewna liqatvanê dabûya ber fotoxrafkêşê û min fotoxrafê wê bigirta. Lê nîgaşa ku min di serê xwe de pêk anîbû hîn dûrî min bû. Li gorî çaviya ku di hiş û nêrînên min de hatibû fesilîn, zûma lensa min e 35-70 jî tîrî nedikir. Çarçoveya ku min di mêjiyê xwe de fesilandibû nêzîkahî dixwest. Lê ku ez çûbûma cem, dibû ku nehiştê ez fotoxtafê wê bikêşim! Heger ez rastûrê çûbûma cem û min jê re bigota “Ez dikarim sûretê te bigirim?” Ez ditirsîyam ku bêjê min na. Ji pisporên xwe ez fêr bûbûm ku êdî zor bêjê min erê. Ji sedema van her du ihtimalên ku pîra liqatvan nehiştê ez fotoxtafê wê bikêşim min newêribû biceribînim. Lewra wek nêçîrvanê ku bi fen û fûtan xwe nêzî nêçîra xwe bike ez berpê çûm. Hew çend gavên bi jimar di navbera min û wê de man, serê xwe rakir (ez bawer im hay ji xîştêna lingê min bûbû) li min nihêrî, lê pêça xwe neda min. Dîsa serê xwe tewand û liqata xwe berde-wam kir. Ez li hember sekinîm û min got:

— Qewet be dayê. Bêyî dilê xwe ez bersivandim. Lewra di ber xwe de got:

—Tu sax bi

—Tu çi berhev dikî?

Dîsa serê xwe rakir û li min nihêrî û hêdî hêdî piştê xwe rast kir lê bi rastî piştê wê rast nebû. Bêyî dilê xwe dîsa lûvên wê ji hev çûn.

— Ma ez ê çi bikim? Ji xwe re simbilan berhev dikim. Hew min dît ku devê min vebû û min got:

—Tu yê çi ji simbilan bikî? Pîrê çavên xwe zîqî nava çavên min kirin, bi dengê bilind û bi awazeke hişk, Got:

—Em ê bikutin û bixwin. Ez hayî bûm ku bi pîrsa min a ku dûrî jiyana wê bû hêrs bû loma bi dengê nerm, bi nêrîn û lepteke xemrevîn min got:

—Qey hîn tiştên wiha mane? Beşîşî lê ji beşîşandina wê xamaşîyeke hêrsbûyî dibarî, lê bi zarxweşî got:

— Ji mirovên hejar re maye!

Tewiya erdê û bi çavên xwe yê zelûl dîsa li simbilên genimê sorik geriya. Ez jî tewiyam erdê, yek li vir yek li wir û yek li dera ha wekî ez ji zarokatiya xwe fêrî liqatê bûbûm min jî simbil berhev kirin. Gava nava lapên min tijî bûn ez berpê çûm û simbilên ku min berhev kiribûn min dirêjî dapîra liqatvan kirin.

—Ji te re dayê. Pîra ku ji can û rih xwe dabû karê xwe veciniqî û bi veciniqandina wê re serê wê ber bi min ve zîvirî. Dema çavê wê li destiyê nava destê min ket şaş bû lê mîna miroveke ku mirovekî binase çavên melûl ên mîşînî kirin nava ferên çavê min, bi dengê zîz û bi awazeke nerm û tîr kirêt got:

—Ne hewce bû. Lê destê wê ber bi baqê nava destê min de dirêj bû. Raheştîyê û yê ku di destên xwe ye çepê de kiribûn baq jî tevî kir û berda kûrahiya dawa kirasê çikandî. Dîsa em tewiyan erdê û simbilên ku ji ber meqesa mekîna dirûnê filitîbûn me dîsa berhev kirin. Lê bi rastî min nizanibû bê çima ez alîkariya jina liqatvan dikim...

Ez bawer im ji hêlekê ve ji bonî ku bextewar bibe min xwestibû alîkariya wê bikim, Ji hêla din ve jî daxwaziya min ew bû ku di ber dilê wê bidim, da ku bi-hêlê fotoxtafê wê bikêşim. Lêbelê ez ketibûm navbera her du daxwazan lewra min jî nizanibû ez li kîjan hêlê me? Tiştê ku ez dizanim çavê min her tim li rojê bû. Ez ditirsîyam ku ronahiya ku min dixwest here û fotoxtaf bimîne. Min baş zanibû ku ronî nebe fotoxtaf jî nîn e. Lê dîsa min liqat berde-wam dikir. Hew min dît ku roj qulubî. Ê mîna boyaxê şewqeke sor, zerîn li çeperê aso veda. Wextê çavên min li xeml û xêza aso ket, wekî mîro bikevin laşê min, tevzînokan canê min dane ber gezan û min hew dikaribû di ciyê xwe de rawestim. Ez hayî bûbûm ku dapîra liqatvan ji bona daxwaza dilê min î dildar êdî nabêjê “na”. Loma, min wêribû xwesteka xeyalên xwe jê pars bikim. Lewra min jê re got:

— Dayê, ez dikarim fotoxtafên te bigirim ?

Piştî wê ya ku rast nedibû bi qasî ku rast dibû dîsa rast kir û mîna kokelekê di cî de rawestiya û bi çavên xwe yê kor û ew çend jî melûl li reşikên cotê çavên min nihêrî. Bêyî dilê wê levên wê dîsa ji hev çûn.

—Tu yê çî ji sûretê min evdala Xwedê bikî? Min got:

—Ji bonî ku tu pîr î ez dixwazim sûretê te bigirim. Heger tu ciwan bûya min sûretê te nedigirt. Çiqas fam kir nizanîm. Bes got:

—Tu dizanî.

Bi destên lertzok û bi helecanê bêmehma min çar, pênc fotoxrafên wê girtin. Nizanîm çima lê tengizî, êdî hew xwest ku ez fotoxrafên wê bikêşim. Ronî jî mîna fînda ku dohnê wê nemînê ji xwe re vedimirî. Xeml û xêzên rengên ku min dixwest jî êdî tune bûn.

Çendî min çar, pênc fotoxrafên jineke liqatvan bi dest xistibûn jî lê ji dildariya giyan min nizanîbû bê ka min çawa girtibûn. Lêbelê wekî mirovên ku digihêjin mirazê xwe êdî ez jî dilşad bûm. Pîra liqatvan alavên xwe li hev kom kirin, simbilên dawa çikandî xistin telîs, bangî du zarokên ku li derdorê şivantiya sê, çar bizin û du, sê karan dikirin kir.

Pîra liqatvan kîsê xwe yê tijî simbil dîsa avête nava milê xwe. Xatir xwest. Ew û du neviyên xwe yên şeş,

heft salî, bizin û kar dane ber xwe û ber bi taxa guhê bajêr ve meşyan. Min jî tûrikê fotoxrafkêşa xwe da nava milê xwe û ber bi motorsîklêta xwe ya ku min li qiraxa rê danî meşiyam.

Fotoxrafê ku berî sî û sê, sî û çar sal berê min di qumbereya dilê xwe de veşartibû îro min dabû ber nîskoka lensa fotoxrafkêşê û bi vî awayî ez gihîştibûm miraza dil. Lê êdî ez bi xwe re ketibûm dudiliyê. Lewra dibêjim gelo min fotoxrafê liqatvanên Birincê Rûto kişand an yê dapîra liqatvan? Heger we rastî divê ez jî nizanîm! Lê heger ez rûpelan vekolim û li xefokên dil binihêrim belkî hingî ez karibim bibêjim min fotoxrafê dîmenên jiyana xwe ya bihûrî kişand. Ma sîdana wênegeran ne rengan ji jiyana wan distîne û wêneyên xewn û xeyalên wan pek tîne? Gelo çirokvan ne xwe di nivîsîn û me jî dixin nava xewn û xeyalên xwe, xewn û xeyalên bihurî yan xewn û xeyalên xwe yên nehatî...

7 Çile 2004; careke din li fotoxrafê jina liqatvan dinihêrim û dîsa ketim rêçikên Newala Bûnîsra Erdê Xelef Begê, nava firêza Birincê Rûto...***

Têbînî :

* “Jinên Hejar”; wê wextê birinc gelekî kêmbû û teamekî pîr buha bû, dînya jî tuneyî bû, li mala xizanan jî cejnê heya bi cejnê spîtahiya vî gîya tîamî lê nedihate dîtin. Lê li mala dewlemendan her tim hebû. Lê mixabin di nava kurdan de ew mal jî pîr kêmbûn.

** Wêne; Jean François Millet “Jinên ku liqatê dikin” (1857)

*** Dotira rojê, gava min fotoxraf tab kirin û min li vî fotoxrafî nihêrî...



Wêne; Jean François Millet “Jinên ku liqatê dikin” (1857)

Firotin

Amed Çeko Jiyan

...
noş bira noş, qîzê noş
bî şîrê diya te be, binoş!

...
Arjen Arî

Tîrêjên rojê yên ku ji roja nûhilatî çik didan û di navbera avahiyên bilind û asê de xwe digihandin sikakên qirêj, li ser camên hûrhûrî bi hev şa dibûn... ronahiya rengorengo ya ku ji sikakan belav dibû şewqa xwe dida paceyên malên belengaz ên ku di qatên jêr ên avahiyên bilind de rûdiniştin. Perdeyên mîna qajikê spî, ji ber çikên ji caman diçirûsîn, wekî ku lewitîbin xuya dikirin. Bayê hênîk ê ku qirş û qelaşên li ser rê li dû xwe xiş dikirin, di navbera derzên depên paceyan de xwe digihand perdeyan. Perdeyên êdî rengorengo bûn, mîna aleke libabûyî dihejiyan û belengazî û hejariya malan radestî çavan dikir.

Tofan ê ku di ber dîwarên xaniyan de dimeşiya, carê ji nav çentikê li ser milê xwe parçeyek nanê birûn ê ku ji malê anîbû derdixist û carê gez lê didan... mîna pisîkekî ku xwe ji yekî vedişêre, bêdeng gav diavêtin û ji bo ku hem belengaziya malan nebîne hem jî ji bo çavdêriyê, carê li paş xwe û navbir-rên sikakan dinihêrt. Bêşik, meşa wî ya bêdeng ne ji tirsê bû. Dizaniyê ku di têkoşînê de serneketin û têkçûn birayê xiyaneî ne... diviyabû barê ku daye ser milên xwe bi hemû hêza xwe hilgire.

Hê kaziba sibê bû û rengê ezmên bi temamî veneguherîbû û venebûbû. Amed di xewê de bû... nişteciyên Baglarê, di odayên xaniyên sar de, di nav livînên xwe yên germ de, xewnên jiyanêke din ku ji jiyana rastîn bi qasî Xwedê û Şeytan, ji hev dûr û nêzîk didîtin. Di berbanga bêdeng de tenê xişexîşa dengê piyên Tofan û dengê ku hebûn û nebûna wî nediyar bû hebû. Tofan her ku ew deng hest dikir, sil dibû û di ciyê xwe de radiwestiya, qasekê guhên xwe li dengê bel dikirin, li paceyên avahiyan dinihêrt, piştî ku tu tişt nedibihîst dîsa meşa xwe didomand.

Dema ku gihîşt qorziya avahiya ku her sibe lê li benda Şêrko bû, piştî xwe da dîwêr, li bin dîwarê avahiyê rûnişt û çentikê xwe danî ser çokên xwe. Ji bo ku cara dawîn hesabê xwe yê roja borî eshî bike, çentik vekir û parçeyê dawîn a nêr xiste devê xwe. Hê nan di devê wî de, bi dengê "Alahû Ekber" li stûkura xwe êşek hîs kir û bi ser çentikê xwe de ket. Parçeyên hûrhûrî yên nanê di devê wî de bi ser rojnameyên rojek berê ên ku ji çentikê wî belav bûbûn reşiyên. Tofan, heya gupegupa dawîn a dilê xwe yê ciwan, mîna mirîşkên serjêbûyî, li ser hûrikên nêr û rojnameyên belavbûyî di nav xwîna xwe de gevizî.

Kanûn, 2007 - Misirc



Death of Marat by David (Mirina Marat - David)



Wêne: Selmet Güler (8'ê Adarê)

8'ê Adarê

Dîlan AYDIN

Dema ku Heştê Adarê tê gotin; xweşî, şahî, serfirazî û azadiya jinan tê pêş çavê mirov. Ev roj dibe roja serhildan û berxwedanê ya li hember bêdadî û neheqîya ku; li ser ked û tevahiya jiyana jinê û jînê tê pêkanîn. Mirov di vê rojê de bi hesta azadî, jixwehezkirin, jixwebawerkirin û xwehemêzkirina jinê, têdigihîje û bi xweşbûna jiyane ya bi jinê re rû bi rû dimîne. Jin, di Heştê Adarê de, di wê roja ku roj bi tevahî şewqa xwe ve ronî ye, wisa xweşik dibe ku; xeml û kena wê, aheng û awaza wê, bi tîrêjen rojê re xweştir û aramtir dibe. Jixwe rastiya jinê û jînê jî ev dîmen e! Ango jin jîn e! Evîn e! Ken e! Lewre jin dayîk e, kêfxweşîya zarok e, xweza ye, afirîner e. Li hember tevahiya desthilatîyan, li hember

tevahiya êrîşên qirêj, rengê herî xwezayî ye. Tu carî ji nexweşî û desthilatdariyê hez nekiriye, nebûye sedema xirakirin û talankirina erdnîgariyan, nebûye astengî û sînor, li hember hest û ramanên kesên. Ji ber vê jî, dema ku jin tê gotin “jîn” tê bîra mirov. Bi rastî jî ev ji bo min hesteke pir xweş e ku; di zimanê me de, ev her du wateyên cuda dibin yek. Ez bawer im, ev nêzikbûn; (heta yekbûna wateya jin û jîn) hêzê dide me tevan. Ev hêz jî, gelek pirsan tîne hişê me.

Lê, li aliyê din, dema ku hin nûçeyên jiyanmîrinî dibihîzim xemgîn dibim. Bi taybetî kuştin û xwekuştina jinan bandoreke pir xerab li ser min çêdike. Dikarim bêjim ku; jiyane, dibe xwelî û tu wateya wê namîne. Ji ber ku jiyane

çiqaş xweş e mirin jî hewqas nexweş e. Jixwe em dizanin ku mirina watedar jî heye û ev çend sal in ku em bi dehan, bi sedan mirinên watedar pêşwazî dikin. Lê, tu wateya mirinên bi vî rengî tune ye! Divê tu tişt nikaribe vê mirina erzana li jinan ferz bike! Tu tişt nikaribe îradeya jinan ber bi xwemirinê ve bibe!

Dema ku jin tê kuştin an jî xwe dakuje; her tişt dimire, li şûna xwejiyînê xwekuştin çêdibe, her der dibe agir. Bi agirê xwekuştin û kuştinê re; evîn jî, hest jî, bêrî jî, keskahiya daran jî, bêhna gulên jî, tevahî kulîlkên biharê jî dimirin! Bi kuştin û xwekuştinan re, helbest û stranên barevînê jî dimirin. Û... gelo mîr jî bi kuştin û xwekuştinê jinan re dimirin? Mîr jî, ji bêevînhiştin û tenêhiştina jinan re digirîn? Bi taybetî mîrên ku dibin sedema kuştina jinan, dikarin li rojê û tavehevyê mêze bikin? Mîrên ku hevalên wan xwe dikujin an jî hevalên xwe dikujin, çawa li axê û keskahiyê mêze dikin? Dikarin baranê û kulîlkên biharê bêhn bikin? Çawa li rûyê jiyanê mêze dikin? Mîrên ku xwişk, dayik û hevalên xwe dikujin dikarin êdî bikenin û li rûyê tu jinekê mêze bikin? Û çima li hemberî xwekuştina jinan tu deng ji mîran nayê? Mîrên ku li ser jinê li ser evîndariyê(!) cur be cur nivîs û helbestan dinivîsin, mafê pesndayîna bejn û bala jinê (!) di xwe de dibînin û herî pir jî, li ser wê stranên dibêjin; çima di vê pîrgirêka giran de, di vê pîrgirêka jiyankuj de nikarin çend gotinan bibêjin, an jî binivîsin û analizên xwe bikin? Dixwazim bibêjim ku mîr di vê mijarê de ker û lal in! Wekî ku mijareke asayî be, wekî ku mirineke xwezayî be. Mixabin di mijara xwekuştinê de, tenê saziyên jinan agahdarî didin û tiştê ku ji destê wan tê dikin.

Belê, hêvîdar im ku em êdî kuştin û xwekuştinê jinan nebînin! Di van rojên dawî de dîsa li çend bajarên me, jin, an hatin kuştin

an jî, xwe bi xwe, xwe kuştin.

Dixwazim di dawiyê de bibêjim ku; di jiyanê de, tu tişt, bi qasî me, baş û nebaş nîn e! Divê ku em başî û nebaşiya xwe, bi xwe bibînin, xwe xwedî hêzê bibînin û li çareseriyên bigerin. Lewre, her tişt ji me dest pê dike. Tenê divê ku em hinekî bifikirin. Ger ku dem û cihê me ji bo fikirinê tune be jî, divê em bizanibin ku em hene! Cih em in, tevahiya xweşî û nexweşiyên em in û li ser her nêzikahiyê, li ser her pêkanîyê bifikirin, xwedî sekn û helwestekê bin. Divê em baş bizanin ku; ji dervayî pergala cîhanê, ji dervayî rastiya civaka me ku bi îdîayên olî

8'ê

Adarê, Roja
Jinên Kedkarên
Cîhanê, bi tevahî
nirxên me yên
bêhempa ve bi tevlî
rengê jiyanê, bi
tevahî rojên me yên
xweş û nexweş
ve pîroz be!

tê ser me û me teng dike, dinyayê li me dike zindan rastiyan din hene. Divê ku em li ser tevahiya nêzikahiyên medya û çapemeniya tirk, ku jinê û jînê bi reşbîniyekê re rû bi rû dihêlin û bi her awayî bi hebûna wê dileyîzin û ji xwe re dikin pêlîstok; rawestin û wan nêzkahiyên tune bikin.

Her wiha ji bo jinên kurd, gelek mînakên birûmet hene.

Wek: berxwedana Besê, baskberdana Bêrîtanê! Gelo tu wêne, wek wan wêneyên leheng û pakrewan, xweşik dibin? Tu wêne bi qasî wan, jinê û jînê ronî dikin? Bila ew wêne bibin wêneyê hiş û mêjiyên me, wêneyên biryarên me yên mirinê û jiyanê! Û divê em şehîdên bêhejmar, tu carî ji bîr nekin! Xwe, di bergeha çavên wan de, di nûmayîna rûyê wan de bigihîjînin bergehên azadiyê. Qey ev nebes in ji bo me?

Heştê Adarê, Roja Jinên Kedkarên Cîhanê, bi tevahiya nirxên me yên bêhempa ve bi tevlî rengê jiyanê, bi tevahiya rojên me yên xweş û nexweş ve pîroz be!

Çavreş; Li Reşçavên Xwe Min Bisitirîne

Omer DILSOZ

Di çavên xwe yên reş de
Veşêre vê hesreta dilê min
Min bibe
Rake ji nav vê hêwirzeya serxwer
Ez qet hînî qelebalixên van bajaran nebûm
Her parçeyekî dilê min ma sar
Her kerikekî ruhê min ma jar

Were çavreş,
Destê min bigire û min bibe ji van deran
Bibe dûriyan çavreş;
Li pişt behran,
Li welatekî gelek gelek dûr
Di kuçetariyên serdemeke hesinî de
Di çavên xwe yên xezalî de
Binixêve evîna ber dilê min
Ew a
Ji kulîlkeke ji bihara umrê min mayî

Çavreş,
Ji mêj ve bû
Xweziyan koç kiribû ji bala û sertarên dilê min
Lê bi tîna çavên te
Careke di vejîya kaniya hêviyên umrê min
Ên têtîjî
Terotol
Û serberdayî
Dîsa kulmek xeyalên tisî
Bûne mêvanê destexana jiyana min

Xwezî bi wê rojê
Bi wê xewnê
Bi wê xeyalê
Ku rojekê ji rojan
Li panava gundekî,
Li welatê me yê navçiyayî
Li ser girekî bilind
Li pesareke veder
Di kevnêkavilekî de
Li ber bêxiriya reşçavên te
Ax xwezî,
Li ber bidime ber ber-rojî hemû xeyalên xwe yên qerisî
Bi xewneke tisî
Li ser destexana umrê xwe
Binoşim dilopek ji tîna sorelêvên te

Çavreş
De were,
Were û biperçiqîne
Van dûriyên ku di neqeba min û te de bûne pejanek ji keserê
Were
Were û dilê min ê zîz
Ê ku di sînorên nediyar de
Li ser riya heyhatê bûye şevçirayeke lerizok
Bi ser sing û bera xwe bihewîne
Bike mêvanê paxila xwe
Wekî mêvanekî Xwedê,
Bila bi xêra miriyên te be çavreş

Çavreş
Were min di vê xopana kevnewarî de
Bike mêvanê reşçavên xwe
Bila ew jî kilê wan be,
Bi xêra ezîzên ber dilê xwe bike
Min biezimîne bi dîlovaniya dayikekê

Çavreş
Were em biherifînin dîwarên dûriyan
Sînorên dûrgehên
Welat bi welat cîhaneke yeksan bînin pê
Li nav tixûbên xweziyên xwe
Hemû mayînen deroberê biteqînin
Û xwe bavêjin bext û torê avzûnkariya heyatê
Jiyan e;
Ma ne îro heye sibe nediyar!
Pêl bi pêl xwe berdine nav mahremiyên jêrhişê xwe
Di çavên xwe yên reş de
Bistêre ezîzê ber dilê xwe

Vê êvarê
Wekî çolekê tiyê bêhna te
Tîna te
Laşê te
Xwîna te
Û
Kela dilê te me çavreş

Çavreş,
Ka ev çi dil-lerizok e
Ev çi perpitiya bêpayan e
Çi hilavêtin e
Çi dîlkutk e

Wisa har
Wisa dijwar
Wekî sîpeleke boş
Qefesa singê min dide ber kulman
Ringering jê diçe
Çavên min serevraz,
Li asoyên dûr û bêdûmahîk bel bûne
Beloq bûne
De were çavreş
Min bibe reşçavên xwe
Bike mêvanê hêlînvanka ser bextê xwe;
Te zanî:
Ez dîno
Tu dînê
Û bila bisekine verêja demê

Çavreş
Li pesarê gundekî dûr
Li nav dehl û daristana darmaziyan
Li beramberî me siya çiyayekî bilind
Ku bi belekiyên befirê neqş neqş
Belek belek li me dibişire
Li ber bêxiriya kevnekavilekî ji sedsala bîstan
Ez û tu
Rûniştî,
Nivistî
Lêkristî
Wekî du kewên serhêlînê
Bi tîna evînê kurk-ketî

Were
Dilê min bi şewqa çavên xwe bialêse
Hilm bi hilm
Qeşaya ruhê min di qefesa singa xwe de bihelîne;
Çavreş, ez dîno
Tu dînê
Û di reşçavên xwe de
Min bihewîne çavreş...

Balîf, Xewn û Xeyal

1.

xem û xeyal li balîfê xwêdaneke tûj
peyv di dev pêûsê de qetek kal
sikak reng diguherin
gotinên kilaman ne bes in ji şeva tu lê bûyî mêvan re

2.

hewa ji hilma te germtir e, ew qas
lê peyv hê sar dimînin li ber tîna dilê te

3.

sî ji bejna te kêmtir dişkê
roj ji xwe dixwe
dengê xwe dikim nav merhebaya te

4.

tiştê ku Gilgamêş nedît pêûsê kifş kir;
bi tevî te û heya straneke ji guliyên şevê rêsayî

5.

ji sonda bi ar heya keneke ji mizgînan
guh didim çîroka te ya ji payîza dereng re mayî

6.

li Heskîfê straneke ji bo heznîtiyê
em di nav kilaman de bûne deng
bi devkî, peyvên me mane ji axirzemanan re

7.

li eniya te di dewsa moriyek şîn a bi benîşt de
çend rê
êdî tu li hêviyan germ dibî

8.

ax ber digire
ku kefika dest ji xwêdanê dibe delavek
rist tê de masiyên nîvçe

9.

ji dema demê ber bi vir ve
se li avşoyan bi helkîn in

10.

ji çavan re jî bask vedigire
dest ji dareke reh lêtazmayî bi jantir
ba ji henaseyek kûr de bi rê ket

11.

çîrok ev çîrok e;
tu li ser baskên teyrê sîmir
ji dinyaya tarî de ber bi dinyaya ronî ve rê dikişînî
kêr
te parçeyek goşt ji canê xwe avêtiye devê teyr
teyr jî ji goştî vedirişe
bi kulekî
li hêviyên xwe lingan sivik dikî
dengek ji teyr, “hooo, eyyy însaaan,
ma dibe ku ez goştê te bixwim
ka kerem bike bi çend gavan
goştê te di bin zimanê min de bû jahr...”

12.

ji hineya li ser destê bûkê sortir in hevokên bi hêvî
jiyan doşekê hevirîşimî
helbest li ser, dergûşek bi çarpîkan ketî

13.

axir û axir
destê însanan li pêşîran asê dimînin
lêv li wan dimîçiqe
deng li wan dikeve
di jiyana kartû de hêvî li wan dibe gotineke servekirî

14.

mizgîn di kêliyan de girêyek e
ben li tûr riziyaî
rist çoyê şivanî
peyv lê tê nîşankirin

15.

te li ku bihîst ku bextê min ji birînekê diherikî
evîn hê nehatiye xaxê xêzkinê ku ez ristan wekî şelteke zirav biavêjim ser te

16.

heya serê mirî li sal dikeve gotin lê tayek ter e
û
heywaxek pê dikeve ku yê mirî ew bi xwe ye
û ji mirî re li navan digerin...

17.

avê berbejnên heya golên gerînek bir
ristên me hêviyê heya qatê heftan hilkişand

18.

tu bûyî peqikek û li zimanê hêviyê jan didî
gotin dişemitin
peyv wekî kevzeyê devê cihoyan

Receb DILDAR

Jana Şairekî Amedî

Ji demê xwîn diniquite
Peyker sor dibe, meydan di nav xwînê de dimîne

Ji axê xwîn diniquite
Sirûd sor dibe, bajar di nav xwînê de dimîne

Ji dîrokê xwîn diniquite
sêdar sor dibe, azadî di nav xwînê de dimîne

Ji alayê xwîn diniquite
Ferman sor dibe, welat di nav xwînê de dimîne

Ji musulm xwîn diniquite
Şûr sor dibe, Quran di nav xwînê de dimîne

Ji Rojê xwîn diniquite
Tarî sor dibe, Laliş di nav xwînê de dimîne

Ji can xwîn diniquite
Agir sor dibe, beden di nav xwînê de dimîne

Ji gorê xwîn diniquite
Dojeh sor dibe, bihuşt di nav xwînê de dimîne

Ji xwêdanê xwîn diniquite
Pere sor dibe, ked di nav xwînê de dimîne

Ji girtî xwîn diniquite
Zincîr sor dibe, zîndan di nav xwînê de dimîne

Ji ziman xwîn diniquite
Hikum sor dibe, kurdî di nav xwînê de dimîne

Ji dil xwîn diniquite
Birîn sor dibe, helbest di nav xwînê de dimîne

Ji bilbil xwîn diniquite
Eşq sor dibe, gul di nav xwînê de dimîne

Ji Mem xwîn diniquite
Beko sor dibe, Zîn di nav xwînê de dimîne

Ji tîpan xwîn diniquite
Qelem sor dibe, rûpel di nav xwînê de dimîne

Ji janê xwîn diniquite
Dil sor dibe, Dildar di nav xwînê de dimîne

Me ji bîr nekir

M. MUNGAN

Cejn û roşan derbas bûn
 Demsal, bi hemû wateyên xwe
 Tiştên ku di kûrahiya dil de kom bûne
 Tevî salnameyên xwe hatin û çûn
 Me ji bîr nekir
 Ji axê heta stêrka gelawêjê
 Her der
 Her tişt
 Pêkan bû
 Bi qasî Nazim bicoş
 Bi qasî Aragon evîndar
 Bi qasî Lorca birîndar
 Me ji bîr nekir
 Li wir êrdimek dihat talankirin
 Çapa ofset a rojnameyan
 Li wir ji nû ve dinivîsîn 835 rêz
 Û bajarên ku hêviya xwe ji dest nadin
 Bi kefenê reştarî yê asîman nuxamtî
 Miriyên ku stêrkan kirine tara bêjingê ne em
 Miriyên bênav
 Miriyên ku navê wan li nik hev tê nivîsandin
 Me gewdeyê we ji bîr nekir, me yek ji we jî ji bîr nekir.
 Heyam heyama ceng û bazarê bû
 Me heman çek bi kar dianîn
 Heman sûk û heman xwîn
 Em di dilên ku li evîn û guleyan vedibû re derbas bûn
 Ji warê kemînan, ji baxçeyên wêran
 Ji dîroka wêran
 Kesên xewsivik ku wekî zarokên xwe ji lûleya tivinga xwe hez dikin
 Kesên ku wekî zarokan vedirişin
 Wekî bûkaniyan dibişirin li mêrg û zevîyan
 Me zarokên pevçûnê dîtîn
 Derbas dibûn û diçûn
 Di dirêjtirîn şeva dîrokê de
 Di heman danûstandina pereyan de
 Heman sûkên tarî
 Her carê heman dîroka xwîndar
 Bi tenê em man ên ku ev qas di nava jiyanê de ne
 Ev qas jî nêzî mirinê ne
 Wekî din jî du bedewiyên me hebûn
 Ên ku ji asoya me dadiketin
 Û bi kombêjiya lekan (deh-hezaran) diqîriyan
 Serhildan, serhildan
 Du bedewiyên ku diçûn û careke din vedigeriyan
 Guleyan yek bir, wêneyên bi çapa ofset ya din
 Sî û sê gule berî me gişan dan
 Bi qasî cemseran dût, bi qasî warê bav û kalan nêzîk
 Di şev û rojên Rojhilat de

Sî û sê stêrk
Hê jî tîşkên xwe dişînin ji me re
Hê jî çend kevirên hesteyan in ên ku ez di berîka xwe de vedişêrim.
Çend qurnefil
Ji bo rê hevrişm û ji bo xewê jî haveyn
Ji bo dilê me wekî sondeke reştarî şîlf û tazî
Hin ji welatê sedsalên winda
Gotin anîn
Zarokên ku mirin zû ketiye pey we
Ez li çîyan ne bi we re me
Bi tenê ez hatim ku avê bikim mataraya we
Bi qasî Nazim bicoş
Bi qasî Aragon evîndar
Bi qasî Lorca birîndar
Di navbera rastî û xewneroşkê de
Li ber buhêrên ku sedsal nikarin tê re derbas bibin
Ez diçim û tîm, diçim û tîm
Birûsîna mezin a li devê çateriyên ku efsane lê dibin cur bi cur
Dema di keliyê de veşartî
Zimanê êgir Avesta
Gîl û giha, riş û kok
Zimanê daxdayî, rengê hinarê
Dengvedana veguherîna bi lekan mirovî
Lênûska nû ya Rojhilat
Ji erdê ta stêrka gelawêjê
Her der û her tişt di nav kemîneke reştarî de ne
Zaroka pêşîn a dîrok, nivîs û tekeran
Ey Mezopotamyaya mezin
Ey şeva duhezar salî
Li pişt xwe vegere û binêre
Xwişk û birayên min dimirin li rojhilatê dilê min

Werger: Samî Berbang

Welat DILKÊN

Biyan im

Rûyê xwe li min banedin
Ji paytexta arê me rêzdar im ji ara we re
Bila gûnê we nereve, ne qesasê bavê sêwiyê we me
Çavên xwe li min sor nekin
Ne kesê ku dest avêtiye heyvên we yên çardehî
Û xeyalên we
Ciwantiya we bila xweş bike dilê dayikên we
Yên ku nîvê xwe ji axê re parvekirî

Rûyên xwe navêjin paşperdeya porên xwe
Yên ku ji tirsê bûne gijgijokî
Ne mêrkujê berdil û ne dizê berbûkiya we me
Xwezî ku min wêribûya kefa destê xwe
Li rûyê we bigerenda û tirsê li ser rabirdûya we bimalanda

Ji min nerevin heyrano, çavên min ne li kurtêla nanê di destê we de
ye
Qet dengê xwe nakim di meyzekirina lîstîka we de
Xem nekin, bi wêrekî hev û din kaşkaş kin nava lêstîkê
Ne xem e bila biqetîn kevnîkên we
Va ye min dilê xwe kiriye parçe parçe
Bidin dayikên xwe bila pê pîne kin cihê canên we yên tazî

Ji min negirin û nerevin
Ji min netirsîn û sor nebin
Dizanim ne ji qewmê we me
Ne ji welatê we me
Ne jî ji ol û ji rengê we me
Biyan im û zimanê we jî nizanim

Ka bidin alî perdeya deriyê hebandinê
Û li rêya ku tê me bipirsîn
Hûn ê hênga min nas bikin
Ku yê herî nêzî dilê we me ez

Lêvên Tîmayî

*Bo "Pinpinîkên" ku li Amûdê hatin şewitandin,
Bo "Kulîlkek" ku li Qoser û Amedê hatin qurmiçandin...*

Şêrko

Lêvên Tîmayî
Her ku têlek diqetiya
Li ser singa vezelandî a ûda min,
Her ku xelekek diweşiya
Ji nav porê veçirandî ê defa min,
Her ku notayek dimer
Li ser porteya riziwayî a qermîçokên riwê min,
Her ku "Pinpinîkek" dişewitî
Ji Amûdê heta nav dilê min,
Her ku "Kulîlkek" diqurmiçî
Di himbêza bajarê min,
Her ku Amedê dibû Amûdê
Û Amûdê dibû Amedê;
Hemû gotin dibûn stran,
Stran dibûn bîranîn,
Bîranîn dibûn birîn,
Û
Hemû birîn dibûn evîn
Li ser lêvên tîmayî ên vî bajarî...

Azad RONAKBAR

Ma ne bes e!

ma ne bes e!

gelo tenêbûn e ev
seqema ku xwe dineqîşîne cergên min
ji ber xofa wî
ji cihêbûnên teqez
ên ku wê bihevrebûnên qeşagirtî bihelanda
direviyam / ez
bi bihîstiyariyên xwe yên kerkirî

gelo ev tenêbûn e
an
janîna bêriya kenên kesk û
maçên şermoke yên sivik e
ku bi daristaneke kesk dest pê dikirin
dû re zixureke zer ku ji bajêrekî kevn ê antîk û spî re
vedibe

gelo eve ye tenêbûn / an
bêmecal-êxistina janîna
bedenên di rojiya mirinê de ne ye
li ser renzeyekî me, li eniya min
bandeke sor heye / êdî
bi birçîbûnê nahese bedena min
riyê min berdayî, mijangên min westiyayî
neynûkên min dirêjbûyî ne

min hingî tenêmayîna xwe
hewandiye kesera gwîna te
ma ne bes e!

Çi bû ji me can!

Bakî BOGA

Bi tenê tû buyî
Kilê niqutî
li ser rupelê nivîšta min
nivîšta di çepê sînga min de
xwîn di dilê min de cemiriye
nêrgiz û beybûnê me çilmisîne
konekî reş ketiye ser roja me
ÇI BÛ JI ME CAN!
Hibra hêvî û duayên me
Herikî li ser nivîšta min
Herikî li ser dilê min
Rawest Dilê min î çargopal
Çîrokên me nîvcûyî man
ÇI BÛ JI ME CAN!
ÇI BÛ JI TE CAN!
Heger tê çê... nesequine
Her te pişta xwe daye min...
Heger tû naçe...
Raje vî konê reş î li ser roja me
Nêrgiz û beybûnê me av bide
Ji hêstirê min
Berê xwe bide min
Destê xwe bide destê min
Em çîroka xwe bidomînin
Bi xeml û xeyalên evînî...

Ala Serhildan

Sîpan XIZAN

Jinên cîhanê hûn tev bibin yek
Dozê li dar xin bimeşin leklek
Bindestî rakin ser dil û mêlak
Hember koledar bînin wekhevî

Bi esran e hûn herî bindest in
Kedxwer ji bo we zor û serdest in
Ber xemên bindest hûn jar û mest in
Hember zordestî bînin wekhevî

Dema hûn bibên berxwedan jîyan
Dengên xwe bidin hûn koma cîhan
Daxwaza zanyar bo we serkeft in
Bi vî rengî hûn bînin wekhevî

Serbestî xweştir bona her kesan
Lew her ebrî jin bin barên giran
Bo azadiya wî taybet serhildan
Bînin serbestî bînin wekhevî

Dema dibînim wan çavxezalan
Zerîqemeran ewan delalan
Ber çîna duyem mafê serhildan
Heta ku bînin bo xwe wekhevî

Hûn gulîsor û rengên şepal in
Li topa cîhan hûn bê mîsal in
Li nik zanyaran pir bi kemal in
Bawer im bînin hûn dê wekhevî

Wekhevî xweştir ji bo her kesan
Divê çîn rabin rûbarên cîhan
Azadî çêbit taybet bo jinan
Bi têkoşînan bînin wekhevî

Hûn hin çavzer in û hin çavşîn in
Hin çavreş in û hin mêşînî nin
Bi bisk û zilfan her dixemilînin
Li her deveran bînin wekhevî

Rengên kulîlk in li ser cîhanê
Taybet ser xaka rengkurdistanê
Porên filfilî digel keziyanê
Hember koledar bînin wekhevî

Dema dimeşin geşt û seyranan
Herî dikêşin ewan dîlanan
Awazên zelal xweştir kemanan
Hember koledar bînin wekhevî

Azadî bînin bona bindestan
Taybet bo jinên xaka Kurdistan
Bi wan xemlên xwe bi wan awazan
Bêşik dê bînin ew dê wekhevî

Methên keziyan çiqas bibêjim
Digel wan bist û gulyan jî bêjim
Ji ber xemla wan ez ker û gēj im
Bawer im bînin ew dê wekhevî

Rengên gul in her li her ciyan hûn
Bixwe gulfiroş rengbilbil in hûn
Hember bindestî dilbikûl in hûn
Li her deveran xweştir wekhevî

Pozên bi xizêm herî narîn e
Ristik li gerden xwe dilizîne
Dil û mêlakan xweş dihelîne
Digel guharan bînin wekhevî

Heyran mame ez bo wan çavên kil
Ala serhildan wan daye ser mil
Li her deveran radikin derd û kul
Hember zordestî xweştir wekhevî

Rengên mehtab in gund û bajaran
Kamera zêr in biha ên giran
Şewq dabûn Amed Mûş û Dêrsim Wan
Hember zordestî bînin wekhevî

Herî xweştir be rojên we her roj
Bi keyf û şahî her pîroz be roj
Heştên Adarê serkeftin be roj
Bi serfirazî bawer e Sîpan

08.03.2001

Evîna Xewna Min

Evîndar STÊRK

Were...

De were û bibîne

Niqutek ji xwîna min

Deryayekê sor dike...

Kesera evîna min

Dareke şîn hişk dike.

Di dilê min de agirpijek diteqe

Agirên wê min dişewitîne...

Were...

Wan agiran vemirîne.

Niqutek ji xwîna min

Asîmanan sor dike...

Were...

Xewna min bi xweşîkbûna xwe bixemilîne.

Destê min bigire,

Min di nava lêvên xwe de bihelîne...

Were...

Tu yî stêrka asîmanan

Tu yî heyva şevên tarî

Û tu yî ronahiya çavê min

Evîna xewna min...

2003/Mêrdîn/Nisêbîn

Lêgerîna Bê Bersiv

Ayêdin ORAK

Lêgerîna min bê bersiv ma di dîtînên te de
wek derewên bê sînor.
Çalakiya mezin di gewriya te de aramî ye ji min re
Evîna rojhilatî ye li girekî dûr goristana min a winda.

Di bejayiya jiyanê de masî me
berî nivîsandina dîrokê.
Dilopek hêstir e lehiya herî mezin
ji bo dilê arpêketî.

Rojnivîska min a bi hezaran rûpel
jiyana min a vala ye.
Ez digirim ku wêneyê tenêtiyê çêbikim
bi rûpelên spî.
Ji mijangan çêdikim qesrên nêrînan
Ji birhan çêdikim kelehên dîtinan
Ji çavan çêdikim bajarên zarokên bêkes.

Mêrxas RONÎ

Lêê Yarê!

- lêê yarê ! -

yarê
lêê yarê ...!

di ezmanê dilê min de
stêrkek tenê heye
ew stêrk tu î ...

di valahiya hişê min de
fikirek tenê heye
ew fikir tu î ...

di ronahiya çavê min de
tîrêjek tenê heye
ew tîrêj tu î ...

li ser lêv û zimanê min
peyvek tenê heye
ew peyv tu î ...

axxx yarê ..!
li ser te çi bêjim
çi nebêjim
ê dibêjim tu î
ên nabêjim tu î
Xwedê canek daye min
ê ji min distîne tu î ...

*Amed' 2004
Mêrxas Ronî*

Nora EZ

Tu çi dibêjî?

ez dibêjim her dan her roj
ez bibim qulpik tu bişkoj
an jî her hefte
em her du nola qufl û mifte
di hembêza hevdu de rûnên
mîna du kurmên hevrîşim
bi stran û helbestan
tevna şarezahiya evînê bihonin
tu çi dibêjî

heke tu bihêlî
ez ê bibim wêne
tu jî bibe hêlî û awêne
em li hemberî hev
dîlaneke bi heft def û zirne
şahiyeke bi govend û hine pêk binin
û di wê şeva pîroz de hevîrê bihevşabûnê
bi ekl û çêja eşq û evînê bimeyînin
tu çi dibêjî

were dirêj an kin
em bi peymanekê li hev bikin
mîna du marên reş li hev bipiçikin
hîlbikişin qatê ezmanên heftan
em her yek li hêlekê
nola kilekê
xwe bikişînin bin çavên stêrekê
an jî bibin du keskesorên geş
bi hemû teyr û tû û rengên bextreş
bi ken û ramûsan bipeyîvin û bilîzin
bila navê min ê li ezmanan bibe Mem ê te Zîn
tu çi dibêjî

Hejarê Rewan

Şivan AR

Tîrmeh-06/Mêrsîn

Hezkirin nedît, tengazar î dilo tu
Ew demên bihurî û rojên çûyî;
bi avê re diherike belawela..

Tu cara; rezê te şîn nebûn
Bi têlê tixûba re raxistin
ziwa nebûyî
xwîn diniquîtî dilo tu.

Wek termê bêgiyan
tu ketî gorê
tu tim bi xew î
tu dimirî dilo tu.

13 Pûşper 2007

Abdullah ORAL

Bextreşî

Di mirûsê qirna bêyom de
Qurmîçînek dûvdîrêj bûn
Rê û şifîleya şopên veşartî
Şape di ser de bê
Min ev wêne li ku kişandiye?
Tew keniame jî!
Tev riyên
Bi xêzpeyamên rûberî ye
Kenê min

Ez dilokek ji Serhedê bûm
Dilopek ji Şêwla Gola Êrmîyê
Tîna ku ji ber xewnerêşkên şarînî
Ji pesnên sirûden çarînî
Nêrîneke qop
Mîrineke bê rê/şop
Ango
Yek mirin yek nêrîn
Û
Yek ji meytê çarşevî / bêhnketî...

Xezebên pêşwext
Çavên li rîyan
Berên li derîyan
Bêhesab
Bêkîtab

Sosretiya herî mezin jî
Di hemû wênayan de
Li kenê xwe yê virnikî dilikumim
Kenê raperînên bisihûd
Di zozanê temenê min yê
Bêwext
Ji navbarê ketî
û li ber tu tiştî neketî...
Çi mirineke xerîb û fotojenîk !
Ji hemû wênayan
Kenê xwe yê ricimkirî kom dikim

Min ev nîvhelbest
Li ku nivîsandiye
Şape di wê de jî bê
Ew jî wek xwediyê xwe ye
Li dor bextreşîya xwe zîz dibe...
Tew ez hîn sax im
Tew rûyên bêperde ne
Rêzikên helbesta min.....

2006

Li wê kuçeyê

Reyhan SARHAN

Wê rojê
Li wê kolanê
Careke din qidûmên min şikestin
Bûn piçik û parî !
Ji hev ketin stûnên hestên min
Nizanim ev bû cara çendan ku ez tîm
şikandin?
Ji hêla heskirinên xwe ve!
Li wê kuçêya bi nav û deng
Bûn piçik û parî
Hêviyên min ên ku min ji bo te
Neqş kiribûn... Careke din
Li wê kuçeyê...

Nesrîn NAVDAR

Bendewar im

Li min vegere çavşevê
Bê te hemû nîgal dibin xwarina wawikên şevên tarî
Heyva asîmanan di çardeha xwe de be jî
vemirandî ye bê te
girtî ye
tarî ye ji bo min
Ev çend şevên vala ne derbas dibin
de ka tu bêje
Hejmar wenda ne di tariya çûyînan de
Di deryaya lêgerînê de difetisin çav
Çav di pêlên çûyînan de
Bi navê te min xemiland
newaya nav lêvên heyranokbêjan
Bi keştiya bêrikirinê hatiye dagirtin
bendera vî dilê min
Nizanim ev çend refên qilungan e
vedikişin
ji qûntara dilê min
ku ji te dûr im nabînim
te nabînim
Nizanim çend axelêwene diborin
ji ser rûkê jiyanê
Lê ez bi hêvî me hê jî
Çavşevê
Li benda vegerê
xembariyê dişewitînim
di agirê çûyînan de.

Çîroka Keçel û Apê

Berhevkar: Hogîr BERBIR

Li gundekî yekî keçel hebû û sêwî bû. Apê wî ew bi nanoziko xwedî dikir. Ji ber ku keçel yekî dekbaz û bêlbaz bû, zû bi zû kesekî bawerî pê nedianî. Rojekê keçel, bi apê xwe re dihere nav zeviyan. Nîvro bûye, zikê keçelo birçî ye. Xwe ji apê xwe vedidize, kêra wî jê didize û berê xwe dide gund, dihere cem amojna xwe dibêje:

- Apê min got here mal ji amojna xwe re bêje bila gayê me şerjê bike, goşt bikelîne û ji me re bîne.

Jina Apê Keçel ji keçel bawer nake. Keçel cardin dibêje:

- Tu ji min bawer nakî a ji te re kêra apê min ku da min, ji bo tu ji min bawer bikî. Û kêra apê xwe dide wê. Bi vî awayî bawer dike û radibe ga şerjê dike. Goşt dikelîne û dide keçel. Keçel çend nanê sêlê jî pê re radihêje berê xwe dide nav zeviyan. Li ser zeviyan, apê wî gava ku di destê keçel de wî goşt û nanê sêlê dibîne, ecêbmayî dimîne û dibêje:

- Keçel, ev goşt çi ye û te ji ku anî?

Keçel dibêje:

- Apo, gayê mala axê gund li ber mirinê bû, rabû şerjê kir û li gundiyan belav kir. Ev jî para me ket û va min anî ku em bixwin.

Apê keçel bi vî gotina wî bawer dike û bê deng radibe bi hev re nanê xwe dixwin. Êvarê gava ku vedigere gund, jinapa keçelo ji zîlamê xwe re dibêje:

- Mêro, ma te çima gayê me bi min da şerjêkirin?

Apê keçelo dibêje:

- Gayê çi?

Jina wî dibêje:

- Keçel kêra te anî ji min re û got 'apê min gotiye bila amojna te ga şerjê ke' û min jî şerjê kir.

Apê keçelo nizane wê çi xweliyê li serê xwe bike, radibe wî ji mala xwe diqewirîne û keçel jî direve, dike ku terkî dinya bibe û ji apê xwe re dibêje:

- Tu yê min biqewirînî, ez ê jî herim zeviyan bişewitînim.

Apê wî lê mêze dike ku nabe, radibe dev jê berdide. Dibe sibe keçel cardin bi apê xwe re dihere nava zeviyan. Wext bûye nîvro û careke din keçel berê xwe dide nava gund. Ji amojna xwe re dibêje:

- Apê min got bila gayê ku kar jê nayê şerjê bike!

Apê wî jî li derdora xwe dimêzîne ku keçel ne di nav zeviyan de ye. Fam dike ku keçel ê tiştekî din bîne serê wî. Radibe dikeve rê û tê gund, lê mêze dike ku gayê din jî ji dest çûye. Ap hew xwe zevt dike û bera ser piştê keçel dide. Keçel direve û dihere nav zeviyan. Ji yên ku li nav zeviyan e re dibêje:

- Apê min got gayê me her du jî mirin, em ê bê ga çawa zeviyan cot bikin? Hema here zeviyan bişewitîne û were gund.

Keçel radibe zeviyan jî dişewitîne û dikeve rê, terkî dinya dibe. Pir dihere hindik dihere, rastî erebeyeke hespan tê. Sê jin li ser erebeyê bûn. Ji wan re got:

- Ez bêkes im û ji xwe re li karekî digirim. Ji we yek dikare min îşev bike mêvanê xwe?

Ji wan jinan yek dibêje:

- Gune ye, xerîbek e, hema îşev were mala min rakeve.

Û keçel dibe mala xwe. Dostekî wê jinikê hebû, her ku dibû şev, bi dizî diçû mala wê. Ji bo ku keçel bi wê rewşa wê nizanibe, jinikê ji keçel re got:

- Gava ku hinek hatin mala min tê xwe li koriyê deynî?

Keçel got:

- Te manga belek ji min re şerjê kir û goştê wê da min ez ê xwe li koriyê deynim.

Jinikê jê re manga belek şerjê kir û her roj keçel goştê xwe dixwar. Dostê jinikê jî her şevê dihat û diçû. Şevêkê jinikê jî dostê xwe re jî goştê manga belek bir da ku bixwe. Keçelo bi dizî jahrê dixwe nav û careke din xwe li korîtiyê datîne. Gava ku dostê jinikê goşt dixwe, dimire. Jinik dinihêre ku dostê wê miriye. Ditirse û dihere jî keçel re dibêje:

- Ew ê çawa çavê te vebin? Meytek di mala min de heye û ez nizanîm bê ka wî çawa bikim.

Keçel dibêje:

- Mangayeke din şerjê bike ku ez goştê wê bixwim wê çaxê çavê min ê vebe.

Tiştê ku keçel got jinikê kir û goştê mangayeke din da wî. Keçel dihere ba meyt û dibêje:

- Tu ji min re du kera bîne.

Jinik jê re du kera tîne. Keçel meytê mêrik davêje ser kerê û kerê dajo nava zeviyeke gundekî cîran. Xwe di nav zeviyê de vedişêre heta xwediyê zeviyê tê. Mêrik kerê dibîne û çoyî kerê dike ku ji nava zeviya xwe derxe. Di wê kêliyê de keçel radibe ser xwe û li ser mêrik dike qîre qîr. Û jinik jî li xwe dixwe dibêje:

- Te çi kir, te mêrê min kuşt!

Mêrik dibêje:

- Mêrê te berê mirî bû.

Keçel jî got:

- Na bavê min sax bû û li wê qoziyê xwarin di dest de, dixwar. Ez ê herim hikûmetê giliyê te bikim û wê te bavêjin hepsê.

Mêrik ditirse, şaşwaz dibe ku ka çi bike. Keçel dibêje:

- Ku te çil bar qantir genim û ceh da min ez narim hikûmetê.

Mêrik ji tirsan dibêje 'erê'. Keçel çil qantirên ku barê wan ceh û genim e distîne û dihere ber mala apê xwe dibêje:

- Ez ji kar tîm. Vana jî qezenca min in. Ev giştik min ji te re anîn e.

Dilê apê xwe xweş dike. Ap jî pê kêfxweş dibe û keçel efû dike. Çîroka me çû diyara, cihok diherikin bi ava qels û derza.



Methelokên Gelêrî

Berhevkar: KOÇER

Dê şikala min a nû biherimiya

Carek ji caran rehme li dê û bavê hazir û guhdaran.

Li gundekî mirovekî bêmêjî dijiya. Rojekê ev mirov biryar digire ku here bajêr ji xwe re şikalekê bikire. Dotira rojê diçe bajêr ji xwe re, ji sûka bajêr şikalekê dikire û vedigere gund. Gava nêzikahiyê li gundê xwe dike ji wesayîte peya dibe. Ji ber ku di riya gund de dirî, stirî, qurîncek, hwd... hebûn şikala xwe ya nû ji piyê xwe dertîne da ku neqete. Bi piye xwe yî tazî dide ser van diriya. Heya ku digihîje gund piyê wî di nav xwînê de dimîne. Wextê ku digihîje gund li piyê xwe dinihêre ku piyê wî di nav xwînê de maye. Li rewşa piyê xwe dinihêre û di dilê xwe de wisa dibêjê: Mirovê bêmêjî: Xwedê şikir min şikala xwe ji piyê xwe derxistiye, nexwa dê şikala min a nû biherimiya.

Gur û Rovî û Hesp

Rojek ji rojan rovî, gur û hespek bi hev re dertên rê. (Bi rastî em nizanin bi çi armancê gihîştine hev, lê hinek dibêjin bi armanca ku herin hecê gihîştine hevdu). Piştî demeke ne dirêj û ne kurt, berêvarê berf û baran bi ser wan de digire. Da ku xwe ji berf û baranê biparêzin li şikeftê dihewin. Ber bi derengiya şevê gur û rovî zef zêde birçî dibin, lê hesp na. Ji lewre di rê de hesp giya dixwar, lê gur û rovî na.

Piştî demekê rovî dihizire, ji nişka ve fêhleke tê aqilê wî û bi kamkarî gazî hevalên xwe dike:

Hevalno ka guh bidin min, fikrek min heye.

Gur:

Rehmet li dê û bavê te be tu hiş bibî, bi Xwedê ez ji bilî xwarinê nikarim tu tiştî bifikirim.

Hesp:

De ka bêje fikra te çi ye?

Rovî:

Hevalno bi rastî ev fikir li xweşa min jî naçe, lê ne bi vî awayî be em ê giş ji nêza bimirin.

Gur:

Kuro de dûvdirêj neke, tu çi difikirî vebêje em li te guhdarî dikin.

Rovî:

Ez dibêjim ji me temenê kê kin be em wî bixwin. Min di despêkê de jî got bi rastî ev fikir li xweşa min jî naçe.

Gur:

Bi Xwedê ev fikir ew qas ne xerab e.

Hesp di dilê xwe de; 'Bi Xwedê nêta vana xerab e divê ez xwe biparêzim'

Hûn dizanin, heke tu derfet nemabin bila wisa be.

Rovî:

De ka birayê gur tu ewil temenê xwe bêje.

Gur:

Bi Xwedê bavê min digot; "Kure min sala berfa sor bariyaye tu ji dayika xwe bûyî" ma ne bavê min tu car derew nekiriye.

Rovî:

Hah hah haaaa!... Ma ne hingê min lawê xwe zewicand.

Hesp:

Bi rastî ez temenê xwe nizamim, lê wextê ez çêbûme malbata min ew sal li ser nalê min nivîsiye. Xwendin û nivîsa min jî tune, qene ez lê binêrim....

Rovî:

Bi Xwedê pîr bûme çavê min nafesilîne û berçavka min jî maye li mal. Hevalê gur tu dikarî ji kerema xwe re bixwînî?

Hesp mexel tê, piyê xwe dirêj dike û gur karûbarê xwendinê dike. Bere bere hesp piyê xwe dikişîne ber xwe.

Gur:

Ka heval ez tu nivîsan nabînim.

Hesp:

Ka hinekî din nêz bibe, teqez nivîs li ser e. Belkî hinekî mehiya be.

Hesp piyê xwe bi temamî digihîjîne ber xwe û ji nişka ve piyê xwe vedikutîne li eniya gur dixê. Gavê piyê xwe li aniya gur dixê gur di cih de dimire û rovî dikeve ser goşt.

Hesp:

De vêca bixwe!

Jina Bi Nav û Deng

Berhevkar: Behlûl ZELAL

SICÎLA BERHEVKIRINA VÊ ÇÎROKÊ:

1- BERHEVKARÊ ÇÎROKÊ:

- a. Navê berhevkar: Behlûl ZELAL
- b. Pişeya berhevkar : Mamoste
- c. Navnîşana berhevkar:

2- ÇÎROK:

- a. Tarîxa berhevkirina çîrokê: Rêbendan – 2006
- b. Ciyê berhevkirina çîrokê : Tûrabîdîn- Midyad
- c. Ciyê eslî yê çîrokê : Dêrazorê, Hisîçê.
- d. Ciyên wekî din ên ku ev çîrok lê tê vegotin: Turabîdîn, Qamişlo, Tirbespiyê

3- ÇÎROKBÊJ:

- a. Navê çîrokbêj: Sabrî Dîndar
 - b. Cî û warê çîrokbêj: Midyad, gundê Qartmînê
 - c. Ciyê ku çîrokbêj lê rûdinê: Gundê Qartmînê
 - d. Temenê çîrokbêj: 60
 - e. Debara çîrokbêj: Çandiniya genim, ce, nîsk û xwedîkirina pez.
 - f. Pişeya çîrokbêj: Rêncber
 - g. Xwendin û nivîsandina çîrokbêj: Heye
- Çavkaniyên ku çîrokbêj ev berhem jê girtine:
 Kes: Mele Îsa
 Cih: Tirbespiyê
 Dem: 1970

4- JINA BI NAV Û DENG

Li welatekî gernasek hebû. Ji xwe re derdikete seyrane. Deşt û çiya, gund û bajar dikirine yek. Dengbêjek, hunermendek, şêxek, seydayek li ku hebûya; xwe rasterast li wan digirt. Rojekê ji rojan, dîsa ji xwe re derketiye ger û seyrane. Çûye ku derê, behsa jinekê hatiye kirin. Xelk û alem behsa wê dikin:

“Jina filankesê, kurê filankesî di saetekê de xwarina hew qas paleyî hazir kir.”

“Em hebûn hew qas siwar, xwarina me, qehwa me daye me û em bi rê kirine.”

“Ez hew qasî geriyam, hê jî min jineke wilo jêhatî û merd nedîtiye.”

“Min ew qas jin nas kirine, hê jî min yeka wilo binamûs û bixîret nedîtiye.”

Taliya pesn û behskirinê nedihat. Yek disekinî yê dî dest bi pesindanê dikir. Li ser vê yekê, gernasê me got; “Bi Xwedê çilo be, ez ê herime mala vî camêrî û vê xanima bi nav û deng bibînim. Mêrik dide ser rê, bi pirsê mirov diçe Misrê. Gundek li vî alî, yê dî li wî alî. Roj li şeva, şev li roja diqulibin. Heft roj, deh roj taliyê gernasê me digihê gundê ku lê digere. Pirs wî dibine ber konê şêxê ereban. Xwediyê kon, şêxê êla ku li vê deştê bi cih bûye ye.

-Selamun eleykum!

-We eleykume selam!

Mêhvan mêhvanê Xwedê ye. Xwedê çi nesib kir xwarin û vexwarin. Şêxê ereban got: “Ezbenî tu li ser serê min hatî, tu ji ku têyî û tu yê bi ku ve herî? Derdekî te, hawarekî te, emrekî te, kerem ke, em li ber te hazir in.” Mêhvan û mazûvan qotiyê cixarê dan hev, ji titûna hev cixare pêxistin.

Mêhvan li ser pirsra mazûvan dest bi şitaxaliyê kir: “Şêxê delal, bi serê min û te, tu derdê min, daxwaza min, ji xeynî rehma Xwedayê mezin nîn e. Tu û ehlê xwe sax bin. Ez insanekî gernas im. Elhemdulîla hal û wextê min baş e. Hez ji gera dinyayê dikim. Li camêrê weke te diqesidim. Ez çûme ku derê, behsa xanima te hatiye kirin. Li cihê ku ez dibime mêhvan û şitaxalî vedibe, behsa jêhatiya xanima te, merdiya xanima te, mêraniya xanima te ji devê mirovan diherike. Bi Xwedê, min jî gelek meraq kir û got gelo ev çi kes e; ji kîjan êlê, ji kîjan eşîrê ye û min da rê û hatime mala we. Derd û daxwaza min ku ez we nas bikim e.”

Li ser vê şitaxaliya mêhvanê xwe şêxê ereban got: “De bila qehwa me jî bînin, em vexwin şev dirêj e, em ê ji xwe re bi sebir biştaxilin.” Piştî bi demeke kin, qahwe jî hat, qehwa xwe vexwarin. Mazûvan deng li xanima xwe kir, got: “Ya xatûna min ji kerema xwe re were vê derê, min soz daye ku ez çîroka xwe û te bîyî te, ji tu kesî re nebêjim. Însan, şîrê xav vexwariye, xwediyê hemû bêbextiyan e. Were li cem min rûne, ev mêhvanê ezîz li me qesidiye û li pey nav û dengê te hatiye vê derê. De kerem ke were.”

Li ser vê gotina mêrik, xanima wî tê bin konê mêhvana, bixêrhatinê didê mêhvanê xwe û li cem zilamê xwe dirûnê. Mêrik piştî ku cixara xwe ya ku nû pêçabû pêxist û dest bi gotinê kir:

“Ezbenî, ez jî weke te insanekî hezger bûm, ez ne tenê ji gerê, lê belê min gelekî hez ji nêçîrê jî dikir. Serê çend rojan, ez li hespê xwe siwar dibûm û min berê xwe dida çol û çiya. Berî deh salan, rojeke jistanî, gelekî sar e, cîran naçe mala cîranan. Ez gelekî aciz bûbûm, bêhna min teng bûbû, min got bi Xwedê ev erd bigihê vî azmanî ez ê rabim herime nêçîrê, da ku bêhna min hinekî derkeve. Bi wî şertê ku min nehişt tu kes jî bi min re were. Min xencera xwe, tivinga xwe, hemû lazimiyên xwe, li bejn û bala xe girêdan û ez li ser hespê xwe siwar bûm. Min piştî xwe da felekê û berê xwe da oxirê.

Wê salê konên me bi qonaxa çar pênc saetan nêzikî çiyê bûn. Min rast berê xwe da çiyê. Piştî nîvro bû ez gihame qûntara çiyê. Min limêja xwe kir, pariyek nan xwar. Heta esra teng ez li çiyê geriyam, min tu tişt nedît. Ji nişkê ve bahozeke rabû, te digo qey qiyamet e. Min hew pêşiya xwe didît. Hesp jî ber xwe nedidît, loma bi zorê bi rê ve diçû. Min çi dikir nedimeşî. Her diçû hewa xera dibû. Min ji xwe re got; “Camêr yê te jî heta bi vê derê.” Vîzevîza bê dilê yekî direiland. Hin bi hin tariyê jî diavête ser erdê. Min xwe li ser hêsp şidand da ku ez nekevim û min hevsarê hespê xwe berda. Piştî re vê hermetê ji min re got, dema hespê min ez anîme ber hewşa wan, bûbû eşa. Qey Xwedê qedera min neanîbû û hê parîk nanê min li vê dinyayê mabû.

Ez li ser piştî hêsp nehiş ketime. Vê hermetê, hatiye, ez ji ser hêsp anîme xwarê. Ez birime hundir, cilê min guheztine, sobe ji min re dadaye. Hespê min biriye koxê, av daye, êm dayiyê. Hin bi hin ez hatime ser hişê xwe, min çavên xwe vekirin. Xwedîya malê, laliyek tije şorba nîska anî danî ber min. Min şorba xwe xwar, hinavên min germ bûn, qelî anî, min ew jî xwar. Li ber soba germ bêhemdî xwe, bi xew ve çûme.

Dema ez şiyar bûm hema bêje nivê şevê bû. Mazûvana min, wilo ji pê bû. Got: “Ey mêhvanê ezîz, ma tu hinekî baş bûyî, tu çawa yî?” Min li hawîrdora xwe nihêrî, li hundirû ji xeynî jinikê tu kes tune bû. Min got: “Hermet ma tu tenê yî, li vê malê, tu kesê te nîn e?” Jinikê got: “Na ezbenî, li vê malê, ez tenê me.”

Şeytan ketibû dilê min. Dilê min xera bû. Min bela xwe li jinikê xist. Jinikê çi qas got: “Malava, tu mêhvanê Xwedê yî. Tu ji derb ketibûyî, te xwe li mala min girt. Min got, çawa be mêhvan mêhvanê Xwedê ye, min tu hewandî û tu radibî, doza namûsa min li min dikî. Were, dev ji vê daxwaza xwe ya ne li cih û ne rast berde. Ji xwe re raza û got bû sibeh jî bi oxira xwe de here; tu sax û ez silamet.” Lê na, vê hermetê, çiqasî li ber xwe da û çiqasî lavlav kir; ez ji ya xwe nehatime xwarê. Min xencer û tiving danîne ber xwe. Min got: “Ev erd bigihê vî azmanî; ya tê destûr bidî, ez ê wî karî bi te bikim û yan na jî canê te.

Lavlav û giriye wê fêde nekir; carekê min nêta xwe xera kiribû. Li ser vê eksa min, jinikê got: “Camêr ez çawa bikim, te qîma xwe pê aniya, Xwedê heqê min ji te re nehêlê. Qey ev jî qedereke Xwedê ye. Lê ez ê bi şertekî bi te re bikim. Tu yê rabî, serê xwe xweşik bişoyî û piştî re.”

Vê hermeta ku a niha tu dibînî û ku ev deh sal e helaliya min e û kebanîya mala min e; ez birme serşokê, cilê min ji min kirin, ez xistme hundirîwê teşteke bafûnî û mezin. Laşê min, serê min xweşik sabûn kir. Di serşokê de weke deriyekî biçûk hebû. Hema ji nişkê ve, ew derî vekir û tevî teştî bafûnî, heta Xwedê qewet dayê, dehkek li piştî min xist. Kekê min, ez çi ji te re bêjim. Tu nabê xanî li ser girekî mezin ava bûye. Berfa li erdê bûbû qeşa. Teştî bafûnî nedîşemî, difirî. Ji xeynî ku bi her du destan, bi şid, min keviya teştê girtibû; min nikaribû ez tiştêkî bikim. Teştî min çû û çû, heta ku ji ber xwe li cihekî weke newalê, weke bestê sekinî. Laşê min î şil, di wê şeva jistanî de. Hawar e Xwedê, tu şanî tu xaliqî nekî. Min li dora xwe meyzand; li ser girê ku jê hatibûme xwarê, çirûskê xuya dikir. Ez ji teştê derketim û bi çar lapka, min xwe kişîşande serê gir. Dema ez gihame serê gir, te di got şûjin di laşê min de dirakirin. Ji tirsê û ji şerma min li deriyê xênî nexist. Min xwe li deriyê koxê

xist û xwe gihand nav mêşinan. Kox gelekî germ bû, hin bi hin xwîn di laşê min de hat. Ez bi ser hişê xwe ve dihatim. Ha min dît derî got zîq û vebû, însanek kete koxê. Zehf tê de neçû yekî di hat. Ji tirsê ez di cihê xwe de hişk bûbûm. Li welatekî xerîb, di şeveke tarî de, çip tazî û sûcdar; min nizanibû ez çî bikim. Xwedêyo tu neynî serê tu evdê xwe. Min di got; “Gelo ez ê bi çî awayî ji vê cehnemê xelas bibim, xelasî jixwe nîn e, hema mirineke erzan, mirineke paqij bi dest min ketib.”

Kesê ketne hundirû, xwe zerk kirine hev û bû piste pista wan. Min fêhm kir ku ev her du kes yarê hev in. Mêrik digot: “Tu çima îşev zû nehatî?” Jinikê jî digot: “Zarok nerazan, ez li hêviya wan mam.” Di wê kêliyê de, ez ji xwe re fikirîm. Min got, lawo filankes kurê filankes. Tu serokê êlekê yî, tu şêxê ereban î. Xelk namûsa xwe teslîmî te dike, xwe tavêjine bextê te. Li ser qencî û rehmeta jinika ku îro tu ji mirinê xelas kirî; te bînamûsiyeke mezin kir. Him te xayintî kir, him te nankorî kir û him jî te zordarî kir. Efûya carekê heye, lê efûya cara duduyan nabe. Cara pêşî, tu bûyî qurbanê nefsa xwe; qet nebe, vê carê kumê bînamûsiyê li serê xwe neke. Rabe ser xwe, vê bînamûsiya ku li darî çavê te diqewime qebûl neke.

Hema ji nişkê ve ez rabûm û min xwe avête ser mêrikê ku li ser jinikê pehn bûbû. Bû qîrîniya jinikê û xwe li dêrî xist. Heçî mêrik bû; min her du destên xwe bi şid, li ser qirika wî kiribûne bazine. Ji tirsê, nikaribû xwe bi carekê tev bide. Heta ku rih ji laşê wî neçû; min destê xwe sist nekirin. Dema baweriya min pê hat ku miriye, min destê xwe sist kirin, cilê wî jê kirin û min ew li xwe kirin. Ez çûme ber deriyê qata banî, çî qas min li dêrî xist, kesî derî ji min re venekir. Bi darê zorê; bi pihînan, min deriyê xênî şikand û ez ketme hundirû. Jinika xwedî yar, li quncika xênî, serê wê tewandî, di nav hezneke giran de bû. Ji hindirûwê xênî min fêhm kiribû ku ev ne xaniyê ku cara pêşî hatimê. Ji ber ku ez rastî jinika ku ez di testê de derkiribûme derve nebûbûm, zehf kêfa min hat.

Qederekê wilo li ber sobê ji xwe re rûniştim. Ne bi gelekî, min dît nehîtekî zilaman kete hindirû. Xencera wî di ber wî de, tivinga biçapî li milê wî, hat li ser serê min sekinî. Got: “Ezbenî berî ku ez te bişînim aliyê dî, zû bêje tu kî yî, çî kes î, bêyî min, çî pişê te li mala min heye?” Û pêre pêre jî xencera xwe ji ber xwe kişand û li ser serê min hejand. Bi ser hev qas ecêban, tirsê mirinê, di demeke ku min digot welahî ez xelas bûm de, qidûmê min şikandibû.

Min got: “Camêr, ku tu li min guhdarî bikî, ez soz didime te ku her tiştî ji serî heta binî rast bêjim. Pişt re jî tu min dîkujî, min dihêlî asil tu yî.” Mêrik, weke ku bêje “Bi Xwedê derdekî vî heye, ka ez lê guhdarî bikim” û got: “De ka bêje bê tu yê çî bêjî.” Qotiya xwe ji berîka xwe derxist, cixareke xwe pêça, pişt re qotî da min, min jî yek ji xwe re pêça û min dest bi gotina çîroka xwe ya îro ji sibê heta wê kêliyê kir. Ji serî heta binî; min ne şitaxaliyek kêrî got û ne min yek lê zêde kir. Çî bûbû, çî qewimibû, yek bi yek min hemû gotin. Taliyê jî min got: “Heyra de êdî tu û wîjdanê xwe, ez ji niha ve jî dibêjim, ku tu min bikujî jî, qetla min bila li te helal be.”

Mêrik cixarek li ser a dî dikşand. Rabû ser xwe, ez birme koxê, min zîlamê ku kuştibû şanî wî da. Em hatne hindirû, fişek bire devê tivingê; bêpirs û bê gotin, devê tivingê kire serê jinikê û pêre pêre jî tilî kişand. Jinik di cih de, ne da û ne stand. Dilê min dikira ji qefesa xwe derkeve derve. Kabokê min direilîn. Xwîn di laşê min de cemidibû. Min di dilê xwe de, got: “Heta vê derê bû.”

Mêrik ji nişkê ve hat li hemberî min rûnişt. Cixareke dî ji xwe re pêça, qutî da min. Got: “Ey mirovê xerîb! Ez nizamim bê tu kî yî û kurê kê yî. Ev jinka hanê, ku min a niha kuşt helaliya min a 15 salan e û dotmama min e jî. Ew jinika ku tu hewandî, ji mirinê xelas kirî û ji ber bînamûsiya te, tu şiyandî mirinê jî xuha min î ji diya min û bavê min e. Ez jî li hizûra Xwedê soz didim, ji bo ku te dijminê namûsa min kuştîye, ez jî te efû dikim. Ji bo te bînamûsiya dîtî qebûl nekiriye û dest hilandiye, ez bînamûsiya ku te kiriye jî efû dikim û te didime xatirê rastî û mîraniya te, ya taliyê. Û ez xuha xwe jî bi helalî didime te, sibê mehra wê bibire û bibe welatê xwe.”

De vêca mêhvanê delal, ew xanim, ev xanima min e, çîroka min û wê ku em bûne nesîbê hev ji ne kêr, ne zêde, weke ku min ji te re gotiye ye. Ji xeynî vê daxwazeke te hebe, kerem ke li ser serê min û bavê min.

Mêhvanê gernas, got: “Heyra hûn xweş camêr in, mala we sed carî ava be. Ez gelekî memnûn bûm ku min hûn nas kirin. Ez hêvî dikim ku rojekê hûn li min biqesidin û bibine mêhvanê min.” Xatir ji wan xwest û bi riya xwe de çû. Ew çû bi oxira xwe de, ew jî man di şahî û xweşiya xwe de. Çîroka me çû diyara, rehme li dê û bavê hazir û guhdara; ji xeynî fesadê ber diwaran.

Dengbêjek û Stranek:

Şêx Huseyn



Amadekar: Hilmî AKYOL

ŞÊX HUSEYN, Di sala 1954'an de li bajarê Amedê, li navçeya Farqînê li gundê Dêrûnê ji diya xwe dibe. Malbata wî di sala 1917'an de ji navçeya Melazgirtê hatiye gundê Kelê. Macirên Melazgirtê ne. Kurmanc e. Dibistan nexwendiyê. Bi erebî xwendiyê. Di sala 1966'an de diçe Farqînê. Li Farqînê di salên 1975, 76'an de dizewice bi tevayî 4 caran zewiciye. Li Farqînê heya sala 2000'î 22 salan misk û lewantê difiroşe. Ji sala 2000'î vir ve kasetan difiroşe. Di zaroktiya xwe de stranan dibêje. Ji bavê xwe hînî stranan bûye. Ji malbateke dengbêjan e. Kalê wî Ûsivê Macir dengbêjê Mehmed Axayê Kelê bûye. Bavê wî Evdîlqadirê dengbêj e. 13 kur û 4 keçên wî hene.

Hevdîtin rû bi rû bi dengbêj re hatiye çêkirin.
Ev agahî ji devê dengbêj hatine nivîsandin.
2 kasetên wî yên korsan di nav gel de hene.

KELE

Gundê Kelê li ser Farqînê ye. 12 km dûrî Farqînê ye. Li alî rastê papûra Farqîn û Bilîsê dikeve. Kelê gundê malbata axa ye. 80 malbat di gund de dijîn. Nîvê gundiyan xwedîerd in. Nîvê gundiyan bê erd in. Gundê deşt û çiya ye. Erdê herî hindik 10 elb di destê gundiyan de heye. Gundî cotkariyê dikin. Titûnê datînin. Pemû û gilgil diajon. Pez û dewaran xwedî dikin. Baxçeyên gelek malbatan hene. Ava gund heye. Elektrîk û dibistan û mizgefta gund hene. Têlefona li gund heye. Dan û standina gundiyan bi Farqînê re ye. Gundî tev kurmanc in. Keyatî li gund e.

Li başûrê gund, gundê Sora heye.
 Li bakurê gund, gundê Mala Badê heye.
 Li rojhilatê gund, gundê Başimtê heye.
 Li rojavayê gund, gundê Dêrûnê heye.

Weylêlê

Weylê lê lê weylê lê lê weylê.....

De lêlê bedewê mi go ha bi vir da ha bi wir da ha
 Êtîmê malxirabê mi go ha bi vir da ha bi wir da ha,
 Ti were ez ê di nava dilê te da xeberek bêjim wa di guh da ha
 Zerî domamê bira deng neçe morîw mircanê wa di bin da ha,
 Keçikê digo lawiko mala bavê te şewitiyo, wele ne wa ye,
 Êtîmo qe ne wa ye, şîva teze ku bela ye,
 Keçikê digo lawiko mala bavê te şewityo şeva reş namûsa mêra ye,
 Eger ti li malê me digêrî malê me va ye
 ça me li ser, agirê me dadaye,
 kuro lawikê kîngê bavê te hatiye sêwiyo mi ji bavê mi xwestiye, bavê mi nedaye,
 wele kîngê te gotiye keçê rabe, bi destê min bigre min birevîne.
 Min gotiye lawikê malê ez ê bi te ra nayê. Min cewaba lawikê mala xwe daye,
 Wî de lêlêlê


Ji piçûkiya xu heta mezin rojê, şermezarê destê te me heylêlêlê li dinyayê.
 Keçê digo lawiko serê Sîpanê Xelatê bişewite gaz bi gaz e,
 Êtîmo di binyê da Behra Wanê di serê da Xelat û Elcewaz e,
 Wele xelqa min a têlî delalî nexweş e, wele nîvê zivistanê firîkê noka, hêkê kewa ji min dixwaze,

Wîwî lêlê hay li mi lêlê ...

Zerî domamê ji hefsaliya xu û vir da meraqlî me hey lêlê sevdalî me wax..
 Hahîîîî.



Romana Xezal
Niviskar: Nesîp TARIM
Weşanên Belkî
Îlon 2007, Stenbol
303 rûpel



Mewlûda Nebî
Şêx Muhemmed Emîn El Heyderî
Weşanên Lîs
2007, Amed
70 rûpel